Di encama van hoyan de ku bi serê gelê kurd de hatin, kurd ji siyaseta Quwayî Millîye-Hukumeta Kemalî ketin şikê. Ji du tiştî guman peyda bûbû: Tiştê yekem ev bû ku hukûmetên Îngilîz û Fransa bi kemalîstan re li ser van şertan bi hev kiribûn: Tirkîye dê dev ji wîlayetên Mosil, Hewlêr, Kerkûk û Silêmanîyê berde, lêbelê di şûna wan de dê bajarên Edirne, Îstênbol, Dardanel, Ezmîr û Bursa bidine dewleta Tirkîyê ya nuh. Dê hukûmetên Îngilîz û Fransa hukûmeta kemalî nas bikin û dê seltenet û xîlafeta Osmanî êdî neyête naskirin. Û di encamê de berevaniya mafên gelê kurd jî dê neyête kirin.

Tiştê duyem ku gelê kurd jê guman dikir jî ev bû, ku di salên piştî Şerê Cihanê yê Yekem de divê derbarê meseleya gelê kurd de metirsiyek ji derve de li ser Tirkîyê çênebe, ew peymanên ku di navbera gelê kurd û tirk de pêk hatine dê Tirkîye bide hêlekê û çawa ku selteneta Osmanî gelê kurd bindest kiribû û peymanên xwe şikandibû, dê kemalî jî di wê riyê de bimeşin; serê sungû û

devê şûr bidine ser singê kurd!

Gelê kurd ji ber van metirsiyan bi hemû rixistinên xwe ve li bin alaya komeleya *Komîteya Îstîklala Kurdistanê* kom bû. Di bin serokatîya Xalid Begê Cibrî de hemû tevgerên kurdîyê xwe organîze kirin û bi hengemeyeke mezin xwe bi pêş ve birin.

Xalid Beg ji aliyê hemû kurdperweran ve dihate nasîn û her wiha ji aliyê hemû kurdan ve, çi bajarî û çi gundî, çi xwedî zevî û çi hejar, li bal her kesî qedrê wî dihate girtin. Gelê kurd bi hemû rêlên xwe ve; bi welatperwer û roşnîbîrên xwe ve di vê komeleyê de gihabû hev. Vê komeleyê hewl dida xwe ku gelê kurd bi carekê de ji kemalîstan rizgar bike da ku awat û merama Ehmedê Xanîyê navdar ê ku di nav dil û cergê hemûyê kurdan de bû, bicih bînin.

Komîteya Îstîklala Kurdistanê li hemû deverên Kurdistanê Tirkîyê bi awayeke nihênî hate damezrandin. Xalid Begî li ser mebestên komîteyê bi Simko û Cemîlpaşazadeyên Diyarbekir û nevîyên Şêx Evdîlqadîrê Şemzînan re li hev kiribû. Di sala 1921ê de li Erziromê navenda Komeleya Îstîklala Kurdistanê hate danîn ku 24 qehrema-nan tê de cih digirt. Di vê komeleyê de bi tenê têkiliya 12 têkoşeran bi hev ve hebû, lewre ji aliyê rêxistinbûniyê ve di navbera vê komeleyê û komeleyên din ên Kurdistanê de cîyawazîyek hebû, çûnke ev rêxistin şeweyeke xwe ya taybet hebû. Komele, li ser esasê hucreyan (hêlane) saz bûbû ku her hucreyek 12 kes bûn. Van 12

têkoşeran hev nas dikir lêbelê endamên her hucreyek bi navgîniya serokê hucreyê pêwendî bi hucreyeke din re datanî. Endamenên hucreyek endamên hucreyeke din nas nedikirin.

Navnîşana hucreyan jî wisa bû: Her hucreyek navekî xwe yê nihênî hebû ku bi navê gul û giyayek an jî bi navê dever û deviyeke Kurdistanê dihate navkirin. Wek hucreyên Beybûn, Rebenok, Sorgul, Leylak, Guleşevîn an jî hucreyên Çiya, Şax, Kew, Zevî, Çem û hucreyên Gulecot, Yaregul, Gezîne, Nêrgiz û Lûleper...

Bi vî awayî gundî û bajarî; hemû çîn û tebeqeyên gelê kurd ketin nav tevgera rizgariya gelê kurd û ji bo serxwebûna kurdan peyman bestin û sond xwarin.

Arme (Dirûşm û sembolên komeleya Komîteya Îstîklala Kurdistanê) jî wisa bû: Qelemeke dirêj li ser huburdankekê, li ser paçek gûşeyê pembû û simbila genim, di nav wan de jî xencerek, di nav qada hemûyan de jî roj hebû. Ev remz û nîşana Komîteya Îstîklala Kurdistanê Tirkîyê bû.

Di encamê de Komîteya Îstîklala Kurdistanê ku bi serokatiya Xalid Begê Cibrî hatibû danîn, di sala 1924an de li navendên Bedlîs û Wanê dest bi amadekariya şoreşê kirin. Lêbelê, di Sibata 1925an de Xalid Begê Cibrî bi Yusif Zîya Beg re, ku di nav cergê xebatê de bûn, ji aliyê kemalîstan ve hatin gulebarankirin û bi vî awayî ew jî bi giyanê xwe î pak û bi qehremaniya xwe çûn nav rêza karwanên şehîdên nemir ên Kurdistanê. Lêbelê, piştî girtin û

kuştina van her du serokên gelê kurd Şêx Seîdê Pîranî dewsa wî girt Xulasa li hemû deverên Kurdistanê, di navbera salên 1917-1919an şoreşa wan her li piya bû. Li dû wan jî bi giştî ev raperîn û şoreş navdar in:

1. Li Îranê şoreşên Carî û Urmîyê (Simko), Ciwanro, Qedemxêr û Loristan.
  2. Şoreşên Qocgirî û Meletî û Baybûrdê, Şêx Seîd, Geliyê Zilan, Ararat (Agirî), Dêrsim (1920-1938).
  3. Şoreşên Silêmaniyê, Barzan ên li Kurdistanê Iraqê.
- Bi tenê di nav van tevgerên gelê kurd de li Kurdistanê Tirkîyê li ser kurdayetiyê 2 milyon kurd giyanê xwe pêşkêş kir û ji bo serxwebûna Kurdistanê bûn şehîd. Dîsa, milyonê kurd jî surgunî rojavayê Anadolê û bajarên Stenbol û Edirne û heta bi sînorên Bulgarîstanê bûn û ji welatê xwe dûr ketin.

## **Komeleya Kurdistanê**

Di sala 1908an de ji aliyê komeleya "Ittihad we Teraqî" ya tirk ve li Tirkîyê meşrûtiyet hate îlankirin û Evdilmecîd bû siltan. Wê demê komeleyeke gelê kurd a bi navê "Komeleya Kurdistanê" hebû. Gelek serkirde, general, efser û roşinbîrên kurd, dîsa gelek ji serokên êl û eşîrên kurd ên ji navendên Dêrsim, Xarpêt, Erzirom, Diyarbekir, Bedlîs û Wan, her wiha ji navendên Mosil û qismek ji Babanan jî di nav vê komeleyê de bûn. Bêguman, efser, amir û xwendayên kurd ku li Îstenbolê û navendên din ên tirk de bûn, ew jî

tevlî vê komeleyê bûbûn. Bi şêweya ku neteweya kurd li ser xaka Kurdistanê di bin desthilatiya xîlafeta Osmanî de otonomiyê (xudmuxtari) werbigire, Şêx Evdîlqadirê Şemzînî ku neviyê Nehrîzade ye, ligel Bedirxaniyan di serkirdayetiya vê komeleyê de ji bo azadiya Kurdistanê di nav têkoşînê de bûn. Vê komeleyê ji bo gihîştina vê amaca gelê kurd li Stenbolê di sala 1908an de ev du komele ava kir:

**1. Hêvî (Hîwa).**

**2. Kurd Telebe Cemiyetî** (Komeleya Qutabîyên Kurd) ku ev komele li dû mektebên Stenbolê vebûbû.

Çawa ku me got, ev her du komele bi Komeleya Kurdistanê ve girêdayî bûn. Navenda wan li Çemberlîtaş bû û şubeyeke mezin ya din jî li Îstanbulê hebû. Kovereke bi navê "Kurdistan" derdixist ku bi giştî li ser jiyana siyasî, aborî û komelayetî (civakî) ya neteweya kurd bû. Kuncikên xwe ji bo ronakbîrên dirokî yên kurd, zimanê kurdî, lêkolînên derxistina hoyra kurd, lidûketina pêşandan û çareyan terxan dikir û her wiha gelek gotar jî li ser jinên Kurdistanê belav dikir. Komeleya Kurdistanê tenê bi vê xebata ku me behsa wê kir nedisekinî, belkî gelek dilsozane û bi dilgermiyê ji bo van amacên li jêr hewl dida xwe:

1. Komele dixwaze ku li van şeş wîlayetan; Erzirom, Xarpêt, Elezîz, Diyarbekir, Bedlîs û Wanê mekteb vebin û tê de bi zimanê kurdî perwerde bête kirin.

2. Fermandarên (amir) navendên Kurdistanê divêt kurd bin û di dayreyên fermî de zimanê kurdî bête karanîn.

3. Li Kurdistanê mekteb û zanîngehên bilind bête avakirin.

4. Ji bo deranîna kovar û rojnameyên siyasî yên kurdî, rê bête dayîn.

5. Dadgeha Şer'î bi zimanê kurdî bête rêvebirin, muftî û qazî kurd û ji mezhebên sunî û elewî bin.

6. Li gor nufûsa (jimartin) xwe gelê kurd di Meclisa Mebûsan de bi nûne-rên xwe bête temsîlkirin.

7. Di pêşveçûnê de girîngî bi Kurdistanê bête dayîn.

8. Li Kurdistanê fabrîqe bête avakirin.

Di vê demê de komeleya Ittîhat we Teraqî bêhêz bû, lewre dewleta Osmanî ji derve de di bin xetereyê de bû û talûkeyeke din jî, hîn nuh meşrûtiyet hatibû îlankirin; ew desteya xîlafeta Siltan Evdîlmeccîd hîn jî bihêz bû ku li dijî Ittîhad we Teraqî her di nav çalakiyê de bû û li ber xwe dida ku dewra seltene û dîktatoriya xelîfeyên Osmanîyan zindî bike. Lewre jî, ji bo ku Ittîhad we Teraqî xwe bi hêz bike, bi komeleya ermenan TAŞNAQê re ket nav têkiliyên alîkarî û piştgiirtina hev û din.

Komeleya Ittîhad we Teraqî li ser baweriya Turanîzmê hatibû danîn û xwedî baweriyeke şovenîst bû, lewre neteweyên ku ne ji nîjada tirk bûna, nabe ku mafê wan ê jiyane hebe, lêbelê ew têkiliya ku wan bi TAŞNAQê re danîbû li ser hesabê bihêzkirina turanîstiyê cureyek pîlan (taktîk, R.L.) bû!

Ev komele xwedî rêgezeke tirkperest bû û dijminê hemû neteweyan bû. Her ku bihêz dibû, li hember Komeleya Kurdistanê kîn berhev dikir û nedihîşt ew karek bike. Ji ber vê yekê Komeleya Kurdistanê di sala 1912an de ket nav xebateke nihênî (îlegal) û gelek

têkoşerên wê jî çûn nav komeleya "Hurriyet we Itîdal". Çûnke, ev komele (Hurriyet we Itîdal) mafê xweîdarekirina neteweyan nas dikir, ku ev jî berjewendiyên gelê kurd tê de hebû û her wiha, vê komeleyê li dijî komeleya Ittîhad we Teraqîyê muxalefetê dikir.

Komeleya Ittîhad we Teraqî li Îstanbulê komeleyeke din a Turanîzmiyê damezrand û kovareke Turanîstiyane bi navê "Türk Yurdu" (Nîştimana Tirk) derxist ku vê kovarê dest bi êrîşbirina neteweyên ku ne tirk bûn kir. Vê kovarê di nivîsên xwe de bi şanazî behsa "Altın Devre" (Serdema Zêrîn) dikir ku serdema selteneiyên "Altay" û "Cengiz Xan" bûn! Neteweyên ku ne ji nîjada tirk bûn, xwestina wan ev bû ku divêt bi darê zorê bindest bibin û bibîne tirk! Bi vî awayî Ittîhad we Teraqî rûyê xwe yê rastîn nîşan dida û hewl dida ku dewra Hulagû û Cengiz Xan ji nû ve zindî bike. Kurd jî, ji bilî ku di nav komeleya Hurriyet we Itîdal de bi eşkerayî dixebitîn, bi nihênî jî di têkoşîna xwe de her berdewam bûn û li nav Komeleya Kurdistanê jî dixebitîn.

Di sala 1912an Komeleya Kurdistanê kovara *Rojî Kurd* deranî. Demek bi şûn de ev kovar hate qedexekirin lê xwendevanên zanîngehan di şûna wê de kovara "Hetawî Kurd" deranîn. Lêbelê piştî Şerê Baqanê, di sala 1913an de ev kovar jî ji aliyê hukûmetê ve hate girtin û xwendevanên ku Komeleya Kurdistanê danî bûn, ew jî ji aliyê hukûmetê ve hatin girtin.

Helwesta Ittîhad we Teraqî ya li hember gelê kurd û Komeleya Kurdistanê û zanayên gelê kurd heta sala 1913an ev bû. Lêbelê di sala 1913an de ermenan li Kurdistanê doza xweîdarekirinê kirin. (Goya ermenan

daw li wan dikir ku dewleteke ermenî ava bikin, bi wî şertê ku li ser xaka Kurdistanê be.) Û ev tevger jî bi hana dana (teşwîk) Brîtanya û Rûsyaya qeyser çêdibû. Dema ku ermen mijûlî viya bûbûn, Ittîhad we Teraqî xwe bi nêzîkî kurdan kir û hate gotin ku ew mafên derbarê jiyana gelê kurd de, ku têkoşerên kurd di Komeleya Kurdistanê de doz kiribûn, dibêjin ku dê bêne dayîn, bi wî şertê ku kurd piştî hukûmeta tirk bike!

Rewşa gelê kurd heta destpêka Şerê Cihanê yê yekem ev bû. Lêbelê di sala 1914an de dema ku tirk ketin nav şerî, ermenan li dijî dewleta Osmanî bi aliyê Brîtanya û Rûsyayê girtin. Gelê kurd ku nîjada wan di nav tengasiyê de bû û gelek netewe û hukûmetan dixwest welatê wan wêran bikin, gelek ji dil û bi dilgermî ji bo parastina welatên kurd û tirk li dijî îngilîz û rûsên dagîrker dest bi alîkariya hukûmeta tirk kir.

Bi giştî dîroka Komela Kurdistanê û çalakiyên vê komeleyê jî ev bûn. Şayanî behsê ye ku divêt bête gotin, li dû Şerê Baqan û têkçûna tirkan a di wî şerî de, li Îstanbulê komeleyeke jinan jî hate damezrandin ku ji bo mafên jinên li Kurdistan û Tirkîyê dixebitî. Gelek endamên vê komeleyê jinên ji Kurdistanê bûn û navê komeleyê jî "Qadînlere Cemîyetî" bû.

---

\* Ev nivîs ji kitêba bi navê "Jiyan û Berhemekanê Îsmail Heqî Şaweyî, Dezgay Çap û Belawkirdinî ARAS, Zincîreyê Roşnîbîrî, Çapî Yekem, Çapxaneyê Wezareti Perwerde, Hewlêr, 2003" hatiye wergirtin.

# MELE SELÎM EFENDÎ

Îsmâil Heqî Şaweys

Wergerandina ji Soranî: Roşan Lezgîn

Mele Selîm Efendî yek ji şêxên mezin ên Hîzanê bû, ji ber ku li gor wexta xwe gelek têgihastî û zana bû lewma jî bûbû cihnişînê şêxê Hîzanê Şêx Sebgetullah Hîzanî. Ji ber ku Mele Selîm Efendî doza kurdayetiyê jî dikir û ji bo serxwebûna Kurdistanê hewl dida xwe, lewma jî bi fermanek, ku ji aliyê Siltan Evdilhemîd ve derçûbû, ew û Hecî Mûsa Begê Xoytelî û Seyîd Evdîlqadir Efendiyê Şemzînanî di sala 1894ê Zayînî de surgûnî bajarê Medîneya Munewer bûbûn. Dîsa, di heman salê de siltan Evdilhemîd fitnetî û tevliheviyek xistibû nav ermenan û wan li dijî gelê kurd sor kiribû da ku di navbera gelê kurd û ermenan de şer derbikeve û dijberî têkeve nava her du gelan. Bi vî awayî pevçûnê ji aliyê ermenan ve dest pê kiribû, ku di vê dolabgerandinê de destê emperyalîzma îngilîzan û qeyserê Rusyayê Çar Nîkolay jî hebû. Ji bilî vana, di heman

salê de Hecî Mûsa Begê Hîzanî ji aliyê komeleya TAŞNAQ a ermenan ve hati-bû kuştin. Di netîceya van rûdanên ku me bi kurtahî behsa wan kir, gelek peyayên mezin ên gelê kurd ku xwedî nufûz û şîyan û hêzdar bûn surgunî Hîcazê bûbûn.

Li Hîcazê, li bajarê Medîneya Munewer Mele Selîm Efendî, Hecî Mûsa Begê Xoytelî û Seyîd Evdîlqadir Efendiyê Şemzînanî bi wan giregirên kurd ên surgûbûyî re civînekê li dar dixînin. Dîsa, gelek ji wan kurdên ku ji bo hecê çûbûn Hîcazê jî di wê civînê de amade dibin. Rojeva civîna wan jî bi tevayî li ser meseleya kurdayetiyê û her wiha zordarî û serdestiya hukumeta Osmanî dibe. Di dawiya civînê de li bajarê Medîneya Munewere ya pîroz, li Merqeda Pêxember (Silavên Xwedê li ser bin) tev ji hev re sond dixwînin ku ji dewleta Osmanî cihê bibin û ew bi xwe Kurdistaneke azad ava bikin.

Heman li wir peymana xwe girê didin, ku vegerin Kurdistanê û her kesek di şûna xwe de têbikoşe da ku gelê kurd ê hejar û bin-dest ji bin nîrê dagîrkerî û zordariya dewleta Osmanî rizgar bibe.

Di sala 1896an de Siltan Evdilhemîd Mele Selîm Efendî, Hecî Mûsa Begê Xoytelî û Seyîd Evdilqadir Efendiyê Şemzînanî dibexşîne û ligel surgunbûyîyên din ên kurd ji Hîcazê di riya Edremîtê re vedigerin Kurdistanê. Bi vî awayî Mele Selîm Efendî çawa ku vedigere Kurdistanê dest bi propaganda û tevgera rêxistinbûnê dike; li nav kurdên Başqe, Wan, Mûş, Bedlîs û Diyarbekir digere û di vî warî de bîrûbaweriya xwe belav dike; eşîrên van deveran jî guh didin pend û şîretên Mele Selîm Efendî û baweriya xwe pê tînin, her wiha ew jî tesdîq dikin ku pêwîst e ew ji bo rizgarbûna xwe bikevin nava xebatê. Ji bilî hin şêxên Qadîrî ku çend tiştên sivik ên wek quretî û xweperestîya şêxîtiyê dikirin bahane, ku qaşo Mele Selîm Neqşî ye, ango ne ji terîqeta wan e (Qadîrî), lewma jî nabe ku ew li dû Xelîfe Mele Selîm Efendî bimeşin, lê ên din tev de ji bo serhildana li dijî hukumeta Osmanî xwe amade dikin. Ji van şêxên qadîrî, bi taybetî li Kopê (Bulanîk) û Mûşê, Şêx Evdîrehîm Taqî aliyakariya Mele Selîm Efendî nedikir lê berevajî, alîkariya selteneta Hemîdîye dikir.

Li vir tişteki muhîm jî ev e, ku divê em behsa wê bikin, dema ku Mele Selîm Efendî mijûlî belavkirina bîrûbaweriya kurdîyê û rizgariya Kurdistanê bûbû, Şêx Sebgetullahê Hîzanî ku şêxê Hîzanê û serokê hemû neqşibendîyên Kurdîstana Tîrkiyê bû, îcar dema ku çûbû ser dilovaniya Xwedê, Mele Selîm Efendî xelîfeyê wî

bû, lêbelê piştî wefata Şêx Sebgetullah li cihê ku Xelîfe Mele Selîm Efendî bi xwe di şûna wî de rûne, Xwedê jê razî be, li şûna şêx rûnenîst, lêbelê kurekî Şêx Sebgetullah ê bi navê Şabedîn hebû ku hîn dehsalî bû, Xelîfe Mele Selîm Efendî piştî wefata bavê wî rabû ji bo lawîk dest bi nîşandana rê û rêzanên serokatîyê kir û wî fêrî zanyarî, sofitî û îrşada dînî kir. Bi vî awayî xwest war û baregeha bavê wî bi Şêx Şabedîn şên bike. Di vî navê de Xelîfe Mele Selîm Efendî mûrîd û sofîyan jî perwerde dikir ku divê ew ne bi tenê ji bo xwe bixebitin, belkî zêdetir divê ew xelkê bihêztir bikin; bi hemû şiyana xwe mezinatiya welatperweriyê bikin û xizmetê ji bo her du dinyayan jî bikin.

Hemû şêxên Kurdistanê vê henge-meya Mele Selîm Efendî qebûl dikirin û pê kêfxweş dibûn û di bîrûbaweriya welatperweriyê de bi dil û can alîkariya Mele Selîm Efendî dikirin.

Bi vî şêweyê Mele Selîm Efendî di nav piraniya xelkê Kurdîstana Tîrkiyê de bîrûbaweriya pîroz a kurdîyê belav kir û di encama vê xebata wî de bi taybetî di nav kurdên Qazîzman, Qers û Erdehanê de derwêş û mûrîdên wî zêdetir bûn; gelek mamosta, zana û peyayên tîgîhaştî yên ji gelê kurd hatin ser bîrûbaweriya Xelîfe Mele Selîm Efendî, dîsa Desteya Ulamayan jî fetwayek derxist, ku li gor şerîetê nabe ku zanayên dîndar ên Kurdistanê xizmet û alîkariya împeratoriya Osmaniyan bikin, bi taybetî ev ne tişteki rast e ku di bin fermanrewayîya rejîma Osmanî de kurd îmamtî, qazîtî û muftîtiyê bikin, çunke xîlafeta Osmanî di eleniya Îslamê û şerîetê de hukmê xwe dimeşîne, ku li hember elewîyan (Mezhebê Caferî) helwesteke dijî-

nane wergirtiye û ji bo feydeya îqtîdara xwe dijminatî û dubendiyê xistiye navbera xelkê musulman.

Di encama vê têkoşîna peyayên zana û têgihaştî yên gelê kurd de, her wiha li ber ronahiya fikrê Mele Selîm Efendî yê bi navê bîrûbaweriya kurdîdayetiyê, tevger her ku diçû belav dibû. Fikrê wan jî ev bû ku xelkê Kurdistanê Tirkîyê yên li her şeş wîlayetan (Erzirom, Xarpêt, Elezîz, Diyarbekir, Bedlîs û Wan) rabin serhildanê; xelkê wan her şeş herêman bi carekê de dest bibin xwe û bi vî awayî tevgera kurdîdayetiyê baskên xwe dawêşîne û belavtir bibin. Li ser vî esasî Mele Selîm Efendî bi gelek zana, şêx û serokên navçeyan re gotina xwe kiribûn yek û bi hev re peyman girê dabûn. Bi taybetî jî di navçeyên Erzirom û Wan û Bedlîsê de ketibûn nav tevgera xebatê. Lêbelê, xwestina wan ev bû ku divê Kurdistanê wek Îdareyeke Muxtarî (Otonomî) ji tirkên cihê bibin û di dîsa bi ser Dewleta Osmanî ve be û ji aliyê îdarî ve di bin desthilatiya xîlafetê de be.

Hukumeta Osmanî ji ber vê rewşê sepîrîze bû û ji bo girtina Mele Selîm Efendî leşker derxist. Axir di Hezîrana sala 1910an de li ser riya Wan-Bedlîsê Mele Selîm Efendî ji aliyê alayîyeke leşkerên tirk ve hat girtin, lêbelê dema ku Şêx Şabedîn bi vî xebera girtina Mele Selîm Efendî hesiya pîr lê giran hat û bi tevî sed siwarî ve êrîş bir bi ser serbazên tirk de, bi şerîkirinê Mele Selîm Efendî û yên din ji destê tirkên stend. Di encama vê rûdanê de êdî meseleya Kurdistanê eşkera bû û derkete rû; her wisa di navbera kurd û tirk de şerî dest pê kir. Li bajarê Bedlîsê 4 tabûr leşkerên tirk hebûn û di destê wan de ji sîlehên giran 1 batarya topên

çiyayî û 12 mîtralyoz hebûn, lêbelê di dîsa jî Şêx Şabedîn êrîş bi ser wan de bir û di netîceya vê êrîşê de leşkerên tirk şikiyan. 2 top, 10 mîtralyoz û 300 tîfîng ketin destê leşkerên kurd, her wiha 320 serbazên tirk jî bi dîlîtîyê hatin girtin, lê ciyê dax e, ku di vî şerî de 50 şerkerên kurd jî şehîd ketin. Artêşa tirk ya şkestî ber bi Diyarbekirê ve vekîşiya û waliyê Bedlîsê jî bi xwe re revand. Lêbelê, di meha Tebaxa heman salê (2 meh piştî serketina kurdan) de firqeyek (kolordu) leşker ji bajarê Diyarbekir ber bi Bedlîsê ve bo êrîşê bi rê ket û di encama vê pevçûnê de artêşa zordar a Osmanî bajarê Bedlîsê di dîsa dagîr kir, lê çî heye ku di nava vê artêşa Osmanî de gelek şerkerên ermen jî hebûn û ji ber ku Osmanîyan hêza ermenan dabûn pêşiya artêşê, lewma jî gelek ji wan hatin kuştin, li beranberî wan jî 20 ji şerkerên kurd hatin şehîdkirin. Belam ev şer bi vî awayî dawî lê nehat, Şêx Şabedîn bi hêza kurd ve li rojhilata bajarê Bedlîsê cebhe girê da û leşkerê Osmanî vekîşand nav şerî, di encamê de careke din artêşa tirk şikand û bajarê Bedlîsê ji destê tirkên dagîrker dubare stend.

Lêbelê, ev cihê xebînetê ye û şayanî nexosiyê ye ku tirkên gelek carî hîsên dînî di eleniya gelê kurd de bikar anîbûn û meyla wan vekîşandibû bi ser împêratoriya Osmanî ve; ji bo qezenc û menfîeta xwe û her wiha ji bo berdevamiya otorîteya hukumeta xwe cihêtiyê û dijberîyên dînî, mezhebî û terîqetî xistibû nav xelkê û bi vî awayî gelek ziyar dabû tevgerên kurdîdayetiyê ku di vî şerî de jî di dîsa heman taktîk bikar anî; hukumeta Osmanî çend şêxên ji terîqeta Qadîrî bi vî awayî berê wan bada bi aliyê xwe ve; hukumeta Osmanî ji bo

feydeya xwe ji şêxên Qadirî yên li qezaya Kufra Şêx Evdilbaqî û Şêx Huseyn Qadirî bikar anîn û wan jî li ser hesabê tirkên îxanetê bi Şêx Şabedîn re kirin; ligel leşkerên tirk êrîş birin bi ser bajarê Bedlîsê de. Vêca Şêx Şabedîn ku bajarê Bedlîsê di dest de bû, ji bo ku di nav kurdan de birakuji rû nede; ji bo ku di navbera kurd û kurd de xwîn neyê rêjtin, rabû bajarê Bedlîsê di cih de hişt û vekîşîya Muks-Sêrtê. Di encamê de tirkên bajarê Bedlîsê bi vî awayî cardin dagîr kirin. Lêbelê Mele Selîm Efendî hetanî bihara sala 1913an jî li min-tiqeyê ma, ku herçend hukumeta Osmanî di navenda bajêr de bû, lê bes fermanrewayiya wan di nav bajarê Bedlîsê de hebû, hawirdora bajêr bi tevayî di bin hukmê leşkerên kurd de bû. Dîsa herçendî ku di navbera her du hêzên leşkerî (kurd û tirk) de wek ku peymanêke aştîyê hebe jî, lê car bi car di navbera wan de şer derdiket û helbet her du alî jî ji hev gumandar bûn heta 18ê Nîsana sala 1914an ku hukumeta Osmanî ji bajarên Wan, Mûş, Erzirom û Diyarbekir 3 firqe leşker amade kir û êrîş bir bi ser Şêx Şabedîn û Mele Selîm Efendiyê Zaza de. Ku di encama şerekî xwînîn de birayê Şêx Şabedîn Şêx Mehmeşîrîn Efendî û pismamê wan Seyîd Elî Efendî ji aliyê tirkên ve dîl hatin girtin û li Bedlîsê bi tevî 10 kurdên din ve hatin daleqandin ku giyanê wan ê pak bo Kurdistanê bû qurban. Ev yek bi Mele Selîm Efendiyê Zaza gelek giran hat û xwest êrîş bibe bi ser Bedlîsê de; ji bo pêkanîna vê armanca xwe bi rastî berendametîya xweşmêraniyê hilda û di navenda bajarê Bedlîsê de *Şevbixwînekê* pêk anî ku ev jî wisa çêbû: Mele Selîm Efendî ligel 40 peyayên canfîda bi şev çûn nav

bajarê Bedlîsê û şer derxistin. Van 40 qehremanên kurd di pêşengiya Mele Selîm Efendî de li navenda bajarê Bedlîsê li hember leşkerên Osmanî 5 saet şer kirin ku di encama şerê wan de 2 qumandanên alayiyê (Albay), 5 efser û 140 leşkerên tirk hatin kuştin. Ji ber ku di nav tarîtiya şevê de şer pêk dihat piraniya kuştîyên tirk bi guleyên hevûdin hatibûn kuştin, lêbelê piştî ku roj hilat û ronahî kete rûyê erdê, hîn nuh wan dikarîbû dor li Mele Selîm Efendî û vî 40 qehremanî bigirtana. Axir di vê dorpêçkirinê de jî pevçûn her berdewam kir û piştî ku 10 qehremanî jiyana xwe fîda kirin, 20 ji wan çepera dijmin şikand û derbas bûn çûn, lê Mele Selîm Efendî û wî 10 lehengî xwe avêtin qonsolxaneyê Rusyayê ya ku li navenda bajarê Bedlîsê bû ku heta bi destpêka Cenga Cîhanê ya yekem her li wir man. Lêbelê dema ku Cenga Cîhanê ya yekem dest pê kir, hingê Osmanîyan qonsolê Rusyayê dîl kirin, her wiha bi vî awayî Mele Selîm Efendî û ew 10 qehremanên ku pê re bûn jî dîl hatin girtin. Bi tawana kurdayetî û bêdînîtiyê li ber deriyê qonsolxaneyê hatin dardêkirin ku 8 roj laşên wan di wî halê daleqandî de hat teşhîrkirin heta ku laşê Mele Selîm Efendî yê pîroz ji serê wî qetîya û bi vî awayî bû qurbanê rêbaza rizgariya Kurdistanê.

Mele Selîm Efendî dema ku çû bin sêdarê temenê xwe 65 salî bû. Li ber sêdarê waliyê Bedlîsê jê re dibêje, "Te gotibû dê Xwedê me muzafer bike, çima tu biser neketî?" Hingê Şêx Selîm Efendî di bersiva xwe de wisa ferman dike, "Belê, Xwedê zafer bexşî me kir. Lê ji ber ku di nava me de xayîn hebûn lewma jî Xwedê ji me stend!" Piştî ku viya dibêje, vêca bi hêrs vedigere bi ser

walî de û dibêje, "Lê mizgîn li te be!... Ku tu cehennemî yî û dê cihê te jî dojeh be. Çünke, min mafê xwe bi te da zanîn lê te qebûl nekir..." Dû re wisa dewam dike, "Ma ev mirin ne bi tenê ji bo me ye! Lêbelê hûn dê hem li vê dinê û hem jî di qiyametê de rûreş bibin! Çünke hukim û selteneta we durû û hîlebaz û fêlbaz û bêbext e. Hûn dê bi van kirinên xwe heta bi heta neçin serî û helbet dê heq bi ser bikeve!" Mele Selîm Efendî bi vî rengî mezinatiyek ji mezinatiya xweşmêrên gelê kurd dide nîşan û giyanê xwe di riya mafên gelê xwe de di bin sêdarê de dibexşîne.

Mele Selîm Efendî peyayekî gewre î xweşmêr bû. Peyayekî dîndar û welat-perwer bû; zana, şair û edîb bû. Bi zimanên tirkî, farisî û erebî dizanî, her wiha şarezayê hemû lehçeyên zimanê xwe bû. Dîwana navdar a Mesnewîya Bixarî bi kurdiya kurmançî serh û tefsîr kiribû. Ji bo Îstîklala Kurdistanê du car çûbû Îstanbulê û çar car jî çûbû Hîcazê. Bi peyayên mezin ên kurd re ku hatibûn surgunkirin û li wan deran zindanî bûn, hevdîtin û guftugo pêkanibûn. Ger mirov rastiye bibêje, Şêx Şabedîn gelek car li ber Mele Selîm Efendî digere û jê tika dike ku ew li şûna xwe danişê û dev jê berde, jê re dibêje, "Em radibin qiyamê lê gundî li dû me namesin..." Lê Mele Selîm Efendî dev ji dozê bernade û guh nade Şêx Şabedîn. Di nav gelê kurd de her digere û ji xebatê xwe nade alî, ji gefxarin û tehdîtên tirkî jî natirse. Helbet îrşada millî û dînî bi hev re dikir û her wext viya digot, "Heta nefesa xwe ya dawîn jî di meseleya dînî û qewmîyetiyê de ez dê ji bo gelê kurd bixebitim û ez dê dev ji doza xwe ber nedim."

Lêbelê, ev jî pêwîst e ku divêt em

behsa wê bikin û cihê xebînetê ye, ku hukumeta Hemîdîye di navçeyên rojhilata Tirkîye de, ku ew dever Kurdistan e, 24 alayî artêş (Alayîyên Hemîdî- R.L) ji xelkê pêk anîbû da ku tevgera gelê kurd dorpêç bike û parçe-parçe bike, her bi vî awayî ew şîrêza yekîtî, biratî û ahenga rêkûpêkiyê di nav gelê kurd de çênebe; li hember selteneta Osmanî hêz û şîyana kurdan saz nebe. Ji bilî viya jî Siltan Evdîlhemîd van teşkilatên leşkerî ku ji xelkê kurd pêk anîbû, wan li hember Qazaqên Rusî jî bikar dianî. Jixwe, di Cenga Cîhanê ya yekem de sudeke mezin ji van kurdan wergirt. Lêbelê ev yek ji bo me gelek cihê şermezarîye ye û gelek fihêt e ku di hemû tevgerên millî yên girîng de, ku ji bo serxwebûna xaka pîroz a Kurdistanê û rizgariya gelê kurd bûn, wan rencxwariya gelê xwe kir; ew 24 alayî leşker qet beşdarî û hevkarîya tevgerên kurdayetiyê nebû, berevajî ligel tirkîyan yek bûn an jî li hember rêxistinên rizgariya netewayetiya kurd béalî sekinîn.

Şermezarî û rûreşî ji bo wan kesan e ku xiyaniyê bi gelê xwe re dikin. Şanazî bo giyanê pak ê Mele Selîm Efendî û hevalên wî ye.\*

---

\*Ev nivîs ji kitêba "Jiyan û Berhemekanê Îsmail Heqî Şaweys, Dezgay Çap û Belawkirdinî ARAS, Zîncîrey Roşinbîrî, Çapî Yekem, Çapxaney Wezaretî Perwerde, Hewlêr, 2003" hatiye wergirtin.

# MÊJÛYÊ HIKUMDARÎYA ŞÊX MEHMÛDÊ HEFÎD

## II

Mela Xalid Ezîzê Motkî

Wergerandina ji soranî: Remezan IŞIK - S. VEROJ

**Ewelê Înqilab û Întibah  
(Hişyarbûn) bo Kurdistan**

Roja 5 Eylûla 1922, li beyanî zû Cenabê Celaletmeab Hefîzade Şêx Evdîlqadir Efendî ligel e'dayê Meclîsê Millî ku ji Mustefa Paşa, Heme Axayê Ebdulrehman Axa, Ebdulfetah Çelebî, Mecîd Efendî Hecî Resûl Axa pêk dihat. Û ji eşraf Ehmed Beg, Tewfîq Beg bi tezkîre ji aliyê hakimê sîyasî ve bo cîyê tiyarexane ku li kenarê bajar e, dawet kirin, zatan rojek li pêş wê şeş tiyare hatibûn. Ev zatana li jêr çadîrek kombûne û etrafê tiyareyan bi zincîra nobeçîyan muhefîze dikirin. Ji ehlê bajar komekî gewre bo seyran westa bûn. Ji hîç aliyek ve bi qederê zerreyek bê nezaketî nebû. Hakimê sîyasî



Mîcirkole Sem jî rabû ser pîyan û ji hemûyan ra gotî "nabe emrêk ku ji Bexdadê ve bê lêkolîn û bê sahî were girtin. Êsta Silêmanî texlîse dikin; esker, polîs, eslihe, cebexane, pare, erzaq wesaîre hemû li cîyê xwe ne. Û ev e kilîdê xezîneyê talîm bi kî bikim. Gotî ku bi reîsê meclîsê wê întixabe dikin. Hemû bi hev ra gotin cenabê Şêx Qadir Efendî bo êsta munasib e. Belam pêwîste zor bi çapûkî cenabê Şêx Mehmûd Efendî bête vira. Heta ku îdareyê karûbar ê Kurdistan temîn bike. Li ser vê gelek guftûgo hate kirin. Û ji teref azayan hinek pîrs û cewab ji hakimê sîyasî hate kirin, di cewabê hemûyan da her eve got: "Wextê qîse nî ye, em nika diherin. Hun fikrê îdareyê xwe bi xwe bikin.

Meclîsa we heye. Azayên we hazir in, madem ku we Şêx Ebdulqadir Efendî bi reîsî qebûl kirîye û îtîma- da we bi wî heye bo îdareya hemû karûbarê we, bo muhefizeya asayîşa we bi qerarê meclîsê îş bikin. Em bi mûcibî emrê qetîî ku me wergirtiye herçî memûrê îngilîz e, dê Silêmanî texlîye biket”.

Li paşê ev qisane, hakimê sîyasî bi xwe û muawin û qumandanê eskerê îngilîzî ligel komelê westan û dia xwe ziyan kir û heyetê hazir cîyê tiyareyan bi cî hişt û bo bajarê xwe vegerane. Li paşê memûrê îngilîz bi tiyarê hereket kir. Ev mulaqat û dawîyê çûyina îngilîzan ji seet yekê rojê ve heta seet şeşê êvarê dewam kir. Belam li vê wes- tane bo çavenêrîyê hatina Mîcir Nowîlî ku hakimê sîyasî yê Helebçe û navçeyê Caf bû. Ku ew nehat, evan şandin.

Azayên Meclîsê Millî li jêr rîyasetê Şêx Ebdulqadir Efendî her wê rojê seet li pêncê di daîreyê hikumet da kom bûne, çinku emnîyet bi întizamê eskerek ve bû. Ji aliyê mîrlîwa Mistefa Paşa ve têgeyand nû îxtaratî lazime bi heyetê eskerîye kira. Hemû zabî û esker heta damezrandina hikumetek, pêwîst bû mihefizeya millet û nîştîman û alî alexusus bo sîleh û cebexane û xezîne hemû ehd û peymanî kir. Bo şev û roj dewrîye û saîr hate tertîb- kirin. Her ew rojê întizam û himetî eskerîye û fitanîtî zabitan çavê hemû kesî pê ket û li der û jorê şar da asayîşê mihafîze kir. Roja duwem ji aîleyê Hemewend Kerîm Fetah Beg, Mihemed Emîn Axayê Feqê Qadir, ligel Feqê Mihemedê Hacı ku reîsê rişewende ligel kurên Kak Ebdulezîz Xale û etbaîyan daxilî Silêmanîyê bûn.

Cenabê alî hakimê Singa û Şêx

Ebdulqadir Efendî û mehzûmê muhterem ê cenabê Şêx Mistefa ligel pêgir û ewan ên li pêştir hatibûn Silêmanî, meşxûlê mihafîzeyê emn û asayîşê bûbûn. Roja sêyem ku roja hênî bû, li beynî hinde xelk ku ji layê Ranye ve hatibûn, bi taybetî li zimanê hemûyan da hatina jimarek eskerê turk ligel top û mîtralyoz û gelek siwarîyên ku ji Dukanê ve diên bo Silêmanî û deverên din. Heqîqeten hemûyan heqê wan bi dest bû ev cûre propexande bo turkan bikin, çunke li pêşiya wê gelek başiyên hikumetê Osmanlî ligel kurd bûn, beşê zortirîn merivên wan rêkiribûn Bînxazîyê, li wê derê ji birçîya mirin. Înca hez ji wan fikir ku dubare turk bêne. Ne hikume- tekî millî yê kurdî bête damezirandin. Gerçî xelkê Silêmanî û her kurdek ji sebebê bi rabiteyê dîn ku çend sed sal e kurdî pê bitrateve. Ji awazê hatina ordûya turk memnûnbûna wan xurayîye. Belam cîyê tesbîb e ewanê li beranberê ew xizmetên ku bûne bo îngilîzî bidestxistina serwet û îkram bûn. Û di zemanê îngilîz da xwe bi nêzîktirîn kes û fidakarên hikumetê Brîtanya nîşan didan. Ew roj bo stîrî Masbîq ahwalê xwe li millet yan jî bo ku întiqam ji miarizên wan û bo evê ku hikumetekî kurdî yaxud tirkî bête damezirandin di wî jî da bo xwe cîyek bigrin. Ev heta bi dereceyek bû, her kesî bawerî nekir aya bi hatina heştê hezar kesên pîyade û siwarî yên Tirkîyeyê û bi hezaran top û mîtralyoz û yaxud bê wata ye ku waye li Koyê ne. Êdî ew bi xwe ve wa ne û hem ew duşminê nîştîmanê wan e. Ew minfet- perist in. Ew cahil û bê şeref in. Ji cehi- lan û yên li bazarê re digot “temaş a bikin filan peya dibên îslah hez bi

gawûr dike, bi hatina eskerê turk naket” Bi weha fikrê bo ixtîlal teşwîq dikirin. Li wê wextê da bo ku nimêjê cume temam bû. Bi emrê cenabê Şêx Qadir Efendî wucûh ayan û munewerên memleket li der û jorê daîreyê sîyasî da bi îzdihamekî pirr gewre civîna xwe kir. Basê sê meselê dikira. Ku her kes li ser ev sê meseleyan şiroveya xwe binûse. Yaxud bi ziman bibêje, bi aşîkar her kes fikrê xwe beyan biket, belam qetîyen yek- ûdu dilgîr nekin û di derheq mexlûbkirina yekî de qezencê şexsî nebînin. Û hemû bi qirarê pirranî û tabîî pirraniyê bibin. Bo vê sed car bi quran û ayet sûnd xwaribû. Li pêşîya ev sûndê jî her ew roja ku îngilîzan Silêmanyê bi cî hişt. Bi qirarê meclîsê ku çend kesekî dî li wucûh memleket ji xaricê azayên muntexîbeyê millî li karên girîng îhzar kirabûn, nameyek teemînê bo wan nûsî û îmza kir ku kes ligel kesî xerezê şexsî teqîb nekin. Û sirf bo menfetê millet û weten xebat bike û di navbeyna wan da hîç tehrîkat nebe. Li pêşîya destpêkirina vê muzakereyê cenabê Şêx Qadir Efendî bi îtîna bo xîlafetê îslamî yê derheqê qewmîyet û millîyet de hinde gotarên maqûl beyan fermû.

Ew sê meseleyên ku muzakire li ser dihate kirin evana bûn; 1- Damezirandina hikumeta Kurdistanê. 2- Qebûl û îstiqbalkirina eskerê turk. 3- Her kesê arezûkirina hikumetê îngilîzî divê, bila aşkira bêjin.

Ewanê ku me basê wan kir bi sûnd û temînatê musterek bûn hîç yekî ji wan bi serahet qiseyan nedikir. Belam bo vê ku fikrên serok û mezin ên roşinbîr li ber çavê yar û bîyaniyan dîyar bibî. Û divê ekserîyet bizanî ji teref Mistefa Paşa ve defter hatiye dayin ku

her kes fikir û îştîhadê xwe binûse. Ta azayan malûm û cem’î bikirî û ewê nûsîn nezanî bi hoyî mu’temanan li defterê xwe binûsî. Ev teklîfa hîç faîdemend nebû:

Hakimê qeza Riza Beg ku li zemanê îngilîz da girêdayî bi *Cemîyeta Kurdistan* bûn, bi serlêdana nivîskî îstîfa kiribû. Û li wan rojan da yanî li paş çûyina îngilîzan, li ser şayîbeyaya hatina heşt hezar eskerê turk li nezerê hinek kesan da xwe zor bi terefdarê turk ê hişgir nîşan dida. Rabû ser piya gotî “bo çî em li ser kaxiz binûsin her kes terefdarê hatina îngilîz e, destê xwe helbidî tê zanîn” netîceyek hasil nebû.

Li paşê dîsa her Riza Beg bi dengekî bilind gotî “kî kurd e divê destê xwe helbidî”, xeyrî wî û çend kesekî din gewre û biçûk bi carek bi şidîn destê xwe hilkir bi ev awazê “ligel xîlafetê îslamîyet malûm e, her bijî Kurdistan û hikumetê Kurdistan” û bi carek çepikan lê da, ji ber vê zêde hêsir ji çavê wî dihate xwarê. Digot wan, divê hikumetê me yê millî hebe. Hikumetê me yê Kurdistanê divê. Li paşê Riza Beg gote min hêsta pirsên xwe temam ne kiriye.

Çinku li vê weqtê ji meclîsê derçûna Mistefa Paşa pêwîst bû, ji reîsî musade dawa kir ku fikrê xwe bibêje û gotî “madem li ser kaxiz fikir nayê nûsîn, piranî çawan dîyar dibe. Fikrê min ligel rabiteyê xîlafet û îslamîyet e bo selametê weten û teşkîlê hikumetê millî yê kurdî ye, her kesî fikrê li vê merkezê da bi aşkira bibêje yan jî binûse” ligel vê herçî mûteber û munewerên Kurdistan û danîştîwanan bûn, xeyrî 3-4 kesî hemû bi carek ev fikir pesend kirin bi awazê keyfxoşiyê daîreyan pirr kir. Li ser vê Riza Beg gotî

“evana mindal in bi vê qeydeyê çawan dibî”. Mistefa Paşa ciwabê wî da û gotî “tu bo çî fikrê xwe bi muwafiq qirar nanûsî yaxûd bi aşkira nabêjî.” Du-sê kesên din gotin nabe ev bi aşikarî bête beyan kirin, û nabe navê me li ser defter û kaxiz bête nûsîn. Cenabê Hefîdzade Seyîd Ebdulla Efendî herçend kaxiz û defter hênaye pêşve, teklîfa nûsînê fermû, faîde nebû. Li wê gavê da merivekî rûtelle bi wasteyê Qumîr Hîlmî Efendî, teqdîmê meclîsê kir. Gotî qelem piyawê wergirin. Zor muhîm e. Merivê pêkve gotî: “Eva leşkerê zor ên tirk taqim bi taqim, tabûr bi tabûr, piyade û suwarî geyişte Şîwî Awdar ku nêzîkî şar e, çavê min bi xwe pê kevt û hatim ku xeber bidime”. Li ser vê komele belav bûn û hatin derve, heta bizanin ev leşker çî ye. Mistefa Paşa bo mihafîzê asayîşê memleket û îtixazî tertîbat ji eskeran re emr kir ku li jêr qumanda zabîten xwe da berhev bibin. Heta baş derkevî ku ev qisane çî ye.

Li vê wextê nazik da cenabê Mistefa Paşa ji teref Kerîm Beg Fetah Begê reîsê Hemewend û Ewanîye ve kit û pir hate girtin. Û her li wê derê û li wê cîyê da Qumîr Hîlmî Efendî ku ligel çend polîsek nêzîkê Kerîm Beg bûn û Mistefa Paşa bi zor bir û wan heps kir.

Li ser vê ku Mistefa Paşa hepsî kira. Û hepsîkirina ev peyayê nirxdar bê agahdarîya reîsê Meclîsê Millî bû ku sebebên wî li paşê tête gotin. Hemû eşrafê şar û peyayên cemîyetdar û hemû munewerên hizirdar ketine telaşê û nêzîk bû ku gelek hirawû-huryên xwînavî ser bidet. Belam cenabê Şêx Ebdulqadir Efendî Midîrê Singaw ligel Şêx Mistefa Efendî mexdûmî zor tekoşîn kir û li sayeyê xudayê gewre bi bê wîqûat her li êvara

wê rojê hate berdan. Li ber derîyê serayê da zor kes li dor Cenabê Mistefa Paşa kom bûwe. Ji layê nîştimanperwerên xort ve bi keyf û sirûde hate pêşwazî kirin. Û bi çepê rêzane birine malê.

Her wê şevê ji teref esker û polîs ve întizam û tertîbekî baş damezra. Welat kete asayîş û sikûnê. Û peyamîgîranê Mistefa Paş geyişte serok û begzadeyên Caf û Pişdir, zor piroşîmend bûn. Ku ev çî muemayek û çî tehrîqat bûwe. Roja çarem ku roja şembe bû, ji aliyê reîsî Meclîsê Millî celaletmeab Şêx Ebdulqadir Efendî ve, bo xeberwergirtina cenabê hikumdarê Kurdistan Şêx Mehmûd Efendî, li ber evê ku xeta telxirafê Silêmanî, Çemçemal, Kerkûk hatibû xirab kirinê. Bi otomobîl cenabê Seyîd Ehmed Efendî Hincîre bo Kerkûk birê kir. Çünke ev zat li ber çavê hemû kesî xoşewîst bû. Bi silametî geyişte Kerkûk. Roja şeşem cenabê Seyîd Mehmûdê reîsê aîleyê Cibarî ligel etbaî xwe ve ji Çemçemalê ve, û cenabê Mehmûd Axayê Kûrî, Elî Axayê Pişder ji Qeladiz ve bi teşrîfen hatin Silêmanî. Hemû ji teref Şêx ve bi îzat û îkram bi xêrhatin kirin. Her kesî li qonaxekî bicîkirin.

Roja heftem ku roja duşembe bû, begzadeyên hemûnd bi wesîleyê ew mamûrîyetan ku ji aliyê cenabê Şêx ve bo wan hatibû bexşandin ku li qeza Çemçemal û Surdaş rûnine. Nav û memûryetiya wan li navê paşî de hate nûsîn.

Roja heştam cenabê Seyîd Ehmedê Hincîre ji Kerkûk bi otomobîl vegeriya Silêmanî û ev xeberê hîna, ku “cenabê hikumdarê Kurdistan ji Kuweytê ve resmen hereketê teeyîn kiriye. Û îngilîzên ku li Silêmanî diman li

Kerkûkê kombûne. Asayîş û emnîyeta Kerkûkê tête cî bi cî kirin. Û ew qiseyên îngilîzan ji wan pirsibû, hemû hatibûn bicî”.

Cenabê celaletmeab Şêx Ebdulqadir Efendî bo rênedan bi hawalî bi wateya parastin û emnîyeta bajêr. Emr dabû ku kes bi çeka xwe ve di bajar da negerî. Li ser ev emrê esker, ji ahalî û eşayîr, her kesê ku bi çek ve bigirtaye, sîleh ji wan distand. Û xençer jî bibûwaye yan dê bişikanda yan dê bihîna teslîmê amîrê xwe bikira:

Heqîqeta bi vê cûre kirina întizamê welat ragîra. Û ji bo hindê karê nîzamanê rêya derfet pêwe dira.

Sadatê Berzenciyan jî ku teşrîfen hatibûn bo xizmeta cenabê Şêx, ewanê ku pêwîst bû her yekî bi mamûrîyetî hatin teltîf û tayîn kirin. Û bo mihafizeya karwan û rêya Bexdad, Şêxên Tîmar û cenabê Şêx Ebdurehman Daraxa hate tayîn kirin. Heqîqeta mamûrîyeta ev merivan zor bi cî bû. We bo hemû kesan basê keyfxoşî bû. Ev çend şevan bi hoyî siwarên xwe bo mihafizeya asayîşa dewrûberê şar, hîmnet û xîretê cenabê Şêx Mistefa Efendî kurê Şêx Ebdulqadir efendîyê Singa nayê înkarkirin.

Rojek li paş roniştina îngilîzan li Silêmanî bo tehqîqî şayîbeyaya hatina eskerê turkan ku di devê çend kesek da dewranî dikir, celaletmeab Şêx Ebdulqadir Efendî, Ebdûle Axayê mûtemedê xwe şandibû alîyê Sûrdaş û Dukanê û roja sêşem vegerawe. Ew hemû qiseyên mifirdeyan dikir derew derket. Ku ji alîyê hinde kesî ve heldibira bo têkdana efkarê amme (raya giştî) û xizmeta bi dijminê weten re dîyar dikir.

Û bi goreyê xezeteyê *Necme* li Kerkûkê û xezeteyê Bexdadî jî, terk kirina Silêmanî ji alîyê îngilîzan ve,

dîyar kir ku kurdan bo tekoşîna serbixoya millî ji weqtî îstifade kirine. Û bi zorê bazûyê xwe serbixweyîyê wergirt

### Roja Ala Helkirinê

Li ber vê bi tekbîranîna mezinan û endamên Meclîsê Millî biryar da ku alayek dirust bikin her wekî ew beyraxa ku pêşîyê, li zemanê hikumdare cenabê zeîm Şêx Mehmûdî hebû amade bikin. Û pêwîste li wê cîyê jî helbikin.

Li ser ev biryara (Roja 15 Eylûl 1338 = 1922) piştî niwêja Cuma li hewşa Mizgefta Gewre da lejkerên millî û şagirdên mekteb û eşraf û mezinên welat û serokên eşîretan ligel gişt danîştivanên Silêmanî sef bestayî (girêdayî) îhtiram bûn. Li jêr alaya millî ya Kurdistan ku helkiribûn, hindek li ber wî deparanewe û hindek nûtiq dixwendin. Û bi hemû îhtiram ve li ser daîreyê hikumet û qisleyê eskerî alaya xwe bi tanzîmatekî lazim çikandin.

Li paşê silam û dûa cenabê Şêx bi kemalî tazîm û tefxîm bo dewlet-xaneyê xwe ku xaneyê miqedesê Hefît (Kak Ehmed e) qesîse gerandin û bo kêfxoşî li jêr alaya miqedes a Kurdistanê çend top hatin avêtin. Û ji alîyê eskeran ve ligel ehd û peymana sêdaqetê çend rîje tîfing kira. Xuda li Kurdistan pîroz biket siye bare bi genim û ew roja mubarek e:

Sûretê telxirafnameyê ku cenabê Şêx Ebdulkerîm Qadir Kerîm bo celaletmeab Şêx Ebdulqadirî şandiye ku derhaqê sîyasî ye berî hatibû.

### Bo Cenabê Şêx Ebdulkerîm

*Roja Çarşembe:* li Kifrî 13 Eylûl 1338 - 1922. Evro ku Şêx Mehmûd û

Şêx Mehmûd Xerîb digehîne Bexdad, bi ewelîn bo Kifrî hereket dikan. Belam li pêşîyê tevgerîn bo hinek îşî lazime, dê Mindûbî Samî muşawirî ligel biket. Heta xeberê bidim te, se- kina te li Kifrî pêwîste. Her wextêk Şêx Mehmûd bo Kifrî hereket kir, te xebêrdar dikim.

Hakimî sîyasî  
**Mîcirkold Simîş**

Bina bi emrê ku li Kifrî ve ji teref hezretî hikumdarê Kurdistan cenabê Şêx Mehmûd ve hatiye. Bo hinek miza-kireyê îş û karê Kurdistan şeva sêşem-be 19 Eylûla 1922 cenabê Hacî Mistefa Paşa û Ehmed Begê Tewfîq Beg, Mihemed Axayê Ebdulrehman Axa, Îzet Beg Osman Paşa, Îbrahîm Efendî zabîtê eskerî, bi otomobîlê hereket kirin bo Kifrî.

Li van deman da rojnameyê *Bangî Kurdistan* ev qiseyên xwarê dinûsî "Li weqteke cenabê Se'd Zexlûl Paşa ku li ser meseleya millîyet li Misirê tete girtin û bi heps dikan. Li paşê vege-randin, erebên Misirê hemû bi civakî çûn bo pêşwaziya wî. Û wî li ser mil û serî helgirtin. Bi vê cûre îhtiramê anîne bajêr. Ewa hezretê hikumdarê Kurdistan cenabê Şêx Mehmûd ku li ser eynî meselê hate girtin. Û sê sal û nîv e bi enwayî rezalet li Hîndistan hatiye hepskirin û cizre bi dirawe êsta bi melîkayetîya Kurdistan anîne nizîk, ku bizanin milletê kurd çi cûre pêşwazî li wî dikan û îhtirama wî digrin. Û li derheq nawbiraw bi çi hissî û hurmetê bo wî pê şan didin. Waqia bi teşrîf anînê xelk çend zêdetir bi gul û gulaw wî baran dikir. Li paşê basê wî dikan û çend kesî ketine jêr dest û pîyan.

Roja 16-yê Eylûla 1922 li zarê hinde kesan de dihate gotin ku Silêmanî, wek

di zemanê berê yê hikumdarê hezretî Şêx da bû. Mixalifan cemî- yetekî xefîye damizrandine, ev alaya Kurdistanê ku hatiye hilkirin, dê deynîne xwarê û bi xwe alayekî taybetî li cîyê wê biçikînin. Goya bi hoyê hêzeke ve kurdê li şar da hinde kesên bi navûbang û nasbûyî dikujin. Û eskerê Turkiyê jî goya alay alay, firqe firqe li Dukan li Ava Zê kiçe pirîneve bo aliyê Surdaşê (ku deh seat ji Silêmanî dût e) heta komelekî mexsûse jî ku li mêj ve meşxûl kiriye bo propaxande, yanî firûfil bû. Bo bi pêveçûna qumandanê eskerê turk ku bi navê xwe "Ozdemîr Paşa" şandîye. Heta bo siwarbûnê jî hespêkî zor çak (belam ne wek malê bi pêrweçûyîyan bî, belkem bi emanet li xeyr xwestiye) birê kiribû. We dîsan got bo dawet bi navê ehlê Silêmaniyê gelek kaxiz çêkirin û tertîb û bi dizîyê ve çû aliyê Özdemîr ku xeyrê ev kaxizan ji vê pêrweçûn û dawetan ew kesên navborî û meşhûr li pêş da û kesên din xebêrdar bûn. Û di zimanê xelk da şayîe hebû goya ligel ev bi pêrweçûn û bangkirin "lîste" yanî defterê ku navê gelek kesên ku musteheq bi kuştin yan bi mal talankirin yan bi hepsê pazde sal mehkûm kirin têda hatibû nûsîn û dibêje, ev roj û rojê 17-ê Eylûla 1922 bi vê cûre şayîate ve bo qise birin û direw li ser êkxistina firkuhurî daîm ew mihûdan û malan weha dewam dikir. Kesê ku li qidê û bi vê adet fêr nebû bî, nedibî xeyr ez eve ku ya star bixwînî tiştê dî bedellî dane dihat.

Ji teref wezîfedaran ve bi taybetî bi hoyî siwarên sîyadetmeab cenabê Şêx Mistefayê kurê Şêx Ebdulqadirê Singaw. Û cenabê rişadetmeab Şêx Ebdulkerîmzade Şêx Mehmûd Efendî, Cenabê Şêx Ebdurrehman Daraxa

asayîşê daxilî û derûdora bajar dihat mihafizekirin.

Belam ji ber ev çêbûnan yanî derxistina derew û delse û tizwîratê li daxilê bajar da û bi taybetî sirwetê navxoy emnîyetê dilê wan ne mabû. Bo qaîmkirina tişt û mekiyan bi dizîyê ve mijûlbûn. Û subhanallah li çi zemanek wan bi zahirî îftîxar bi îslamîyet û mirî dikin. Li ber îxlafê efkarekî bê ehemîyet û derew û delseyê Turkçîyan her wekû dema sultan jî weha bû, birayê dînî bawerî li birayê dînî yê din nake. Û li beranberê yekûdu mijûlê tertîbatê duşminayeti ne.

Şeva sêşembe 12-ê Eylûla 1922 bi îradeyek ku ji layenê eşraf cenabê celaletmeab hezretî hikumdarê Kurdistan Şêx Mehmûd dam şewket ve geyîştibû hezretî Şêx Qadir Efendî, Mistefa Paşa û cenabên Osman Paşazade Îzet Beg û Ebdulrehman Axazade Mihemed Axa û Tewfîq Begzade Ehmed Axa bo mulaqat û îstîqbalî hezretî hikumdar bi otomobîl di rêya Çemçemal û Kerkûk da birêkirine bo Selahîye.

Ew cemîyeta xefye ku li pîşîya vê me bas kir. Goya li ber ev e, wan xeber bihîst ku hezretî hikumdarê Kurdistan Şêx Mehmûd ji Bexdadê hereket kirîye û dibêm ji nêzîk de teşrîf dikate paytextê Kurdistanê li Silêmanî. Herçend sê-çar roj bêdeng bûn û li derew kirin û bi zahirî firaxtiyan kir. Belam di roja 24-ê Eylûlê de, çunke hikumdarê Kurdistan ji ber hinde karê resmî nextêk ji hereket kirinê texîr bû. Ev zatane jî bi emrê resmî çûbûn bo selahîyen hatinê. Ev cemîyetê xefye yê bênamûsane dubare ketine derew belavkirinê. Ku goya ev heyeteka li Silêmanî ye bo mulaqat û îstîqbalê hezretî hikum-

darê Kurdistan çûn bo Kifrî û ji wê jî wan birin bo Bexdad. Û hinekan digotin wan hepis kirine.

Û di nav bazar da çend kaxizan belav kirine, ku goya ev kaxiz ji teref qumandanê eskerî yê turk ve bo eşrafê Silêmanî hatiye nûsîn ku hîç xof nekin, hemû îslam in û turk jî îslam in, biçin bo îstîqbalê wan bikin û mezbeteya wan bidine û wan bînin bo şarê Silêmanîyê û li sûretê kaxizek da ku ew qumandanê turk bo cenabê Ebasî Axayê Mehmûd Axa reîsê Pişder nûsî bû, tê da beyan kiribû. Ku eger xelkê Silêmanî eskerê turkan bi ihtiram qebûl û îstîqbal ne kir, bi wasiteyê quwetê Pişder ve, sitûtê hikumetê turk nîşanê wan bide. Û eger Mistefa Paşa û hempakanê wî bi zindîwetî hatin derdest kirin, ritbeyê paşayî yê ku Meclîsê Millî yê Enqere dabû, jê distînin. Û li kaxizekî dî da (ku Özdemiş) paşa bo qumandanê mifre- zekî Dukanê nûsîbû, Emrê dabû ku li Silêmanîyê îdareyê ehkamî ûrfîye biket.

Îca ku xelkê têgeyîştin mixabin tirk wekî her caran rêya xwe ne gorîye. Efkarê xwînrijîn û îdamkirinê li dîmax de mawe, belkû zêde kiriye. Pirraniya alîgirên turk ji tîrsa gîyanê xwe pişîman bûne. Îca bi dizî ve li aleyhê turk qise dikirin. Ji ber vê, ku dîsan got seatêkî dîke digehîne şar, wan cesaret ne dikir bi aşkira li aleyhê wî qiseyan bikin.

Roja 25-ê Eylûla 1922 paş nîvro cenabê Îzet Beg Osman Paşa, Ehmed Beg Tewfîq Beg, Mihemed Axayê Ebdulrehman Axa ku bo îstîqbalê hikumdarê Kurdistan çûbûne Selahîye. Bi otomobîl veegerane daxilê Silêmanîyê bûn. Ligel wan da hinde emra û zabitên kurd ku li pêşîya wê li hepsê

Osmanliyan bûn, vegerabûne Bexdad. Û ji bo xizmetê weten li Bexda ve qaîmeyê xo pêşkeşî hikumdarê kurd kiribû. Mîrlîwa Sidîq Paşa, bînbaşî erkanî herb Tewfîq Wehbî Beg, bînbaşî Xale Seîd Beg, yuzbaşî Reşîd Efendî, mulazim Emîn Efendî, mulazim Ezîz Hîkmet Efendî, mulazim Ebdulezîz Efendî, mulazim Rewanduzlî Emîn Efendî teşrîfyen aîne Silêmanîyê. Û wan xeber da ku hezretî hikumdarê Kurdistan Melîk Mehmudê Yekem bi siwarê hesp bi rêya Qadirkerem ve teşrîfî diçe bo Darêkelî. Di vê vegerê da qazancekî sîyasî millî heye. Li ser vê derew û delse vemirîn.

Îca komel bi komel ji hemû layekê ve û heta ewên derew û delseyan tertîb û belav dikire jî, dest pêkir bi conîdana turkan û piropexandeya li aleyhê wan. Û îhzarê dostayetî bi mixelîfên xwe re dikirin. Ewanê ku çûbûn bo pêşwazîya hikumdarê Kurdistan bi şeref nîşan didan.

### **Geyîştina Hikumdarê Kurdistan**

Li nav şarê Silêmanîyê da bi emrê cenabê reîsê meclîsê millî yê Şêx Ebdulqadirê Hefîdzade, bo pêşwazîya hezretî hikumdar tertîbatê lazim be hatibû cî bi cî kirin. Çar taqî zefer durust kira. Yekê li ber dergayê mala hezretî hikumdar, yekê li ber dergayê telxirafxane, yekê li ber dergayê Mizgefta Gewre, yekê li ber cadeyê polîsê li xaricê bajar durist kirin. Bi enwayî gul û tiştên ciwan razayeve û hemûyan bi alaya şîrîn a Kurdistan tizîn dikirin. Roja şembe 30-ê Eylûla 1922 ku peyamê Collanewê hezretî hikumdarê Kurdistan ji Darêkelîyê ve geyîşt. Li vê ber û ew berî ev çar taqî

zefer da serbazên pîyade û şagirtên mekteb, ku ev şagirtan her yek alayeka pîroz a Kurdistanê bi dest ve bûn, bi temamî di rêza edebê de bûn û hemû dukan û bazar daxira, ehlê welat û eşîret û qebîle bi siwarî û pîyadeyî heta du seat rê komel bi komel rêz bûbûn. Seet şeş û nivê rojê hezretî hikumdar geyîşte bajarê Silêmanî yê payetextê Kurdistan. Heman dem û dest (21) top agir da. Û ji alîyê lejker û şagirdan ve li mekteban resmî selam hate cî bi cî kirin, şagirtên mekteban goranîyên millî û niştîmanî xwendin. Li ser xan û banê malan ve jinan û mindalan hemûyan gulaw û gulan dixiste xware ve, têkra gulbaranî hezretî hikumdar dikir û bi deng digot bijî melîkê Kurdistan Şêx Mehmûd! bijî kurd û Kurdistan! ev dengê xweş navbeyna erd û esmanî pirr kiribû.

Li dawiyê da ku geyîşte dewletxane li paşê deh deqîqe vehêsa û ji dergayê hodeyê taybetî yê hikumdariyê ve hate der.

Hemû sadat û alim û eşraf û ahalî û memûr û saîre ku li vê hewşê gewre da bi rêze danîştibûn rabûne ser pîyan. Hezretî hikumdar beranberê wan rawesta. Û bi selam beyanî îltifatî fermû. Li vê weqtê da cenabê Xetîb Efendî bo dewama îqbal û muwefe-qîyeta hezretî hikumdar xutbeyekî xwende.

Hezretî hikumdar daîr bi vê ku bo pêşketina kurd û Kurdistan bi hemû cûreyê xebat û tekoşîn difermûyit û bo xizmetê millet bi giyan û dil amadeye gotarekî pirr meana û şîrîn bifermû. Li piştî vê teşrîfê çû jorê ciyê taybetî yê hikumdarî. Ji aliyê belediye ve bo hemû daniştivan şerbet, qehwe, cîgare hate pêşkêş kirin.

Şeyh Mahmud yargılama boyunca mahkemenin kendisine bir avukat tutması doğrultusundaki tüm telkinlerine rağmen böyle bir davranışa girmemi. Çünkü kendisini hiçbir zaman bir suçlu olarak görmedi. Avukat kabul etmenin suçluluğu kabul etmek anlamına geldiğini düşünmekte idi. Aksine, O İngilizleri suçlu olarak görmekte idi; çünkü onlar kendi ülkesini işgal etmişlerdi.

Mazlum halklara hak ve hukuktan, onların bağımsızlığından, kendi kendilerini yönetmesinden bahsederek yalan söyleyen, karşı çıkanları, kendilerini yönetmek isteyenleri de zorla tutuklayıp sürgünlere gönderen bu iki yüzlü yalancılara suçlamakta idi.

Şeyh Mahmud; askeri olarak yenilmesine, yaralı olarak esir düşmesine rağmen Askeri mahkeme karşısında asla korkuya kapılmadı, geri adım atmadı. Cesur ve kahramanca bir tutum takınarak onlara haklılığını anlatmaya çalıştı, onları Kürdistan'da bulunmaktan, ülkesini işgal etmekten dolayı suçladı. Askeri mahkemenin Şeyh aleyhine tanıklık etmek için getirttiği tanıkları şiddetle suçladı, onların tüm ölümlerden sorumlu olduğunu ve kendilerinin yalancı şahitler olduğunu söyleyerek söylediklerinin hukuki hiçbir değeri olmadığını, tamamen siyasi bir gösterinin bir parçası olduğunu belirterek hakarete varan azarlalarda bulundu. Bu 'tanıklardan' Greenhaus'a mahkeme salonunda

*"Alçak adam bunların tümü senin ve arkadaşlarının adi oyunlarının sonucudur!"*

diye bağırıştır. O İngiliz işgal güçlerine karşı memnuniyetsizliğini dile getirmiş ve buna karşı silaha sarılmaktan başka bir yol bulamamış, görevlerini yerine getirmek için cesurca savaşmış bir kahraman olarak halkımız zın gönlünde taht kurmuş bir öncüdür. Bu kahramanı minnet ve saygıyla anmak her kürdün görevidir.

*Sahîfe:1*  
Muherrîr  
Elî Kemal

*Rojî Kurdistan*  
Sahib îmtiyaz û midîr mesul  
M. Nûrî

Bedel abone:  
3 mang êk, 6 mang du,  
salêk çîwar rupîye ye.

Îlanat bidîrîk  
3 ane deh sîrît

## Rojî Kurdistan

Bo hemu bitêk mirecat  
be midîr mesul dekira

Bo xaric ûcretî posta  
îlawe dekirî

Tarîxî întişar  
15 Tîşrînî sanî 1922 Silêmanî  
sîyasî, edebî, ictimai gazeteyekî resmî ye  
heftê carîk derdîçî

Nusxeyê be aneyek

Nusxeyê be aneyek

Sal: 1 Jimare: 4\* [Çîwarþeme] 16 Rebûlaxir 1341 6 Kanunî Ewel 1338

### Dîsan Hîzbî Hurî Îraqî

Be tarîxî 18 Rebûl Ewel 341 û 316, jimarey cerîdey *Dicle* le *Necmewe* iqtibasêkî kirdiwe. Keyfîyetê hukûmet, qabîne, Beydaxê Kurdistanî nûsiyewe. Le duwayî da sahibî xezete ke xoy îla Silêmanî ke emro Kurdistanê, ême be lîwayekî Iraqî denasin. Hetta daxil kirawe bo intixabat û qet le Iraq ciya nabîyetewe. Êtrî em xeberate çî ye? carî le beydaxê Kurda dû xencerê mutesalib nîye.

Û me li nusxey ewel carî *Rojî Kurdistan* da cewabî Hizbî Hurî Iraqî da, çend qiseyên ême erz kiribûn.

Reng e em sahibî xezeteye çawî pê nekewtibîbuwe wa hîç kar bê xeber û bênezaket em qise sethiyanê nûsiyewe. Ke wa bî ba emîş bêcewab û bêbeş nemînetewe.

Şayanî heyrete le hemû Îraq da ke be îtibarê nufûs û tebîet, nêzîkî nîweyê Kurde tenha Silêmanî be Kurdistan tede wan.....bûl kirdiwe. Ke çî şuwê şuwê wekû ême nazanî ke hudûde tebîeyê Kurdistan le kuwîwe ta kobî dagir kirdiwe. Nazanim em new'e kesane be çî dil û derûn û be wicdanîkewe detiwanin em mutaleyane le xezete da binûsin. Çünke xezete tercumanê hissiyat û zebanê millete û hezaran erbabê marîfet û malûmat dexunîtiyewe.

Xoy le sayey cereyanî siyasî û xedematê berguzîdaneyê wetenper-

\* Di xwerû da navî hejmarî 4, bi navî hejmarî 3. hatiye navandin.

werekan demanewe emro le şonîkî ladî  
birsî çon sinor û çuwarlayê  
xanuwekeyê xoy dezanî bo teherreyê  
hudûdî tebiyyeyê Kurdistanî le ber  
kirdiwe.

Belê, ême hudûd û huqûqê xoman  
dezanin. Ebî xelqîş heq û heddê xoy  
binasî.

Heqîqeten înkare madî û mede-  
niyet û necabet û enenatê milliye û  
tarîxê qewmê ereb nakeyn û ême  
dirasî qedîmeyê muhteremeyê xoman  
biqed-rê birayêkî ezîz û mihribanê xoş  
wubit. Belam hudûdê ke heqîqet û  
tebîetê daniyabî, huqûqî ke alemê  
insaniyet û medeniyat bişî kirdibî be  
ême û ewan têk naçî. Ew destê binîne  
binakoyan. Çunke heq e, heqdar bine  
bişe beşdarîn. Meseleyê intixabat,  
nizîkî du sal e le Iraq da ceriyan dekate  
binaşkirê benî hêştâ mebûsêkî ereb le  
meclisê mebûsan da neçûwe ser kursî,  
xitabat û beyanatî bidat. Bawerîş nakim  
hîç kurdêk dil û derûnî qebûl bikat,  
waz le weten û miletê xoy bînî ke emro  
çawe-rewan û muhtacê himmet ewin  
biçî goyê le hîs û bîsê erebî bikrî. Xêr be  
xewîş nek be derwîş, Kurdistan qet  
daxilê Îraq niye. Çunke Îraqê ereb,  
Îraqê ecem heye. Kurdistan naçîte  
xerîteyê hîç Îraqîqewe. Nawî xoy be  
xoyeweyîfî...

Waqien Kurdistan û Erebiaş mer-  
bûtê dînî û iqtisadiyan pêkweye. Lakin  
emîn bin em merbûtiyete muteqabil e.  
Ewîndê zelîl û zebûn neyn ke xelq  
bituwanî temi' bikate laşeman..

Legel emaneş da dîsan ême hemû  
wextî be hissiyatîkî hurmetkaranewe  
temaşay hemû ferdî le efradê ereb  
dekeyn û seadet û xeyr û xoşî le milletê  
necîbe bi qederê nefse xoman arezû  
dekeyn. Belkû be birayetî û dostî

ewanewe iftîxar dekeyn. Hetta lem  
qesaneş ke ew kabiraye le xezetêke da  
beyanî kirdiwe, muteesir rencîde  
nabîn. Çunke leman malûm û temayane  
ke em peyawe her be sabiqeyê men-  
featperestî û dilmist i-yewe em qise  
qanûnşikane denûsî reng e û bizanî  
ême ewinde his û muhakemeyê fikriye-  
man niye, mahiyet û qeder û qîmetê em  
new'e kesane nazanin weya lem  
xusûsewe ixbirar û teesurat hasil  
dekeyn. Ey eqlê ebesewî xeyalê xam  
qenaet û wicdaniye man heye ke efkarê  
umûmî ezkiyay ereb le ême zi-yatir lem  
neşriyatene muteesir bin û qethiyan  
legel ême da bêlutfî û bêmuhebetî rewa  
nabinînin. Çunke ême be hemû mew-  
cudiyetê xomanewe û bican û ceger  
hez be dostî û birayetî û seadetê em  
hukumet û millete dekeyn.

Ma çö ulfet ba kesî bistîm dîger  
neşkênim

Ger heme zehrast çon xordîm saxir  
neşkênim

Pêş ma yaqût yaqût est gewher  
gewher est

Resmî ma ên est, ye'nî qedrî gewher  
neşkênim

Arif Saib

\*\*\*

Ey em mişfîq ey wetenê pak û  
muhterem

Nemut mebe ewende girîftarê derd û xem

Nemut minale bisîye mebe aciz û pişyû  
Lade le rû nîqabê xem û mihnet û elem

Şikir û sipasî îzidî yekta bike bedil  
Emro ke boy be sahib ceşş û sipa û ilim  
Nemut minale beyse îtir weqtê îşrete  
Weqtê tiluê kewkebê îqbalê millete

-----  
Şukrî Xuda dekem ke weten bûy le xem  
riha  
Azade bûyî le qeyd hem mîhnet û cefa

Şukrî Xuda weten ke qîse û waad û min hemû  
Dêm hate dî nema le dillim da îtir eza

Şukrî Xuda ke dêmê wetenê mihrîban xom  
Ber îş û xoşî û ferh û îşret û sefa

Awat binde hate dê îtir nema xemim  
Şukrî Xuda ke zor terb û zewq û xermim

-----  
Emro weten ke rişik çimnezar cennete  
Şamî be eyînî subhê munîrî û seadete

Feslê hemû bihare şewî rojî rewşene  
Îşe, nişate, xoşîye, şewqe

Cehd û sa'yîyê (xebat) bikeyn bedil û ruh îtir  
hemû  
Emro zemanê sa'yîye ne wextî etaleta (tem-  
belî)

Ey zadekan şabên weten ehlî marîfet  
Hengamê sa'yîye û kûşîşe Mehmude aqîbet

Elî Kemal

### Vatan İmdadına

Gerçi senin sağlam bir yerin  
Kalmadı, kurşunla söküldü derin  
Dinle fakat sözlerini erlerin  
"Altı da bir, üstü de birdir yerin"  
"Haydi yiğitler vatan imdadına"

Kalb-ı adûv sarsılacak görse ger  
Sarsıyor etrafını binlerce er  
Böyle iken korku olur mu meğer  
Asker imiş sanki bugün her nefer  
Arş yiğitler vatan imdadına

Ey vatan evladı çekip hançerin  
Bağrını hun eyle gazanferlerin  
Azmine mani mi vatanperverin?  
"Yara nişandır tenine erlerin"  
"Haydî yiğitler vatan imdadına"

Düşman olan karşıma çıksın benim  
Darbe-i şimşire alşmış tenim  
Gör bu demir kalbi ve lue tedennüm  
Süngüsüne ben veririm gerdenim  
Haydi yiğitler vatan imdadına

Kaleciği sinesidir askerin  
Dobrası gencinesidir askerin  
Memleketi ensesidir askerin  
Korku mu? Biganesidir askerin  
Haydi yiğitler vatan imdadına

Var mı safa dehre gelen mert için  
Mevt mukarrer su ki her ferd için  
Bekleme hiç germ veya serd için  
Yok mu tahammül sana ber dert için  
Arş yiğitsen vatan imdadına

Kürd'e vatan kaygısı vermiş Huda  
"Hezreti Muhammed" olacak rehnüma  
Bayrağımız dalgalanır daima  
Ruhumuzu eyleyelim hep feda  
Haydi yiğitler vatan imdadına

Coş û huruş etnese kanın senin  
Yok meğer ol cisimde canın senin  
Çiğneniyorken hele şanın senin  
Hiç yaramaz sade imanının senin  
Haydi yiğitsen vatan imdadına

=====

Pay-i hakaretle zebunken vatan  
Yan gözle bakmak olurmuş, neden  
Ey vatan evladı giyip bir kefen  
Korkmamalı kız gibi hiç güleden  
Öyle hazırlan vatan imdadına

Medreseimiz, mektebimiz, ordumuz  
Uğraşacak yükselecek yurdumuz  
Derd-i vatandır varsa derdimiz  
Durmamalı koşmalı her ferdimiz  
Lazım olunca vatan imdadına

Gerçi bize çarh-ı kaza ve kader  
Gördü reva bunca mezalim yeter  
Hun-u hamiyet neden olsun heder  
Varsa esarettir ölümden beter  
Haydi yiğitler vatan imdadına  
Hastası türkün neler etti neler  
Kaldı mı artık din olmaz huner  
Kürd'e cihan söyler iken çir-i ner  
Böyle neden ya olalım derbeder  
Haydi umumen vatan imdadına

Düşmanımız hak ile yeksan olur  
Kim bize zulm etse herasan olur  
Sanma bizim cengimiz asan olur  
Kürd'e boğuşmak günü seyran olur  
Hep gideriz biz vatan imdadına

Refîq Hilmî

### Îradeyê Hezreti Mulûkane

Reîsî Zengene cenabê Elî Axa û reîsî  
Dawude cenabê Refet Beg û qidemli  
erkanê herb Yuzbaşî cenabê Tewfîq  
Wehbî Beg be yaweran hezretê  
mulûkane.

Û Emîn Efendîzade cenabê Tahir  
Efendî be Başkatib mabeynî mulûkane  
û Şêx Qadîrzade Îzzet Efendî be reîsu-  
lu-mena.

Û cenabê Şêx Muhyeddîn Efendî kanî  
kuwe be qumandanê masiyet quwayê  
millî ba iradeyê mulûkane tayîn fermu-  
rawen xowa lîyan mubarek bikat

Rojî Kurdistan

### Îstîxbaratî Xusûsî

Bina le îxbaratêkî xusûsî ke  
wergêrawe le teref qumandanê ceb-  
heyê Kurdistanî şimalî, Huseyn Reûf  
Beg û qumandanêkî hukumetê Îranewe  
bo mubayeê dû hezar êstir piyaw  
mamûr nêr rawetewe naw Pişdar.

Tayin

Cenabê Elî Samî Beg ke sabiqen  
memûrê icra buwe le Estambûl le ser  
emeî reîsî daxiliye tayin kirawe be  
mamûrê icra. Xowa mubarekî bika.

Le mêja (demî bû) le weten û qewm  
û biraderanê ezîzim dûr û mehcûr  
bûm.

Şukur Xwa natuwanim bicî bînim  
ke min lem roje pîrozeyê serbixoyê  
qewmê kurde wahinayewe Silêmanî le  
lutf û merhemetî eşrafî memleket û  
muteheyizan û biraderanî weten kullî  
mesrûr û mubahim. Le dereng û zûyî  
îadeyê ziyaret temaşayê qusûrim  
nekene. Xwa le hemû layî razî bî.

Be wasitey *Rojî Kurdistanîş* erzê  
teşekkurat û teyîdê ihtîramat dekem.

Qumandanê Eskerî Kurdistan  
Sahibqiranzade  
Salih Zekî

### Îtîzar

Hefteyê pêşû leber eweyê ke  
umûratê metbee zor bû xezeteyê *Rojî  
Kurdistan* derneçû lem xusûsewe le  
xizmetê aboneyê muhteremekan man

da beyanê îtîzar dekeyn.

### Îlan

Nimro: 28

Daxilî nahîyeyê Serçenar le dikanî pan yek parçe zemîn birawe ke be zemîn kanî sifirê meşhûr û şerqê be ew kanî pan û benawanî cîgeyê Kak Ehmed xerbî û cenubî be çem xiralyeşa wurawe. Dawud Bulaq şimalî becîgeyê kanî sifre û zemînê Hamid Efendî mehdûd be bêtapû le tesseruffî mewqufey meskûte piçkule da buwe û sî sal lemupêş ta êsta be nawî weqfe tesseruf kirawe Leser teskîrey memurî îcray Silêmanî ke betarîxî 16 Eylûl 338 û 157 nimro ye. Mucedidî be nawî weqfid meskuteê piçkule û mûtewelî Ehmed Kurê Ebdulah Axa rebtê tapu dekirî lew zemîne da her kes elaqeyêkî heye, ta mudeyê bîst roj tir mureceet be daîrey tapûy Silêmanî bika, duwem defa îlan kira.

16 Teşrînî sanî 338  
memurê tapuFaîq

*Le metbeê hikumet le Silêmanî tab kira.*

## Rojî Kurdistan

**Sal: 1, Jimare: 5 [ Çiwarşeme ] 23**  
**Rebûûlaxir 1341 13 Kanunî Ewel**  
**1338 Fennî û Ictimaî**

### - Millet -

Millet le cemiyet cemiyetîş le ictîmaî çend ferdîk teşkîl kirdiwe.

Ke wa bî ferd heta zindû feal bî heta be terbiyeyêkî esîl terbiye û perwerde kirabî ew cemiyetey ke teşkîl deka, ewinde resen ewinde paydar debî. Welew nesîbeteîş da asarê tereqqî û tekamul nişan deda.

Efradê ciwî ciwî eger heryekî be quwetî teleqqî bikirî, asarê quwet û ezemet ew heyete umûmîye ke nîşanî deda bittabiî munasebet bo mehseleye ke le şiddet û terkibî ew quwetane hati-bîte wicûd.

Fennê mîkanîk, hîkmetê tabîye bo ême way isbat deka ke şiddet dû quwet eger legel sifir da musawî bî, mehsileyîş sifire. Û eger çend quwetêk le eyn cîhetewe tesîr bikete noqteyêk şiddetî mehselekey musawî quwetê mecmûekeyê debî.

Em qanûne riyazeş legel ictîmaiyyat da tedbîq bikirî, eynen bem new'e debî.

Milletêk ke fealiyatê zahireyê ictîmaî, exlaqî çend ferdêk teşkîlî bika quwetêk, mehsileyêk tewelud deka ke musawî qudretê fikriye û bedeniyeyê ew mecmûe debî.

Em ferdane wekû erziman kirdin eger zindû û le halê fealêtî da mutewecihe xayeyêkî mueyyen bin û ibrazê fealiyet biken, milletîş bê ewey ke sil bikatewe le saheyê tereqqiyet da be hengawî zor xeyrapîş dekuwît.

Xo eger ferdekan yekêkî quwetî

musawî sifir bî, yekêkî tesîr bikatewe noqteyek, yekêkî eksê tesîr bika, yanî her yekî new'e emelêk terze xayeyêk taqîb biken, ew millete dekuwîte halî etaletewe û hîç hereketêkî pê nakirî. Ew milleteê xowanxweste nuzûl bikane em derkeyewe zor zehmete be hîç meqsûdêk bikat.

Piyawêk ke teb'en tamê sihhe bî û ew îsab û e'zaye ke wucûdî ewî teşkîl kirdiwe le emrazê daxilî û xaricî salim bî, emca bo îfay wezîfeyê sabit û mute-hemmil debî.

Feqet eger le uzlat û hecîrat bidîne yekîkekan atil û nexoş bî, tebîeten mani'ê fealiyetê asabekanî tirîş debî. Em erze em nexoşîye tederîcen wurde wurde wucûdê ew şexse kamilen istîla deka. Ew biste zimane heta bî bêtab û tuwana bî, nexoş dekuwî aqîbet dekuwit û demirî. Emca wekû bo men'ê sirayete û bo muhafezeyê sihhetê echezeê bedîne, hifzissihhe, dûr û dirêj teshîhîman deka. Tarîxê tekamul û inqirazê cemiyatê beşerîş eyn wezîfeyê beynî û waizêkî layemûte.

Heyetê ictîmaiyeetê milletêkîş eger teşebbîye bikirî be şexs û asabî zor baştir derakuwit.

Çunke ew şexse le echîzeyê bedeniye teşkîlî kirdiwe û milletîş le ferd û cemiyet terkîbî kirdiwe.

Wek le serewe erziman kirdin ke yekî eczay mutemmîeê beşer, eger tûşî azarî ya nexoşîyêk bibî mani' fealiyetî baqî esabekanî tirîş debî, ferdêk ya cemiyetêkîş le milletî eger muxalîfê emelê milletekî hereketîyêk bika, hîç şubhey tîya niye ke bedidrî şexsekey deba.

Binaen aleyh li ser hemû ferdî le efradê em qewme necîbe ferz û elzeme ke bo menafîe umûmiye mutehiden

xeyret û hemû bo em roje muqeddese bo em xayê mueyyene se'y bikeyn.

Egerçî elhemdulillah emro fewqel memul ittîfaq û yekêtî se'y û eqdamat le muhîteman da be new'ê hukumfer-maye ke şayanê şukran e.

M. Nûrî

-----

### Mearifsiz Bir Kavmin Hakk-ı Hayatı Yoktur

Mearif, bir kuvve-i hayatiyedir ki, hangi bir millet o kuvveden tefeyyuz etmezse, milliyetini muhafazaya kadir olamaz.

Mearif bir gıda-yı ruhiyedir ki, hangi bir ruh o gıdadan mutagaddi bulunmazsa o ruhun lezaiz-i insaniyesini darub bûnye-i şahsiyesini ten-emmu ettiremez.

Mearif, bir fazilet-i faizedir ki, hangi bir şahıs ondan istifade ile tahlîl-i dimağ etmezse hayatını hayat-ı hayvaniyeden ifraza bir istisnaiyet gösteremez.

Evet, gösteremez. Çünkü fezail ve mezayat-ı beşeriyenin kıymet ve kabiliyet-i leduniyesi inkişaf ettirecek saik mearifdir.

Bir kavmin hakk-ı hayatını bahş edecek ve o hakkı idame ile her türlü avarız ve ihlalden muhafaza edecek kuvvet, mearifdir.

Insanın şeref ve haysiyet-i maddi ve maneviyesini tezyid ve teali ettirecek terbiye ve tahsil-i merarifdir.

Insanı vahşetten, milleti cehaletten, ruhu zulumetten kurtaracak yine mearifdir.

Biz şimdi bundan bir asır evveline ırca-ı nazar etsek, mearifin havaic-i

hayatımıza ithaf ettiği teceddüdat, bugünkü dünya ve yaşayış, dünkü dünya ve yaşayış hiçbir munasebet bulduramaz.

Nasılki mearife tabi olanlarla olmayanlar arasındaki farkı temayüz inkar edilmeyeceği gibi cehaletteki halet-i istizlaliye ve vaziet-i ibtizaliye madumiyetle mevcudiyet için bir fark-ı hayat gösteremez.

Bir kavim, şerfe-i ictimaiyesini mükennet-i kavmiyesini irtiyabat vehminden kurtarabilmek için ilk evvel ahyare arz-ı ihtiyaç şaibesinden azade her nevî terekkiyatını ilerletmek mecburiyetindedir. Çünkü hal-ı ihtiyacı kabul etmek, daima muhtaçlığa katlanmak demektir. İhtiyaç meske- ninin kardeşi meskenet ise, zilletin babasıdır. Böyle bir süfli aileye intisab etmek daima sefalet, hakaret, esaret tokatları altında ezilip hovahiş göstermek demektir. Bu bir felsefe-i ictimaiyedir ki, her türlü mukavim ve mehasin-i hayatiyeyi nazar-ı inbisarımıza bırakmışken biz hala bu tecelliyat-ı tecdideden lakayd kalıp nifak ve şikakın peyrevi, teferrüd ve itna-ı şahsiyetinin meftunu olup sayı ve koşuştan geri kalırsak, hazıra-i mezelletin hakikat haramında idi. Vahşetgüzin sefalet olmaktan tahlisgir beyan edemez.

Fe'tebirû.

A. Necib

\* \* \*

Le Necmewe

Le teref Meclisê Millî Enqerewe, Welîchdê Seltenet Hezretî Ebdulmecîd Xan le ser textê seltenet datirewe.

-----

## Ricalê Gewreyê Estembul Le Misir Da

Eskenderiye: 21 Teşrînî Ewel Sedrê esbeq Tewfîq Paşa û Şeyxul Îslamê Sabîq Mustefa Sebrî Efendi û Nazirê Herbiye Suleyman Şefîq Paşa le ser sebebêkî mechul le Estembul firariya kirdiwe û emro geştine Eskenderiye. Miqdarê sed peyayê gewretirîş intizarê haniyan deken le Eskenderiye.

-----

## Eskerê Cafer Paşa

Eskerê Cafer Paşa bo hellî be'd mesailê Iraq sazumanêk le Londra demînetewe.

-----

## Heyecanê Le Îrlande

Le ber ew tezyîqatewey ke muhakimê eskeriye muqabilê be umûmê icray kirdiwe û çîwar kesîş idam kirawe heyecanêkî umûm wuqû buwe. Ersikenîn Şpildîzir le weqtî didirsîma çünke demançey pê biwe le mehkemeyêkî xusûsî da lizûmê muhakemeyê bîtrawe û mehkemeîş helgirtinê em demançeyey be dişminatî Emperetoriyet teleqqî kirdiwe û bo sûrete hukmiyan dawe.

-----

## Heyetî Romanya Le Lozan

Lozan 18 Teşrînî Sanî 338: Heyetê Romaniya legel muasaletiyen bo Lozan beyannameyekan neşir kirdiwe le me da (hurriyetê bogazekan) be beweidna

be temînâtî hemû dewletekan bikirî û  
le sulhê Turk- Yunan da eterefdarî hîç  
labkiyan nekirî

bikat lem xusûsewe hîç maniî niye û  
bibuwe hukûmetê arzûka eka.

Rojî Kurdistan

### Kaxidî Le Helebcewe Hatiwe

Hezretî Reîsê Daxiliy Kurdistan  
cenabê Şêx Muhemmed Xerîb Efendî  
ke bo rêkxistinî îş û karî em qezaye  
teşrîfî hî nabû li paş muwaselet fer-  
mûnî be Helebce Begzade Caf û  
Hewreman û ehalî daxil û xaric bil  
umûm hazir bûn. Beydaî mubarek  
istîqlaliyetê Kurdistan helekra û nutq  
îrad kira.

Le seadet û yemînî em roje muqed-  
dese le hemû layekewe eserê şadiman  
û surûrê debînra.

Xuda bi dewamê em celal û şewket  
Hezretî Melîkê Muazzam (Melik  
Mehmûdê Ewel) hemû layek  
mufewweqê bilkeyr bikat. Amîn.

Rojî Kurdistan

### Teshîh

Le nusxey pêşû da le xusûs unwanê  
memuriyetî cenabê Şêx Muhyeddîn  
Efendî Kanîkuwe îbare ke be xelet  
nûsrabû. Derdestê îbareke emeye:  
"Cenabê Şêx Muhyeddîn Efendî be  
qumandanî Quway Milliyey muîtê  
mulûkane be îradey seniye teyin  
buwe."

Rojî Kurdistan

### Îlan

Hemû rojî le seadetê çîwar  
Kurdiyewe heta seat 3 şew hemû kes  
etwanî serbest ziyaretê wekîlê fexame-  
tî mendûb Samî Çinab Kîtan Çîmen

### Nûmre : 30

Bo tayû kirdinî parçeyek zemîn  
biraw ke dîkanî pan da waqî'i û be kanî  
sifirê meşhûre bi sûretê muceddîd be  
13 jîmare *Bangî Kurdistan* û 3 jîmareyê  
*Rojî Kurdistan* îlan kirawe ke bi nawî  
weqîfê mezkûte piçkûle û mutewellî  
Ehmed kurî Ebdullah Axawe rebîtê  
tapû dekira ew mutewellî Ehmed kurî  
Ebdullah Axaye sehwe تنها be naw  
Weqîfê mezkûte piçkûlewe rebîtê tapû  
dekirî teshîhen îlan kira.

11 Kanûnê Ewel 1338

midûrê tapu

Faîq

### Dosye 249 - 338

Ew xanewey ke meheleyê Çîwarbax  
waqie û aid be Tenekeci Qadir Şukriye  
û malûmul hudûde elan kirawe be xan  
lebatî qerz Mela Emîn Asiye Xan  
defroşirî. Binaen eleyh bo ihaley  
eweliye ta 30 roj waazih be muzayedey  
eleniye kira. Herçî talibe sedî deh temî-  
natî musteshiben muracaat be dairey  
icra û munadî mubaşirî mehkeme  
Muhemmed Axa bikat.

11 Kanûnê Ewel 1338

mamûrê icra

Elî Samî

### Îlan

#### Jîmare : 29


(Ev îlan di hejmara beriya vê de jî  
hebû, lewre me nexiste vê hejmarê.)

Îlan

Recakim ewaney ke aboney xezetey  
*Rojî Kurdistan* bo ewey ke le fikrê neçê  
û ismiyan qeyd bikirî û muntezem  
xezeteyan teqdim bikeyn bedelî  
aboney 3 ya şeş mank binêrin.

Midîrê xezete  
M. Nûrî

*Le metbeê hukumet le Silêmanî teb  
kira.*



NÛRHEYATA LICÎ

Weşanên Helwest

Nivîskar Lokman Polat bi kurte-romanekê nû derket pêşberî xwendevanên xwe. Pirtûka bi navê Nûrheyata Licî ji nav weşanên Helwest, li swêde hate weşan. Pirtûk bi heman navî li Stenbol jî hatiye weşan û li welêt hatiye belavkirin.

Polat evîna keça mîrê Etaxê û kurê fermandarê kela Şîro (Kela Şîro li navçeya Licê ye) bi şewyekî edebî afirandiye. Di kurteromanê de welatê bav û pîrên kurdan, an ku welatê Horiyan, rewşa Merwanîyan, şerê Ariyan û

Bîzansiyan derbas dibe. Hatina qewmên hacûc û macûcên hov ji Asya navîn û êrîşên wan ên barbarî jî di beşeke kurteramonê de tê vegotin.

Beşa balkêş a kurteromanê fetihkirina bajarê Jarusalemê (Qudis) ji aliyê fermandarê kurd Selehedînê Eyûbî ve ye. Digel gelek bûyerên dîrokî, sehneyên mîtolojîk û fantastîk jî di kurteromanê de hene. Zimanê pirtûkê hêsan e û macerayên wê herikbar e, xwe bi mirov dide xwendin.

Em hêvîdarin ku xwendevanên kurd vê kurteromana dîrokî ya bi kurdî bi baldêrî û xweşî bixwînin.

Weşanên Helwest

# Bangî Kurdistan

(Hejamr: 3)

Wergerandina ji soranî: **A. Meretowar**  
Wergerandina ji Osmanî: **Mamoste Qedrî**

## Hesbihala Duduyan

Gelî mirovan, gelî biraderên min ên kurd. Di nusxeya ewil a Bangî Kurdistan de, piştî selaman, ji bo şiyarbûnê min cesaret kir ku çend qiseyan bikim. Em dizanin ku bi van qiseyan bi hin remzan (îşaretan) şiyarî çêbûye; mixabin hîç tesîr peyda nekiriye. Hirsî ciyan û hesûdî, xebat û têkoşîn, tenê her ji bo menfîeta şexsî dewam dike. Gelo muhebbeta qewmî û wetenî wiha ye? Li pey xwe, ji bo ewlad û îxfadan tezkereyeke çak bihêlin da piştî mirina we ferzendên welêt rehmetê li we bibarînin, li ser gorên we bi awayekî spehiyane li we selam û hurmetê bikin. Ewladên we bi hewl û kirdariya we, xweşhal û berz bibin da ew jî her mal û mal negerin, her bi titûnkêşî, bi noşîna çayê, xewar û merezê meşxûl nebin; lêbelê fikra tehsîla ilmê bikin. Ji dinyayê fêr bikin ta di meclis û medeniyetê de bikaribin

îsbata mewcûdiyeta medeniyetê bikin û bi serbestî fikrên xwe aşkere bikin ta ku ji bo çakî û pêşveçûna welêt deng neke, dê her behsa lîre û bi lîre her qiseya titûn û tiştine din bikin. Her deftera xisûmet, cehalet û poşmanî bixwîne. Bi vî axlaqê nebaş, ji bo çî nebêjin "Efellahû ema selef/Ellah efû bike wan ên berîya me." Kurê memûrekî bî, her kes tiştêkî, zalimekî bi destê wî be, derheqê hemwelatiyên xwe de, dibe wek Firewnan. Bi zirarkirina li derdora xwe xweşhalîyê dike. Bi felaketzedeyan re li şûna alîkariyê zirarê dike. Dor û payeyan didin ji bo ku qîmetekê, tiştêkî bi dest bixin. Digel van hal û hereketan, heke di meclisekê de, payeyekî baş, xuraw, parçeyekî titûn, dirav, yaxud ku lîre bi seriyekî direling hilgire bibînin, her çî heqîqetê dîtin dê bifroşin, her çî li cem wan derdîçe, kelîmeyên mîna "ew e", "ne'em ya seyidî" "evet efendim", "belê qurban sahib" "zor çak e", "erê

welleh", "her wiha ye" dibêjin û wezîfe ya însaniyet û welatperweriyê bi vî rengî bi cî tînin; lêbelê Xwedê bi vî halî razî nabe. Ne îngilîz ne Îblîs bi dil tesdîq dike.

Ji qedîmê zeman ve kurd zaf misilman û rastgo bûne, ez niha dibêjim, her çend li ber çavên Xwedê şukrê Îslamiyetê mane; lêbelê bi derewên mîna wellah û billah bûye. Di nav me de cesareta medeniyetê mefqud e. Medlûl (ennecatu fissidq/rizgarî di rastiyê de ye.) zaf kêr pê 'emel tê dikin.

Di derheqê bi yek xizmayetiya ser wesiyeta ji emelê (karê) nebaş ku di meclisan de deriyê xiybetê vedikin, ji bo nimûne: "Hespê Kubra xweşbez e, Tacê Yarê zaf guz e" dibêjin, pê xiybet û hikayetên nebaş dikin. Gelî biraderên welat, hûn behsa ehwalê xwe bikin. Bala xwe bidin gelên mezin ên wek îngilîz û elman, Mosqof, frensîz, emêrika, japon û yên din. Hûn her li gelê ermenî û milletê mûsewî bifikirin. Di zoriyê de li ber gelê pehlewî, jixwe her çendî şeş yek û deh yek jî nabin; lê belê ji aliyê me'arifê (zanistê) û sanayiyê ve wek kir...deh... kurê...ji berz... ferqa me heye. Yek ermenê Qalkoteyî ku bi ehwalê ermeniyê Stenbolê nizanibe, tu nîn e. Tu ermeniyekî Wanî, ku ji fikir û teşebusên ermeniyên Amerîkayê agahdar nîn be tu nîn e. Tu zaroyên ermenyan ku hemû xezeteyên ermenî heta wan xezeteyên ku li Amerîkayê jî hene nexwînin tu nîn in û li Stenbolê, li wan ciyên xezeteyên wan dertên, jin û peya, sirf ji bo xwedîderketinê, hemûyan dikirin û dixwînin û bi vî awayî ji rojava û rojhilatê agahdar dibin. Li Stenbolê dibistanên wan ên

bêqisûr; mamosteyên wan ên li ser fênan pîspor; murebizxaneyên wan ên xusûsî û mukemmel hene. Bala xwe bidin hukema, cewahir, tucarên mezin, eczavan, tebîb, heta muherrîr (nivîkar) û edîban, qismekî zaf hemû ermenî ne. Digel hev û din bi rehm û şefqet in. Mesela, li Enedolê, li ciyekî xir û xalî, gava ermeniyek bê kuştin, li Almanya Yekbûyî, li pêş çavê alemê, bi derba demançeyê heyfê hiltînin. Mûsewiyek ji Mosqowayê koç bike, Civata Siyonizmê, ji bo îstireheta wî koçberê xerîb ê nenas jî, her çi lazîm be, diçe ji Filîstînê tîne. Ji bo tehsîla zarokan ji hêla rûmîyekî dewlemend ve, mektebeke cehl. bi hezar lîreyan li Stenbolê ava dike. Gerçî ê me, xezeteyê hefteyî û kurtebêjiyane pê nikarin îdare bikin. Ezên bi kiz.. rehetî di nanxwari-nê de jî rehetiya me di malekê de tu nîn e. Me, odeyêke taybet ji bo xwarinê jî nîn e. Ji bo keşîdeyê şîrîn bistray, ji bo seroş bi poleke çira û ji bo ku wiha bi qîmeta utundra û ji bo ku lav û latûnê nazîk rêkxiraw, ne dolaba mexsûs û ne ciyekî me heye, dikarim bibêjim ku di yek malê de xusulxa-neyêke (serşok) pak û hazîr bi destê me nakeve. Welhasil em di hemû tîştan de bê silqe ne. Her pîlaw û bamye. Her pîlaw û bamye.

Di rewşa himamên me de, digel vê ava zaf heye jî, menzereyêke xembar heye. Em bala xwe didin taqîmê heywanan, ji piştmal û minder, papûs, qabqapên adî jî tê de nîn in. Bi piyê pêxwas, bi ser hemû çirkava nav himamê de diherin, di destpêka xaniyan de jî diçin ku di wî xaniyî de, ji bo dermanê wicûdê bi rojê ji bo xaniyan avê germ dikin. Kûr jî ser erq bin .. di wê hezbinayê de gir dibin, yek

li dû yekî bi wê ava germ xasiyeta gewriyê gargara û xisûl dikan. Gelo ûlemayên hêja ji bo vê çi dibêjin ku xwediyê himaman bi vî halî razî dibin? Gelî bavan! "Ennezafetû minel îman / Paqijî ji îmanê ye.) hatiye gotin. Wateya nezafetê jî bi tehsîla îlim û fenan e. Ji aliyê we ve tê zanîn, di nusxeya pêşî ya Bangî Kurdistan de bi îbret bizanin tucarekî Hindistanî (Bombay) çar milyon rupîyeyan ji bo êtîmxaneyêke misilmanan ku zarok tê de dixwînin hediye kiriye. Li Kurdistanê, ji weqta Rustemê Zal heta weqta dewletan gelek xanedanên (Xwedê digel wan) çi pehlewaniyên me yên bixîret vê himmetê kiriye?

Mawyetî  
Mustefa Paşa

Bangî Kurdistan e wa dinya ihya kirdiwe  
Zamê qelb kird bêcareê mudawa kirdiwe

Baisê pêşgotinê em qewmê ew met-  
be'e  
Elheq emro xakî Kurdistan ziya kirdiwe

Sed şikir we şukrî îrfan û ilim û aqilî  
Şah û pir şûrî cehaletiyan ke yexma  
kirdiwe

Layiqî tehsîn û qehrê qewmî kurde  
çunkewa  
Em cerîde pir firtotîşî berna kirdiwe

Bang û mawarîkî berze Bangî Kurdistan  
dika  
Mîşek dinyay pir li deng û şûr û qewxa  
kirdiwe

Jeng û tarîkî cehalet wa li dil da dûr dika  
Qelbê mehzûnê hemû kurdî museffa  
kirdiwe

Laçûwe tarîkî hûrî cehalet êsteke  
Necmê îqbalê hemû kurdan rexşa kirdiwe

Qaymeqam un el-Bence:  
Ehmed Muxtar

### Makîneya Çapê

Makîneya çapê, nîşaneke pêşveçû-  
na gelan e. Ew qewmê wî gelê ku  
wasitayêke weşandina fikir û fehma  
armancê tune be, ew fikir, ew armanc,  
wisa bê tesîr dimîne diçe. Ji ber vê  
yekê ji bo her milletî metbeeyek lazim  
e û divê ku rojnameyêke xwe ya millî  
ji bo pêşveçûn û bilindbûnê hebe. Ew  
milletê ku her xaye û emelên baş taqîb  
bike, dikare bi dengê bilind wan  
bigihîne wan kesên ku xizmetkarê  
zanînan û millet in.

Îca berîya hemû tiştî, lazim e ku  
wasitaya elaqatê, bi hewleke mezin  
peyde bikin. Ev jî, makîneya çapê ye.  
Makîneya çapê, ji bo emelên (karûbar)  
millî, civakî, îqtisadî, çadîreke  
hundirîn û derveyî ye û ji bo yekîtiya  
fikir û hestên millî, bi kêr tê û  
navigîneke zaf bitesîr e. Eserên me yên  
li ciyê xwe mane jî, ew eserên edebiy-  
ata millî, dê bîna çapkirin ku ev jî  
parastina ilim û edebiyata millet e.  
Eger ew eser bêne çapkirin, ji wind-  
abûnê xilas dibin û heta dinya ava be,  
navê wê eserê dimîne. Heke nusx-  
eyeke ji wê eserê wînda bibe jî, bi  
hezaran jê dimîne. Lewre eserek ku  
fêkiya gelek xebat û berhema jiyana  
aliman yan ê şairekî biqîmet e, ji ber  
wê ku her nusxe yan divê bi destx-  
eteke nexweş hatibe nivîsandin, di  
muddetekî kurt de wînda dibe. Ew  
eserê ku bi wê ked û xebata mezin a

wan zatan hatiye pê, bê encam dimîne.

Ji aliyê hemû kesî ve tê zanîn ku di tiştên mezin ên sedsala Mîladî de, angoyên berfîya îcadê metbeeyê, ev alem li ser "papîrûs", kaxiz û "paşomîn" angoyên bîst ehyandî dinivîsand. Kaxiz li ber vê diwariyê li ber xwe neda, mecbûr bûn, li ser çerman eserdî nivîsandin. Li ber van, peydekirina çerm jî zaf giran bû. Ew kitêbên ku wê hingê hebûn, hemû bi destan hatibûn nivîsandin. Bi vî awayî ev nivîsandin bi rê ve diçû. Bi vî halî kitêb kêmdihatin holê û ew ên ku dihatin nivîsandin jî zaf giran bûn. Heta ew kitêbên ku bi diqqet dihatin nivîsandin jî, bi çar sed-pênc sed fîranqan dihat firotin û ji vî aliyê ve kesê dewlemend nîn bûya, nikaribû bikirîya. Ji ber wê, yên ku dixwestin eserdî zanista nû binivîsin û jê îstîfade bikin, mecbûr bûn wan eserdî xwe yê kevn ên li ser çerman hatibûn nivîsandin, belav bikin; lêbelê zû bi zû bi dest nedixistin. Di sedsala çardehan de ku heyama fênan e, peydekirina wan kitaban zor bû. "Li ser textê heke kiribûn." Kitêbên wan, li wan texteyan heke dikirin; lêbelê di sedsala 15an a mîladî de ku ji aliyê Gotinberg ve metbee hat îcadkirin, li Almaniyayê, her çî ew kitêbên kevn û nû hebûn, hemû hatin çapkirin û bi vî awayî feqîr û dewlemendan êdî dikaribû kitêb bikirîya û bixwenda.

Gava metbee belav bû, Îtalya û hukûmetên din jî, wan eserdî xwe yê ku mabûn, nehêlan ku wîndabibin û hemû çap kirin. Ji bo îstîfadeyê, li hemû aliyên welatê xwe belav kirin.

Îca jî bo yê me jî, ev eserdî nivîsandî û ev edebiyata me ya biqîmet, ku ji kîsê me neçe û bi der-

basbûna demê re, wînda nebin, divê ji aliyê xîretmendên me yê birûmet ên welêt ve metbee bê anîn û ji bo kirîna makîneya çapê qusûrê nekin. Ez ji hemiyetmendên (welatparêz) ehalî yê rêzdar ên Kurdistanê hêvî dikim ku li ser navê menfîeta milletî, himmet bikin û vê makîneyê bikin. Ev jî tek-lîfeke giran nîn e ku hemû kes hilneyne. Li pêş, ez ji bo îşê bixêr, delalet û teşebbus dikim ku her kes bi qederê himmet û îqtîdara xwe alîkariyê bike, bi navê millet û kurdîtiyê tewqe dikim.

M.Nûrî- Silêmanî

### **Almanî alîkariya kemalîstanê dikin**

Vapûra di meha Temûzê de ku ji Lîmana Koskafunê hereket kiribû, bi qederê techîzatê sî teyareyî lê bûye û ji bo ciyekî meçûl hereket kiriye. Hin kes dibêjin ji Mersînê û hinek jî dibêjin ji bo Pîtirgiradê çûye. Rîwîştin beyanê dikin ew exleb îhtîmal e ku ji aliyê behra rojavayê Ewropayê ve hatibe.

### **Tirkiye û Yunan**

Ji bo muzakeryên aştiyê, Yunan û Dol Xulfa îştirak nake. Her nûnerê tirk û yunan, di bin çavdêriya Dol Xulfa de, li Stenbolê, ji bo civînan nêrînên xwe beyan kirine.

1-Civîneke nêzîkî Stenbolê (Beyqoz) ku daxilê Îzmîdê ye, soz bide.

2-Astengkirina papûrên yunan, ji bombebarana Samsûn û qaçaxçitiya tirkan.

3-Li gor şertekî ku di navbera wan de hatiye danîn, dê di weqteke diyar de, li Parîsê peymana ji bo Meclisa Aştiyê li dar bixin.

## Misir, Alîkariya Felaketzedeyên Enetoliyê Dike

Hemû ûlemayên Misrî, fetwayê dan ku li cejna Qurbanê, ew qurbanên ku têne serjêkirin, postê wan bifroşin û bedela wan bişînin ji bo felaketzedeyên Enetolê.

Li gor xezeteyên Misrê, bihayê hindikî yê van postan 30 hezar lîre dike.

Wefat

.....

Germa

.....

Mizgîn

....

Hilbijartin

....

Beşa Tirkî

(Evana ji ber ku îlan bûn, me ne-wergerandin)

## Jimare 4

### JÎ STENBOLÊ

Herba Giştî ku herbeke pirr neçê bû û ji bo medeniyet û însaniyetê xirabiyeke mezin bû, tê zanîn ku ji rûyê hin mexrûran ku bûn sebebê veqetîna hin gelên misilman û ew tebayê xeyrî misilman jî ji vê herbê zaf mehf û perîşan bûn. Kurd ku bakur û başûrê beşê herî mezin welatê wan bû, bûbû meydana herbê, ciyê kuştin û birînan. Tê zanîn ku bi derbeyeke xedar perîşan bûn.

Ew ên ku li vê herêma herbê

Kurdistan dîtibe û ji ber vê dilxwîn û perîşan nebûbe ne mimkun e. Gava mirov bala xwe dide bi sed hezaran ku ji ber top, agirê mitirilyozan û tîfing û ji rûyê bombeyan mehû bûne û bi hezaran yetîm û sêwiyên kurdan, belengaziya jinan, pîran, nexweş û nalînên ku di heyama koçên bi cebrê yên di nav befrê de û li ser çol û çiyayan, digel lawelawê di sermayê de telef bûn.

Bi hezaran zarokên berşîr ên masûm û bêguneh, giriyan û naliyan, ji ber bêdayikîyê û bêxwarinê ji nav çûn (winda bûn). Hinekên ku jê mabûn, li Stenbolê, li pêş çavê hemû kesî, wekî ..... zemanê cahiliyê, li malan hatin belavkirin. Gelek ewladên masûm ên xanedanên kurdan ku bi naz û nîmet perwerde bûbûn, di bin sîleya yênbêrehm de jar û zebûn bûn. Heta hinek jê bi destê malên xirîstîyan ketin. Her çendî *Cemiyeta Kurdistanê*, li Stenbolê bi teşebusa hin mezinên xwedan însaf, li vê meseleyê xwedî derketin; lêbelê ji bo parastina van kurdên bêçare ... kar û xebat û hewldanan têr nekir. Heta her kurdê ku endamê Cemiyetê bû, 2-3 zarokên sêwiyên kurdan birin bal xwe; lêbelê dawî li perîşaniya zarokên bêkes ên kurdan nehat. Bi hezaran xanedanên eşîran û ehalîyê nişteci yên kurd ku ji hêla Erzirom, Wan, Xarpêt û ciyên din koç kiribûn, pirrê wan telef bûn çûn; yên mayî her pênc-şeş malekê li aliyekî din şandibûn, terka îskanê xwe bi darê zorê hatibûn kirin da fêrî tirkî bibin.

*Li ku ye qewm û xewîşan im çun perîşan im*

*Nizanim lîme diden bo çî bilêm çî turkî nazan im*

*Bêhal im merhemet tu Xuda ziban nazan û bê war im*

*Le kanadyik xemxwar im binî çaw-giryan im*

Menzereya vê felaketê, ew ê ku dîtîbin dizanin. Axir her wekî ehaliyê Kurdistanê, di vê Herba Giştî de tûşî perîşanî û sergerdanê bû, ji zabit û tehsîldîtîyên (xwende) kurdan jî, qismekî zaf zêde di ber namûs û şerefa xwe de, di cebheyên herbê de yan bûn şehîd an li esaretê perîşan bûn. Piştî mutarekeyê, ango zamanê ku gel bi îddîaya neteweyîtiyê û serbestiyê re pêdar bûn, arnawud, ereb û yên din, her gelî digel zabitên xwe yên giran, komele saz kirin. Navendên wan, ew gişt ji bo rizgariya welat, vexwendin. Ehaliyê Sûriyeyê ji bo Şamê, erebê Iraqê ji bo Bexdadê, arnawudan ji Îşqodrayê yên din bi xweşî vegeriyan navendên xwe. Li başûrê Kurdistanê me, rewşa hazir û ayendeyê, ji bo biryardana ronakbîran û gencên çarneçar, hinek jî ji ber karê debara xwe, çûn Enqereyê hinek jê çûn li Stenbolê bi wezîfeyan sekinîn û li benda agahî- yeke ser welêt man. Çünke ji ewilê seferberiyê ve, fikra veqetîna gelan yek digel yekî dida pey şidetê. Ji bo kurdan li Enedolê, ji ber ku li nav kemaliyan man, roj bi roj muşkule peyde dibûn. Ji ber vê rewşa zabitên kurd, nemaze xelqê Silêmaniyê ku li Stenbolê mabûn, zaf xirab e. Hemû ji bo vegera li welêt, bi her awayî muracaet kiribûn û dikin; lêbelê ji ber mesrefên giran ên rêwitiyê, nikarin werin welêt. Kaxizekî ku bi navê matbûatê (çapemeniyê) ji aliyê çend zatan ve ji Stenbolê hatiye şandin, em dê li jêr eynen bi cî bikin û

kaxizekî din ku ji aliyê Bînbaşî Erkanê Herbîye, Emîn Beg ehlê Silêmaniyê ve ji me re hatiye şandin, ji ber ku bi farisî ye, di qismê farisî yê vê xezeteyê de dîsan em bi cî dikin. Di mutaleeya vî kaxidî de rewşa perekende û perîşaniya van hevwelatîyan ronî dibe. Ew kesên ku rehm û hêvî bi hemwelatî û gencên kurdan heye, divê ji vexwendina van kurdan re, himmeta mezin bike. Ew ku ji derveyê xwe ve hezkiriyê hukumeta Tirkîyê ye, ji ber ku ev zabitên me, di xizmeta tirkan de bûn û a niha ji ber îhtîyacîyeke wan a zaf mezin heye û tenê û bêdesthilatî mane, dîsan himmetkirin normal e (tabîî ye). Di vî karê bixêr de, her çi kesê kar û xebat û alîkariyê bike, hem li dinyayê bi wê kirina xwe pesindar e hem li axîretê însellah layiqî mexfîretê ye.

Her kesê çi bide, lutfen (ji kerema xwe re) navê xwe ji bo îdarexaneyê xezeteyê bişîne ta îlan bibe û ew meblexê ku kurdan pê ji Stenbolê dibe, ji bo zabitên me, bi navê wan şexsên rêzdar bişîne.

Mistefa Paşa

### **Ew Kaxizê ku ji Stenbolê bo me Hatiye:**

11 Temûz 1922

Em bi wasitaya we meseleyeke zaf gewre erzî hemşeriyên xwe dikin. Zaf hêviya me hebû ku ev îş, li pêş muraceeta me, ji aliyê *Pêşkewtin* ve bê beyankirin û teqîbkirin; mixabin heta niha me di vê xususê de hîç tiştek nedît. Bivê nevē em muteessîr bûn. Ev muraceeta me jî, ji encama van tesîran e.

Malûmê we ye ku qismê gelê zabitî tan û memûrên Iraqê, di Herba Giştî de, bi aliyê Qafqas, Heleb û Lamlalol hatin şandin. Hinek jê telef bûn û qismek jê esîr man û qismekî zaf hindik bi saxî rizgar bûn. Niha ew ên ku ecelê wan nehatibû û nemiribûn, li vê derê, li Stembolê xerîb û bê kes, muhtac û perîşan mane. Li vê derê ne kes rehm bi halê me dike û ne hûn li me eman dikan. Ev hal, hîç me şik û guman nîn e ku li dij rizaya Xwedê û pêxember e û li dij xîreta ehlê welat e. Nemaze ev feqîrên ku ji ronakbîran in û ehlê welêt in, lazim e bifikirin ku piştî çend salan em wiha gihîştine. Gelê li ser hemûyan ferz nîn e ku çareyekê ji bo em xwe bi welatê xwe bigihînin bibînin? Bêguman di vî esrê me de hîç tu kes ji îstîfadeya me ya ji bo welêt, xwe paş ve nade. Heke bira li ser navê xezeteya we bi rastî fikir û arzûyê peşkevîna we hebe, bi rastî jî hûn muhtacê xizmeta me ne. Li hember van talûkeyan, bi paş ve mayîna welêt, mimkun e hetta muheqqeq e.

Ji ber vê yekê me ji hemû deran re nivîsand; nemaze ji bo Mendûbê Samî ku li Bexdayê ye, muracaat kiriye. Em dizanin ku ji hemû aliyan ve ji bo rizgariya me xeyret dikan; feqet li ser rojnameya *Pêşkewtinê* jî, ferzul'eyn e ku himmet û xeyret serf bike. Çûnke ev felaketzedeyên ku li vê derê ketine zoriyan, xelqê Silêmaniyê ne. Hîç şik û guman nîn e ku ehlê Silêmaniyê û derdorê ku bi dîndarî û xîreta ser welêt û hemşerîtiyê navdar in, bi hemû aliyî ve baz didin. Semahet û ciwanmêrdî pêşî didin û bi qederê halê xwe, her çi qas mimkun be, ji bo muhtacan alîkarî kirine û dê bikin. Li ser navê me, bişînin Stembolê, îneşellah bi himmet

û hewldana ehlê welêt, ev feqîr ji vê derê rizgar dibin û xizma û eqrabayên xwe şad dibin. Baqî serketin ji Xwedê; xeyret ji we.

Zehawîzade Bînbaşî Hacî Ebdurrehman Bapîrzade

Yuzbaşî Erkanê Herb Bînbaşî Erkanê Herb

Mustefa Kamil Muhemmed Emîn

Alûsîzade Teyib Îbrahîm Sabit Begzade Nûrî

### Duayên Kurdan Ji Bo Mosiliyan

Kaxizê ku ji Mosilê Wergiriyaye  
Meseleyeke Xerbî tê de Heye Emete:

Li ser tensîba Hakimê Edliyeya  
Mosilê Emîn Efendî  
Muderris Şêx Adî ku zatekî alim û  
ehil e  
Silêmanî li vê derê jî Qazî bûye, ji  
bo qazîtiya Dihokê  
Hatiye tayînkirin çûnkî ev Emîn  
Efendî kurê kurdekî تمام e  
Misilmanên ji hêla hin kesan ve ku  
li leyh in kirin (kurd in)??  
Meseleya mezhebî ya wan hate  
holê gotin Qazî  
Lazim e Henîfî be ev Emîn Efendî,  
nabe ku Şaffî be.  
Bi Qazî li ser vê men'a memûriyê  
bûn.

Fesubhanellah, di vî weqtê nazik de ku erebên Bexdadê jî hez bi yekbûna kurdan dikan, li Mosilê ku lêkolîn bê kirin, pirê xanedan ê baweran jî bi eslê xwe kurd in. Em, vî qerarî çawan didin? Nemaze ehlê Mosilê alim û fazi-leyên wê derê dizanin ku qismê herî

mezin ê wilayeta Mosilê her kurd in û hemû li ser mezhebê Şafîî ne. Dihok jî, bajarê kurdan e. Qazî heke Şafîî be, li dij şer'ê û qanûnan gelo çi dibe? Em, vê meseleyê hewaleyî şaffîyên ereb û ecem dikin; lêbelê tercîha henîfîyan bi ser şafîyan de, ji vî aliyê ve qerareke bi mazzaniya ye. Em ditirsin ku ev xeber bi Misirê bike? Ehl û hukumetên mezin ên hemû erebên minewer (ron-akbîr) û Şafîyên hemû ciyan, ehlê Daxistanê û qismê herî mezin ê Sûriyê Şafîî ne. Ev behsa Henîfî û Şafîî li Mosilê, ev anî bîra me: Reb wek ku fer-man dike "Mîn şerrîl weswasîl xen-nasî" em bi xwe di vê behsa nebixêr de, hifza xwe ji Şeytên û teb'ên wî dikin bila nêzîkî Mosilê nebe, ew der ciyê şêxan e. Em duayê dikin ku Mosilî ji neyartiya hev, naçarî wesweseyên Şeytanî nebin. Duaya me kurdan ji bo Mûsulîyan ev e.

Şêx Reşît

...

### **Îstîqlaliyane**

*Londre:* Hikûmeta Yunan li Yanyayê ku berîya Herba Giştî naven-da wîlayeteke muhîm a Osmaniyan bû, li Rûmeliyê hukumeteke serbixwe damezrand.

### **Dîsan Li Îranê Muharebe**

...

Simko

Li gor xebera ku gihîştîye me, li aliyê Şerefexenyeyê, li ser rêya Tebrîzê, li sahilê bakurê Gola Ūrmîyê, leşkerê Simko digel leşkerê ecem, ketine şerekî şedîd. Kurd bi ser ketine û ecem wek carên din mexlûb bûne.

\*\*\*

Nezer bi mesmûat.....

\*\*\*

Di vê hefteya pêşiya me de, ji aliyê Rewanduzê ve, çeteyek ku nêzîkî 40 kesî bû, hatine nav deştê û bi navê tirk bûne ji bo êrîşa ser hidûdê Ranyayê ku di bin dagirkeriya Îngilîzan de ye.

### **Şefîq Beg**

Ji xanedanên Silêmaniyê Reşîd Paşazade Şefîq Beg ku bi xwe "Re-sel'eyn- qaymeqamê mulkî yê Tirkîyê bû, hefteya derbasbûyî hatiye Silêmaniyê.

Ev zatê ku Re-sel'eyn bû digel memûrên Fransîz dewr û teslîm kiriye. Ew ciyê ku di navbera Dêrazor û Mêrdînê de ye, niha ku di bin îdareya Fransîzan de ye, li gor biryarên ku di navbera fransîz û tirkên Enqereyê de hatiye dayin Dêrazor, Re-sel'eyn û cerîre li bakurê Mosilê dikeve, didin bin îdareya fransîzan. Heke ew wê derê bi xaka Kurdistanê bizanibin aqubet çêtir dibînin û em dizanin êş û ebra ango heta kurd wiha reben digel malê şîrîn, ne axayî dimînin ne paye û bûk ya Ellah! Rewşa me bi vî awayî be, ev şeqawet û bêsiyasetiya me dewam bike, li Hekariyê hukumetek jî ji bo gelê asûrî ku li vê lawlelewlâ pere-kende cuziyeke me maye, ava dike. Wê wextê Kurdistanê bakur jî, di navbera Ermenistan, Ecemistan, Fransîz û Asûrî de bi çi siyasetek vediguhere? Benda.. çakî man ji bo bibe.

## Îhtîlâl li Turkistana Mezin

Derheqê Bolşewîkên Turkistanê, -  
Çünke Turkistana Mezin li ser milkê  
Rûsyayê ye -îhtîlâl bi şiddet bûye,  
îhtîlâl li Çînê, Bekan, Buxara,  
Semerqend û hin bajarên din îstîla  
kiribû, ew reîsê cumhur ku ji aliyê  
Bolşewîkan ve wek îhtîlâl-çîyan hatibû  
îdamkirin.

Rewşa mezheb û meqsedên  
Bolşewîkan li Molabyan dike.

Bangî Kurdistan

-----

## BANGÎ KURDISTAN'IN TÜRKÇE KISMI

Wergerandin: Mamoste Qedrî

Eğitimsiz bir milletin yaşama hakkı yoktur. Eğitim yaşamsal bir güçtür ki, herhangi bir millet o güçle kendini takviye etmezse milliyetini muhafaza etmeye gücü yetmez. Eğitim ruhsal bir gıdadır. Hangi ruhta eğitim bulunmazsa, o ruh insan olma tadına varamaz ve kişiliğinin temelini geliştiremez. Eğitim yüksek bir erdemdir. Kim ondan istifade ederek beynini ona göre tahlil etmezse, hayatını hayvan hayatından ayıracak bir fark gösteremez! Evet gösteremez, çünkü insanların erdem ve meziyetlerini, değer ve şahsî yeteneklerini ortaya çıkaracak olan etken eğitimidir. İnsanın maddî ve manevî şeref ve haysiyetini artırıp yükselten şey eğitimidir; bilgi eğitimidir.

Devamı vardır.

## BANGÎ KURDISTAN'IN FARSÇA KISMI

Sabah vakti güneş parlak bir şekilde dağın arkasından doğdu,  
"Bangê Kurdistan"ımız da onun gibi açıkça ışıklar saçarak oldu.  
İlim ve irfan rüzgarı burunlarımız üzerinde hoş kokularla esti,  
Uzun süreli bilgisizlik uykumuzu başımızdan birden def etti.

Eğer bu zamana bakarsak hem gözümüzle hem aklımızla,  
Göreceğiz ki Kürt kavmi artık bahtiyardır Hakk'ın lutfuyla.

Düşmanların gözü kör olsun, talihleri darmadağın olsun,  
Bu büyük millet hem ilerledi hem de yükseldi, oh olsun!

Artık yaşama, mutlu olma, sevinme ve işret günüdür,  
Canımızı bile bu müjdeye karşılık feda etsek yeridir.

Kim ihmalkar davransa üzerine düşeni yapma anında,  
Yüzü kara olsun onun, hesap günü Allah'ın divanında.

Halepçe Kaymakamı  
Ahmed Muhtar

**Muhterem Serdar,**

Elinizi öptükten ve hizmetkarane arz-ı hürmet ettikten sonra derim ki: Ülkeye dönüşünden şimdiye kadar cenab-ı alinizin iltifat ve görüşlerinden mahrum bulunuyoruz. Bundan dolayı kalbimiz ızdırıp

içindedir. Geliş gidişlerde Zat-ı alinizle ilgili bilgileri Aziz Bey'den alıyor ve durumları o büyük insandan sorup öğreniyoruz. Fakat şimdiye kadar Haşmetli'den herhangi bir emir ve işaret gelmediği için kendiliğimden yanınıza gelmeyi veya birkaç kelimeyle rahatsız etmeyi uygun görmedim ve sizden bu kulunuza bir haber göndermenizin beklentisi içinde kaldım. Fakat şu ana kadar bu konuda ortaya bir şey çıkmadığı için kendimi vefasızlar grubundan saymamam için size birkaç kelimeyle ifade-i meram etmeyi kendime görev bildim: Olaylar şimdi günden güne kötüye gitmeye başlamış ve zat-ı alinizce de defalarca belirttiği gibi iyiye gidiş alametleri mevcut değildir. Allah masum ve fakirlere acısın! Amîn. Önderimizin teşrif etmesinden sonra çok sayıda vatandaş da esir bulundukları memleketlerden buraya döndüler. Bunlar son derece perişan bir durumdadırlar. Acıma ve şefkat gerektiren bu durum hükümet elçisince de bilinmektedir. Bununla birlikte bu çaresiz insanlara bakıp el atan kimse yoktur. Bundan dolayı herkes adına Bağdat'a ve yüksek komisere başvurmak zorunda kaldık ve başvurduk. Bu arada görüşme ve yardım bağlamında her kes ve her makamla yazışmalarda bulundum ki bunlar arasında Süleymaniye Belediye Başkanlığı da bulunmaktadır. Bu hususta zat-ı alinizden yardım etmeleri ve buradaki çaresiz vatandaşları kendi memleketlerine gönderilmeleri için girişimlerde bulunmaları arz edilmektedir. Önderimiz için bu zor bir iş değildir. Eminim ki eğer zat-ı aliniz burada olsaydı ve buradaki hemşerilerinin perişan durumlarını

görseydi derhal harekete geçip onlara bir çare bulunması emrini verecekti. Kulunuz burada zat-ı alinizin maneviyatından medet beklemektedir. Allah'ın inaye- tiyle birkaç arkadaş birlikte kendimizi bu hizmete adanmış bulunmaktayız. Zat-ı alinizden bundan haberdar olmanız ve süratli bir şekilde bir çare buyurmanız istirham edilmektedir. Aksi takdirde hepsi burada açlıktan ve perişanlıktan öleceklerdir. Burada hiç kimse onlara acıyıp yardım etmiyor. Zaten buranın durumu önderimizce biliniyor ve açıklamaya gerek de yoktur. Kulunuz olarak ben şimdiye kadar doğal olarak zat-ı alinizden bana bir işaret gelmesinin beklentisi içerisinde olmuşumdur. Bu çerçevede buraya hareket etme durumunuzu gözümüzün nuru Aziz Bey vasıtasıyla bildirseniz buna hazırım. Yüksek himmetinizin ve olumlu cevabınızın beklentisi içerisindeyim. Aile fertleriyle birlikte tam bir saygıyla elinizden öperiz.

Hacı  
Abdurrahmanzade  
Binbaşı Muhammed Emîn

# KURDISTANA SOR\*

Mamoste Mihemed

Guhertinên dîrokî çawa girîngiya xwe ya neteweyî hene wiha jî di çarçoveya welatek de girîngiya xwe hene. Guhertinên dîrokî ew in, ku nexşeya (xerîte) cîhanê diguherînin û bandora xwe li ser paşeroja polîtîkaya navnetewî dikin.

Di encama van guhertinan de hin dewlet têne herifandin û hinên din derdike- vin holê. Bi gotineke din, sîstema pêwendiyên a li navbera dewletan tê guhertin. Guhertinên di çarçoveya welatek de bi tenê rola xwe di qedera wî miletî ku li ser xaka wî welatî dijî de dilîze.

Di vê nivîsê de em dê bi tenê li ser guhertinên dîrokî yên ku di sedsala bîstem de çêbûne rawestin. Êdî pirs ev e, gelo di vê sedsalê de çend guhertinên dîrokî pêk hatine?

Ji kêmbextiyariya vê qonaxê sê car şerên navnetewî çêbûn. Her serek guhertinên navnetewî bi xwe

re anîn. Ji ber vê çendê ew guhertin wek guhertinên navnetewî têne nîşandan.

Bi vê yekê re em dikarin bibêjin ku guhertinên dîrokî yên pêşî di sedsala 20an de, di navbera salên 1914 û 1918an de çêbûn. Ji ber encama vî şerî du împaratorî herifîn: Împaratoriya Osmanî û Rûsyaya Qeyserî. Û di nexşeya cîhanê de dewletên wek Polonya, Fînlendiya... peyda bûn. Helbet dabeşkirineke nuh pêk hat û welatê me jî duyemîn car hate parçekirin.

Bêguman di vê guhertinê de hin dewlet herifîn û hin jî hatin damezrandin, ji bilî parçebûna Kurdistanê, pahlava me ji van guhertinên dîrokî çi bû? Berîya her tiştî, pêkhatina peymanê Sevîrê û danîna Kurdistanê Sor, di guhertinên girîng bûn di dîroka me kurdan de.

Wek ku tê zanîn, li gor peymanê

Sevrê, li ser bingeha xalên 62. û 63. û 64. diviyabû ku di nav salekê de -ger kurdan bixwesta- ew dikarîbûn bi awayekî serbixwe bijîn. Li ser vî esasî Yekîtiya Netewan (Y.N) dê pişt-giriya daxwazên wan bikirana û mafên wan biparastina. Û her wisa tê zanîn ku ev peyman (Sevr) piştî biencambûna peymana Lozanê têk çû. Lê heçî Kurdistan Sor e, em dê li dawiya vê nivîsê li ser rawestin.

Guhertina dîrokî ya din, di Şerê Cîhanê yê duyem de dest pê kir ku di navbera salên 1939 û 1945an de çêbûbû. Di encama vê guhertinê de jî Împaratoriya Almanî herifî û dîsa nexşeya cîhanê hate guhertin û bi dehan dewletên nuh ên serbixwe hatin damezrandin.

Ji vê guhertinê pahlava me kurdan Komara Mahabadê bû, ku di sala 1946an de hate damezrandin lê mixabin piştî salekê (11 meh) ev pahlavî jî destê me kurdan çû û em dîsa man bêdewlet.

Guhertina dîrokî ya sêyem jî di encama şerê sar de (1991) têkçûna Yekîtiya Sovyetan bû.

Di encama vî şerî de Împaratoriya Sovyetan herifî û nêzîkî 20 dewletên nuh hatin ser nexşeya cîhanê. Ji encama vî şerî pahlava me kurdan aniha Kurdistan azad e ku îro li başûrê welatê me peyda bûye.

Gelo çima kurd nikarîbûn di wan her du guhertinên pêşîn de mafên xwe biparêzin? Em dikarin bi kurtî bibêjin, ji ber ku vîyana (îrade) me di wan biryarên navnetewî de nîn bû!

Lê heçî Kurdistan azad e, ku di despêkê de em başdarî biryara damezrandina wê nebûn jî, lê ji ber

gelek merc û hoyan ev sîwan hate parastin û niha jî em bi awayekî eşkere dikarin bibêjin ku qedera gelê me li başûrê welêt di destê me kurdan de ye. Bêyî beşdariya nûnertiya gelê kurd, çi herêmî û çi navnetewî, êdî tu hêz dê nikarîbe biryaran bistîne. Bi gotineke din, azadiya welatê me bi hêzên me yên sereke ve girêdayî ye û digel wan jî, dê vîyana gelê me di paşerojan de rê nede şerên birakujiyê!

Wek ku me di despêkê de got, niha em dê hewl bidin xwe ku bi berfirehî li ser Kurdistan Sor rawestin.

### **Kurdên Rûsyayê û Yekîtiya Sovyetan**

Di sala 1966an de pirtûkek bi navê *Kurdên Li Pey Qafqasyayê* derketibû. Nivîskara vê pirtûkê kurd-nasa (kurdolog) sovyetî T. A. Arîstova ye. Ew dinivîse:

*"Li Azerbaycanê kurd li Zengîlan, Kelbajar, Kubatî û Laçînê kom dibin û her wiha, li herêma Îsmailîye jî hene."*

Di heman demê de Arîstova dibêje, ku di îstatîstîkên sala 1959an de li Azerbaycanê kurdan xwe wek azerî nîşan dane. Gelo çima van kurdan xwe ji neteweya xwe bêrî kirine, nivîskara kitêbê ji me re nade xuyakirin! Lê Arîstova rastiyeke din a ji rastiyan tal ji me re dibêje:

*"Li Azerbaycanê naşiyên (ciwan) kurdan bes bi zimanê azerî dipeyivin, lê kesên navsere du zimanan dizanin."*

Divêt careke din bête pirsîn, gelo çima kurdên Ermenîstanê yên ku

sînorên wan bi sînorê Azarbaycanê ve ye zimanê xwe parastin û her wiha bi pêş ve jî birin, lê li Azarbaycanê birayên wan dest ji zimanê xwe berdan? Li gor min ev diyardeyeke (fenomen) balkêş e, divêt diroknaşên kurd mijûlî vê zuhura anormal bibin. Ne dereng, aniha, di vê heyam û serdema nuh de kurdnaşên me divêt li pirêzeyê xwe vegerin û gotina rast çi ye, bêtirs bînin ser zimên.

Ji bo ku dîsa em ji problema li ber xwe dûr nekevin, ez dê cardin veg-  
erim ser rûpelên pirtûkên ku derhe-  
qê kurdên Azerbaycanê de ne. Arîstova, di pirtûka xwe de bi berfire-  
hî li ser têkoşîna gelê kurd radiweste  
û vedigere ser mişextîbûna wan a ji  
Îranê û akincihbûna wan a li  
Azerbaycanê. Arîstova, mişextîbûna  
kurdan dibe sala 1807an û dinivîse,  
ku di wê salê de serokê malbatê  
Mihemed Sefî Soltan ji Îranê bi 600  
malî ve derbasî sînorên Rûsyayê bûn  
û li Qerebaxê niştecîh bûn. Jê pê ve jî,  
kurd di salên 1813, 1828 û 1914an  
de hatine Azerbaycanê.

Piştî Şoreşa Oktobêrê û sazûna  
Yekîtiya Sovyetan, Arîstova dibêje  
ku

*"Herêma Kurdan a li Azarbaycanê  
di salên 1920an de hate avakirin ku  
ev herêm ji van bajaran pêk dihat:  
Laçîn, Kelbajar, Kotulîn û Zengîlan."*

Kevintirîn gotara li ser kurdên  
Azerbaycanê ew e, ku di sala 1925an  
de li bultena Akademiya Zanistî ya  
komara Gurcistanê hatiye weşandin.  
Lêkolîna ku di vê bultenê de bi navê

*"Kurdên Azerbaycanê"* li ser kurdan  
hatiye weşandin, di bin vî sernavî de,  
di nava du kevanên mezin de nivîskar  
babeta lêkolîna xwe wiha rave kiriye:  
"Çend Peyvên Etnografî". Li gor ku  
xwediyê vê nivîsê G. Çûrsîn  
dinivîsîne, *"Kurdistanîkî Üyêzd, anga  
Herêma Kurdistanê wek herêmeke îdarî  
di sala 1923an de li devera ku pirraniya  
rûştivanan kurd bûn, hatiye avakirin.  
Rûbera cografyaya Kurdistanîkî Uyêzd  
3.105 fersex e. Lê rûniştvanên wê 44  
hezar kes in. Ji sedî 80 (% 80) kurd û ji  
sedî 20 (% 20) azerî ne."*

Ji materyalên heyî tê xuyakirin ku  
Herêma Kurdistanê di nav şengeha  
Azerbaycanê de bi hêsanî nehatiye  
avakirin, berovajîya vê yekê, di nav  
deh salan de xirecîreke mezin li ser  
forma avakirna wê çêbûye. Ji ber vê  
yekê, di navbera du demên cihê de  
komîsyon û heyetên têkel hatine  
herêma kurdan û raporên xwe li gor  
dîtin û baweriyên xwe şandine cihên  
fermî yên ji xwe bilindtir. Komîsyona  
ku di bin serokatîya A. Bûkşpan de li  
sala 1930 hatiye şandin yek ji van  
komîs-yonan e. Dû re, rapora  
komîsyona A. Bûkşpan wek pirtûkek  
bi navê *"Kurdên Azerbaycanê"* di sala  
1932an de li Bakuyê tê belavkirin.  
Niha em dê bi firehî li ser vê pirtûkê  
rawestin.

*"Şoreşa Oktobêrê zincîrên kevin  
qetandin û hin ji gelên windabûyî  
derxist meydana, jiyan û pêşketîneke  
nuh bexşî wan kir. (Stalîn)"*

Nivîskarê pirtûka *Kurdên  
Azerbaycanê* A. Bûkşpan bi van  
peyvên Stalîn rûpelên pêşîn ên rapo-  
ra xwe dixemilîne. Jê pê ve jî di şûna

ku Gelên Windabûyî mafên xwe li ser rûpelên pirtûka A. Bûkşpan cihê xwe bigirin, ditemisin û winda dibin.

Rapora Bûkşpan di despêka salên 1930an de, ne di berjewendiyên kurdan de bû. Lê niha ev materyal giranbiha ye. Çünke ew mafên herî hindik ku hukumeta Azerbaycanê di wê heyamê de tesbît kiribûn di roja îro de ew maf jî tune ne! Ji bilî viya, em bi saya vê pirtûkê li ser materyalên din ên derheqê herêma Kurdistanê de agahdar dibin. Di vî warî de numûne pirr in û em dê pêşkêşî xwendevanên xwe bikin.

Wek mînak, di havîna sala 1929an de heyeteke pîspor di bin serokatiya Prof. B. A. Gurke-Kryajîn de diçe Kurdistana Azerbaycanê (Diyar e ku di wê heyamê de ev terîm bikar dihat. Lê heçî Bûkşpan e, navê "Kurdistana Azerbaycanê" bi gotina qaşo! bikar tîne.). Mixabin, materyalên vê heyetê nehatine belavkirin. Bes bi alîkariya du gotarên serokê vê heyetê Gurke-Kryajîn, ku li rojnameyeka gurcî ya bi navê *Zariya Votoska* (*Elinda Rojhilatê*) di 12ê Tebaxa sala 1929an (no: 186/2154) û di 18ê Tebaxa heman salê de (no: 188/2156) hatiye weşandin, ku ew ligel firehkirina statuya Herêma Kurdî bûye. Lêbelê, A. Bûkşpan li dijî vê nihêrînê bûye û li gor baweriya wî ev yeka han di pîrsa netewî de rasterast li dijî nihêrînên Marksîzm-Lenînîzmî ye. Û di warê siyasî de jî pirr kêmasî tê de hene! Ne dûrî aqil e, ku ji ber van kêmasiyên siyasî rapora Prof. Gurke-Kryajîn nehatiye qebûlkirin û her wisa

jî nehatiye belavkirin. Her wiha jî dê ne dûrî aqil be, ew komîsyona ku di bin serokatiya A. Bûkşpan de hatiye şandin da ku wan *çewtiyan* li ser bingehê *rastiya* hebûna kurdan a li vê herêmê bide xuyakirin! Loma jî, ew muhaweze dike ku hejmara kurdan li wir kêmbike. Li gor nihêrîna A. Bûkşpan gelek tirkên Azerbaycanî li ser nufûsa kurdan hatine qeydkirin!

Diyar e, ji ber van pîrsên bi nakokî dê ji xwendevanan re ravekirina nave-roka pirtûka *Kurdên Azerbaycanê* bi firehî pêwîst be. Her wiha jî, dê nasandina formata wê jî pêwîst be. Ji ber vê yekê em dê li vir hin pêzanînan raxin ber çavan:

Pirtûk ji 92 rûpelan pêk hatiye, ji qalibê orte ye û 8 beş e. Ew jî ev in:

1. Pêşgotin.
2. Kurdên Azerbaycanê.
3. Erd û Sînorên Kurdistanê (Mebest, Kurdistana azerbaycanê ye - Nivîskar.)
4. Rewşa aborî li Kurdistanê.
5. Pêwendiyên civakî û aborî di nav kurdan de.
6. Berdewamiya avakirina êlî (eşîrkî) û avakirina sosyalîzmê.
7. Terkîba netewî.
8. Problema kurdî li Azerbaycanê.
9. Xerîteya cihên ku kurd tê de dijîn.

Di beşa "*Problema kurdî li Azerbaycanê*" de nivîskarê pirtûkê vedigere ser materyalên arşîva navendî ya Azerbaycanê. Jixwe, ji vana jî tê xuyakirin ku pîrsa wek herêmeke îdarî cudakirina Kurdistana Azerbaycanê gelek caran di nav endamên komîsyona hukumetê (ewên ku mijûlî vê pîrsê dibûn) de û her wiha jî di rêxistina partiyê de bûye meydana

munaqeseyan. Pirsra kurdî wisa serê xwe radike ku heya di komîteya navendî ya Partiya Komînîst a Azerbaycanê de dibe sedemê stendina biryara şandina komîsyonê ya ji bo tesbîtîkirina sînor û forma îdarî ya Nagornîy-Qerebax û Kurdistanê.

Di nihêrîna A. Bûşqpan de ev hebû, ku *"Di nav endamên komîsyonê de tu şik ji bo dayîna biryara Nagornîy-Qerebaxê nîn bû, lêbelê, ji bo Kurdistanê ev pêwîstî tune bû."*

Di wê qonaxê de pirsra kurdî li Azerbaycanê di hundirê çend mehan de tê nîqaşkirin. Meclisa Bilind a Azerbaycanê sê biryaran distîne. Ev biryar çi ne, nivîskarê vê kitêbê ji me re nade xuyakirin lê bes dîroka wan ji me re dibêje.

Li gor ku ew dibêje, biryara pêşî ya 21. 10. 1922an e. Biryara duyem, ya 20. 11. 1922an e. Û biryara sêyem jî, ya 30. 12. 1922an e.

Lêbelê digel viya jî di 13ê Kanûna 1923an de pirsra Kurdistanê dîsa tê nîqaşkirin. Du protokolên vê komîsyonê di arşîva Enstîtuya Dîroka Partiyê de, bi navê "Stîpan Şaûmyan" hatine parastin. Ji têksta protokola pêşîn tê xuyakirin ku nêhêrînên endamên komîsyonan li ser pirsra Kurdistanê ne wek hev in. Ev tiştên han di nav biryar û pêşniyarên têkel de xuyanî dibin.

### Têksta Protokola Pêşî

Du pêşniyar hene:

1. Cudakirina Kurdistanê wek herêmeke îdarî ya taybet, ku li ser bingeha mafên statuya herêmî ya ku pêwîst e ew bi desthilatiya

navendî ve girêdayî be.

Kurdistan ji Cewanasîn, Şûngîn, û Kubatî pêk tê. Sebeb (di teksta orîjînal de wisa hatiye gotin û mebest jê ev e, ku wek herêmeke îdarî sebeba cudakirina Kurdistanê): Dûrbûna Kurdistanê ji navenda Baku û veqetandina wê ji Qerebaxê û pirrbûna rûniştvanên wê ku 40 hezar kes in.

2. Kurdistan wek herêmek bi ser Qerebaxê ve girêdayî bimîne.

### Têksta Protokola Duyem

Protokola duyem li ser rojeva civîna 7ê Temûza sala 1923an bi vî rengî hatiye:

Me bihîst (birûske).

2. Li ser Kurdistanê.

Me biryar stand:

Ji bo avakirina Otonomiya Kurdistanê dê navend û sînorê wê bête danîn. Piştî sînordanîna dê ji Otonomiya Nagornîy-Qerebax bête veqetandin.

Çi bi serê vê biryarê de hat û çima neçû serî? Em pê nizanin. A. Bûşqpan wiha rave dike:

*"Dîroka pêşketina vê pirsê di pêş de ji me ve nexuyaye, lê ji biryara ku li dû wê hatiye stendin, wisa dixuye ku meqamên bilind miwafeqa xwe nedan û ji ber vê çendê ev biryar têk çû. Lêbelê di heman wextê de Kurdistan wek formek îdarî di forma "Îdareyê" de hate avakirin û di Tebaxa sala 1923an de **Gûsî Hacıyev** (dibe ku ev nav bi awayekî din bête xwendin, lê ji ber ku bi zimanê rûsî wiha hatiye loma me jî li gor wî nivîsê) bû serokê komîta karger."*

A. Bûkşpan di nav pirsarê kurdî ya li Azerbaycanê hinek jî vedigere ser dîroka her çar perçeyên Kurdistanê û li ser vê pirsê radiweste da ku ji me re bibêje, *"Tiştê ku me li Azerbaycanê daye wan, zêdeyî serê wan e!"* Ji bilî vî tiştî gelek çewtî di nihêrîna Bûkşpan a li ser dîroka gelê kurd de hene. Wek mînak, Bûkşpan serhildana Şêx Seîd ne tenê kevneperest dihesibîne, her wiha ew kesên ku beşdarî serhildanê bûne jî wek ajanên îngilîzan dibîne.

Li gor tê dîtin kurdên Azerbaycanê wisa bi hêsanî negihîstibûn mafên xwe ku di formek herî piçûk jî formên mafê netewî ye. Her wiha jî, em pê dizanin ku ew li ser bingeha hejmara xwe ya pîrr gîhane vî mafî. Loma jî şovenên Azerbaycanî bi her awayî xwestine ku hejmara wan kêmtir bikin. Di vî warî de em dê bi tenê numûneyek ji pirtûka A. Bûkşpan bidin, ku dibêje:

*"Di civîneke giştî de bi riya axiftina bi xelkê Çêraxê re me fam kir ku ji şeş malbatan;*

1. Wavîlî
2. Kezaxlî
3. Fatiklî
4. Xelefî
5. Çûrûllo
6. Tomisto

*Bes malabata "Çûrûllo" ya ku bi eslê xwe ji Mîrekê ye kurd e. Û ji vê malbatê bi tenê 20 kes dikarin bi zimanê kurdî bipeyivin! Heçî malbatên din in, bi kurdî nizanin û xwe tirk dihesibînin."*

Ger xwendevan dêna xwe bide, navê pênc malbatên ku A. Bûkşpan wan dike tirk, dê bi hêsanî bibîne ku ev nav bi qertafa "lî" bûne tirk!

Pirsarê ku bête kirin ev e, ku çima di civîna giştî de wan xwe kirine tirk?

Em bi xwe pê nizanin lê tiştê ku em pê dizanin, ew malbatên ku di sala 1931ê de xwe kurd didîtin, pîrraniya wan di roja îro de li ser dokumantên fermî bûne tirkên Azerbaycanê. Û tiştên din ên ku ji çavên kor jî nayêne veşartin jî ev in: Di sala 1923an de biryara Otonomiya Kurdistanê hebû. Wisa diyar e ku ev biryar ne li gor dilê hukumeta Azerbaycanê bûye. Ji ber vê çendê, bi lez û bez Îdareya Kurdî saz kirin û dû re jî ev mafê wan ê herî piçûk jî daqurtandin! Lê tiştê ku em niha dikarin bibêjin ev e, neheqiya ku li kurdên Azerbaycanê hatiye kirin ji ber çavan nayête veşartin.

Gelo ev yek çi tiştî bi pêş me kurdên Kurdistanê dike? Xwendevan dikare bi dehan pirsên din bike lêbelê tiştê ku divê em ji bîr ve nekin ev e, mirovê bêxwedî kes lê nabe xwedî û ew neteweya ku xwe neparêze dê di ber lingan de here!...

Li gor ku tê gotin, di wê heyamê de ji bo bidestxistina kar û xwendina di zanîngehan de desthilata azerî kurdan tengav dikir; ger mirovek xwe wek kurd didît, riya pêşketinê li ber dihat girtin. Loma jî di dema jimartina akincihan de mirovên kurd ji tîrsa windakirina karê xwe, di nasnemeyan de li xaneyê netewê de kurdan "azerî" dinivîsand. Û li gundan jî dema ku memûrên azerî ji wan dipirsî ku netewê te çi ye? Ger bersiv wek "Ez kurd im" bûya, hingê ewê memûr lê vedigerand û digot, "Ma tu ne musliman î?" Dema ku ewê kurd bigotana, "Belê" ewê memûr dîsa digot, "Em hemû musliman in, em

hemû azerî ne. Ma çi ferq tê de heye?!"  
 Û bi vî awayî mirovên kurd bêyî zanebûn û îradeya xwe dibûn azerî!

Ji ber encama vê siyasê hejmara kurdan ku di sala 1916an de nêzîkî 30 hezarî bû lê di hejmartina sala 1970an de dadikeve 250 kesî.

Lêbelê desthilata Sovyetan qet nepirsî, bê ev çawa bû ku ew civaka kurdî ya xwedî pirzarok di hundirê 50 salan de şûna ku ew zêde bibin ber bi tunebûnê ve çûn?! Lêbelê xêrnexwaz-ên kurdan baş dizanîbûn ku çi dikin! Bi tunekirina kurdan re dê îdareya wan jî nas nekin. Her bi vî awayî di salên 1930an de Kurdistan Sor wek realîteyek li ser cografyayeke îdarî û siyasî rabûbû û ji bo xapandinê be jî di çapemeniyê (rojname) de bi navê "Kurdistan" heya sala 1964an jiyana xwe berde-wam kir.

Dijminên kurdan xebata xwe kirin û gihastin armanca xwe. Gelo kurdan çi dikir? Bi vê pirsê em derbasî xala duyemîn a ji sedemên têkçûna Kurdistan Sor bibin.

Gelo me kurdan çima nekarî van kêmtirîn mafan biparastana? Ev gunehkarî ya kê ye? Beriya her tiştî divêt bête gotin ku di wê qonaxê de Kurdistan di rewşeke dijwar re derbas dibû. Li Tirkîyê kemalîstan bi her awayî gelê me bêçare kiribûn, û li başûr jî îngilîzan bi ereban re şerê kurdan dikir da ku ew bêmaf bimînin. Û li rojhilatê jî, şahîşahiyê bêhn li kurdan çikandibû. Bi gotineke din, Kurdistan di nava diywariyeke wisa de bû ku ew bi xwe pêwîstî bi alîkariyê hebû. Loma jî kurdên li welêt

qet nikarîbûn ji birayên xwe yên li Sovyetan re bibine alîkar.

Lêbelê, heçî kurdên Sovyetê ne, yên ku xwediyê mafên bidestxistî bûn, bi her awayî li hember Kurdistan Sor xemsar man. Gelo çima? Pêwîst e ku li vir bête îşaretkirin ku civaka kurdî ji bilî belavbûna di nav Sovyetan de, belavbûneke wan a giyanî jî hebû! Belavbûna giyanî, ji tunebûna hestên netewî bû. Kurdên musulman ên nezan bêhtir ji pirsê netewayetiye girîngî didan olê (ayîn; dîn). Kurdên yezîdî jî nasnameya xwe wek "Yezîdîtîyê" nîşan didan; ew jî dûrî hesta netewî bûn. Û zanayên civaka kurdî xwe wek kominîst nîşan didan ku enternasyona-lîzm li ber wan ji netewayetiye girîngtir bû. Ev herêma bi vî awayî ma li erdê û barê wê ketibû. Û tu dibêjî qey tunebûna Kurdistan Sor ji bo kurdan ji hebûna wê çêtir bûye!

Û heya bi zanayên kurd ên Sovyetan jî ne dûrî vê xemsariyê bûn. Rojek ji rojan ji van zanayan tu kesek derheqê babeta hebûn û tunebûna Kurdistan Sor de tu lêkolînek nenivîs- and. Zanayên dîroknas ên kurd li ser hemû qonaxên dîroka Kurdistanê deqên xwe nivîsandin, bi saya vê yekê bûn lêkolîner, doktor û profesor, lêbelê kesek jî ji wan xwe bi nêzî babeta Kurdistan Sor nekir.

Ji bilî van sedemên li jor, sedemê meke din jî ya olî ye, ku hişt Kurdistan Sor wînda bibe. Kurdên musulman ên ku xwediyê "Îdareya Kurdî" bûn, desthilata Sovyetan gelek ji wan surgunê komarên Asyaya

Navîn kir, ku mafê vegerê jî ji bo wan tunebû. Ewên mayî jî, ji ber vê tirsê surgunkirinê, desthilatîyê çî bigota wan nedigot "Na!" Û azerîyan heta dawiyê vê yekê li hember kurdan wek suîstîmalek bi kar anî. Ne dûrî aqil e ku ji ber vê yekê kurdan di bin sîwana olî de bi hêsanî xwe wek azerî qebûl kirin...

Lê heçî kurdên yezîdî ne, wan bi çavên dijminatîyê li birayên xwe kurdên musulman dinihêrî. Birîna yezîdiyan a ji ber qirkirin û talankirinê hîn necebirî bû. Ji ber vê çendê, ew jî xwedî li Kurdistanê Sor derneketin... Ev jî ne bêyî alîkariya Ermenîstanê bû; ger azerîyan bi asîmîlekîrîna kurdên li cem xwe, kurdên Kurdistanê Sor tune kirin, hingê ermenan jî bi rîya xwedîlêderketina li kurdên li "cem" xwe hiştin ku ew jî bi dûr bikevin.

Lîstîka van her du komaran (Ermenîstan û Azerbaycan) piştî herîfîna Yekîtiya Sovyetan jî berdewam bû. Di qonaxa şerê li ser Qerebaxê yê di navbera Ermenîstan û Azerbaycanê de ev lîstîk bi şêweyeke vekirî hate lîstin. Dema ku Ermenîstanê di encama şerê de Qerebax û herêma Kurdistanê Sor xistin bin destê xwe, hingê ji kurdan xwestin ku ew vegerin herêma xwe bi xwe jî îdareya xwe bikin. Tiştê ku girî û ken bi xwe re dianî, danîna Hukumeta Kurdî li Erîwanê bû, ku wek ordiyeke bêleşker bû! Û dema ermenan dîtin ku kurd bi ya hukûmetê nakin û venagerin çiyê xwe, çawa ku wê hukûmetê bi destê xwe çêkiribûn, her wiha bi destê xwe

xira jî kirin û pîrsa Kurdistanê Sor ji holê rakirin.

Ev dibe ji dehsalan zêdetir ku Qerebax û pê re jî herêma Kurdistanê Sor di bin kontrola artêşa (ordu) Ermenîstanê de ne. Îcar pîrsa Kurdistanê Sor ji aliyê Ermenîstanê ve hîç nayête ser zimên. Kurd, çawa ku berê jî ne di bala kesî de bûn, niha jî her wisa ye. Lê tiştê balkêş ev e, êdî azerî kurdan didehfinin (teşwîk dikin) ji bo doza mafê xwe yê herêma Kurdistanê Sor ji Ermenîstanê bikin.

Kurdên nuh jî, çawa ku li heyamên berê xwedî li herêma xwe derneketibûn, niha jî her wisa derneketin. Û birîna Kurdistanê ji mêj ve bûye pênc birîn.

---

\* Ev nivîs ji kovara *NÛBÛN* hejmara 57-58, Çîriya Pêşîn-Çîriya Paşîn, 2004, Hewlêr-Kurdistan hatiye wergirtin, lê ji bo kovara *BÎR* bi tenê ji aliyê rêzimanî ve hatiye redaktekirin (R. Lezgîn).

# ***Tosinê Reşîd:*** **Li Welatekî Azad Rûmeta Meriv Heye**

**Hevpeyvîn: Receb Dildar**

R. Dildar: *Tosinê Reîşd kî ye, hûn dikarin ji kerema xwe re hinek qala xwe bikin?*

-*Tosinê Reşîd* kurdekî êzidîyê Ermenîstanê ye. Li gundekî kurdan hatiye dinê. Di temamê jiyana xwe de bi ermenî xwendîye, lê li hawir-doreke ûsa mezin bûye ku rûmeta ziman û çanda kurdî hebûye. Min li unîversîteyê fîzîk û matematîk xwendîye paşê min doktora xwe li ser kîmyayê kiriye. Lê di salên xwendakariyê de min dest bi nivîsariyê û gotaran kiriye, dest bi karê roj-namegeriyê kiriye û dîsa dest bi nivîsariya şar û çîrokên kiriye. Şarên min di sala 1962an de çap bûne. Çîroka min di sala 1967an de çap bûye. Min çend pirtûk li ser hev çap kirine.



**Yê milê rast Tosinê Reşîd û yê din jî Receb Dildar e**

R. Dildar: *Heta aniha çi berhemên we çap bûne?*

- Berhema min a yekemîn *Dîroka*

*Helbestan* e ku di 1975an de çap bûye. Paşê, wê hinek guhestin û wergerandin tirkî, bi tîpê latînî li Berlînê çap bû. Paşê, berhema min dîwanek e, bi navê *Zozan* çap bûye. Paşê, berhemeke biçûk bi navê *Jan* çap bûye û dîsa berhemeke mezin ku dîwaneke min e, ez gelek jê hez dikim, bi navê *Nîvro* çap bûye, ev gişt şar bûn.

Di dema me de du şanoyên kurdî hebûn. Yek li Ermenistanê, yek jî li Gurcistanê li bajarê Tîflîsê bû. Ji bo şanoya bajarê Tîflîsê min piyesek nivîsî, bi navê *Siyabend û Xecê* ev piyes li ser sahnê hat danîn, vîdeo û kasetên wê jî hatin belavkirin. Di sala 1998an de li Swêdê wek pirtûk hat çapkirin. Di sala 2000î de berhevoka kurteçîrokên min bi navê *Şeva Bêxew* hat çapkirin. Xêncî wê jî dîsa di sala 2000î de min û Husên Hebeş ji bo bîranîna Qanadê Kurdo pirtûkek çap kir. Heta niha ev berhemên min hatine çapkirin.

R. Dildar: *Aniha çi berhem di destê we de ne, hûn li ser çi dixebitin?*

- Aniha du berhemên min li çapxanê ne, dê çap bibin. Yek lêkolîn e, li ser ola êzidiyan, bi nava *Êzidiyatî: Oleke Hê Jî Nenaskirî*. Yek jî berhevoka çîrokan e ku li Stenbolê Avesta çap dike. Navê wê *Min Bêriya Şevê Spî Kiriye ye*. Ez bawer im ku ev her du berhem jî dê heta dawiya salê çap bibin.

Xêncî wê jî, sala bê dusedsaliya jidayikbûna şair û dîroknasa kurd *Mestûreyê* ye. Ji mêj ve di serê min de bû û min dixwest tiştekî di derheqê wê jina mezin de binivîsînim û min romaneke dîrokî nivîsiye. Lê hinek karên wê

mane, ez ê تمام bikim û bawer im dawiya salê ez ê bidim weşanxaneyek, dê bê çapkirin. Niha dîsa ez çîrokan dinivîsim, ji mêj ve ye helbestên kin dinivîsim.

Niha hinek planên min hene, berî gişkî *Weşanxaneya Spîrêz* ya li Başûrê Kurdistanê ji min xwest ku Încîlekê bi zimanê kurdî bi tîpên ermenî hatiye çapkirinê, ez bawer im sala wê 1856 e, ez dê wê biguhêzim tîpên latînî û bi lêkolîneke kurt dê wê çap bikin. Ji ber ku ew gelek balkêş e ku zimanê kurdî 150 sal berê di çi rewşê de bûye. Ez ê wê amade bikim. Paşê, berhemên gelek nivîskarên kurdên sovyetê li derveyî sovyetê nehatine naskirinê û ji wan ên gelek hêja jî hebûn. Ez dixwazim antolojiyeke helbestên kurdên sovyetê û antolojiyeke çîrokên kurdên sovyetê amade bikim û *Weşanxaneya Spîrêz* a Başûrê Kurdistanê dê wan çap bike.

R. Dildar: *Kekê Tosin, kurdên sovyetê pêşkêşiya wêjeya kurdî kirin, hûn dikarin hinek qala wê xebatê bikin?*

- Berî gişkî, ji bona pêşxistina çanda kurdî Yekitiya Sovyetê rê vekiribû, bi taybetî jî li Ermeniyayê. Gerek bê gotin ku rewşenbîrên ermenî di destpêkê de alîkariyeke mezin dane me. Hema tiştekî herî sade ez bibêjim, yekemîn rêzimanê kurdî profesorekî ermenî nivîsî. Yekemîn berpirsiyarê rojnameya *Rêya Teze* nivîskarekî ermenî bû. Wê gavê qadîrên me tune bûn, wan alîkarî dan me û qadîrên me jî zû xwe girtin û tiştekî balkêş jî, qadîrên me ji sifîre dest pê kirine. Çunkî tu pêwendîya wan bi Kurdistanê re tune bû. Agahîya wan jî, hema bibêje ji ede-

biyata klasîk ya kurdî tune bû. Ji ber ku ew qadirên yekemîn li sêwîxaneyan mezin bûbûn. Heta gelekê ji wan mezin bûbûn jî nizanibûn kurd in, lê wan riya rast da pêşiya xwe. Berî gişkî dest bi berhevkirina folklor û zargotina me kirin. Folklor û zargotina me gelek dewlemend e û edebiyata kurdên sovyetê li ser bingeha folklorê dest pê kir. Bêguman gava tu ji ciyê vala, ji sifrê dest pê bikî, kêmanî û kurtî jî pir dibin. Di destpêkê de rast e, roman hatin nivisandin, gelek pirtûkên kurteçîrok û helbest hatin nivisandin lêbelê ew hê ewqas bi hêz nebûn. Edebiyata kurdên sovyetê, bi rastî di salên 1960î de geş bû. Sedema wê jî ew e, ku tesîra şoreşa Başûrê Kurdistanê li ser me gelek mezin bû. Berê ji bo me xêncî sovyetê dinya tune bû. Em xwe bi xwe bûn.

R. Dildar: *Têkiliyên we û şoreşa Başûr cawa çêbûn?*

- Têkiliya me û şoreşa Başûr di 1961î de wexta şoreş dest pê bû, em bibêjin piştî şoreşa Evdîlkerim Qasim a 1958an ku dest pê kir, rojname û kovarên sovyetê li ser kurdan dinivisandin. Lê piştî 1963yan hukumeta Yekitiya Sovyetê bi awayekî vekirî pişt-giriya şoreşa Kurdistanê kir. Kovar û rojnameyan ji sibê heta êvarê li ser kurdan digotin û bi dû re jî, ji başûrê mezin û başûrê biçûk xwendevanên kurd hatin Yekitiya Sovyetê, bi vê riyê têkiliyên me çêbûn. Di salên şist re dîsa cara yekemîn komek xebatkar ji bo doktoraya xwe hatin Yekitiya Sovyetê. Marûf Xiznedar, Kemal Mazhar, Îzedîn Mistefa Resûl di nav wê komê de bûn. Ew komek mezin bû, bi riya wan jî têkilî hatin çêkirin. Kovar, rojname û

pirtûk ketin destê me û girêdan çêbûn.

R. Dildar: *Hûn dikarin hinek qala berhemên kurdên sovyetê yên serketî bikin; çi roman be, çîrok be, helbest be, lêkolîn be?...*

-Ji aliyê kurdnasiyê ve kurdên sovyetê gavên gelek mezin havêtine, berhemên gelek hêja çap kirine, lê ji ber ku ev berhem ên akademiya bûn, ji aliyê weşanxa-neyên akademiya ve hatine çapkirin, piraniya wan bi zimanê rûsî an ermenî ne. Em bibêjin di dereceya zimanzanîyê de berhemên Qanadê Kurdo, yên Zera Ûsif, ên Maksîmê Xemo hene. Ev bingeheke gelek mezin e. Tenê Qanadê Kurdo hildim; wî di sala 1957an de bi zimanê rûsî rêzîmanê kurdî, serbingeha zaravê kurmançî çap kir. Ev yekemîn rêzîmanê kurdî yê akademîk bû ku hatibû çapkirin û ji aliyê zanyarên rojhilatnas ên dinyayê ve hat naskirin. Ev yek, piştî wî jî, rêzîmanê hemberî hevkiirina zaravê soranî û kurmançî, rêzîmanê hemberî hevkiirina her du zaravayan nivîsî û cara yekemîn îsbat bû ku rêzîmanê her du zaravayan yek e. Dû re, wî li ser zazakî lêkolîn kir, li hemberî hevkiirina zaravayên soranî û kurmançî kir û dîsa îsbat kir ku zazakî zaravayeke kurdî ye; beşeke zimanê kurdî ye. Paşê di karê zimanzanîyê de gelek girîng e, ku wî ferhenga kurdî-rûsî amade kir û çap kir. Pirtûkên wî gelek in. Dîsa, wî di 1949an de ji bo dibistanan rêzîmanê kurdî amade kir û çap kir. Li dibîstanên Ermenistanê ji bo fêrbûnê ev rêzîman dihat xwendinê.

Dîsa em bibêjin Heciyê Cindî. Heciyê Cindî belkî 30 pirtûk li ser folklorê kurdî çap kirine, ûsa jî gelek lêkolîn çap

kirine. Xêncî vana lêkolîna *Kerik û Kulik, Siyabendê Silîvî û Rustemê Zal* çap kirine. Dîsa, wî du pirtûk li ser edebiyata kurdên sovyetê çap kirine.

Di dereceya berhevkirina folklorê de Celîlê Celîl û Ordîxanê Celîl gelek pirtûkên hêja çap kirine. Ez dikarim bibêjim, di aliyê sazbandiyê de jî, ji salên 1930î û vir de xebat hene. Beriya wî di sala 1914an de kombîzotorekî ermenî stranên kurdî berhev kirin û çap kir. Dîsa, ermeniyekî din di salên 1930î de notayên muzîka kurdî çap kir. Di destpêka salên 1960î de kurdan bi xwe dest bi xebatên muzîkê kirin. Berê Nûra Cewerî, paşê jî Cemîla Celîl pirtûkên xwe çap kirin. Xêncî berhevkirina stranan, Nûrê doktoraya xwe li ser muzîka kurdî di salên 1970an de kir. Pirtûkek li ser stranên gelêrî, teoriya sazbandiya kurdî amade kir û hat çapkirin. Cemîla Celîl jî gelek pirtûk li ser sazbandiya kurdî çap kirine.

R. Dildar: *Taybetiyeke muzika kurdî ya kurdên sovyetê heye ku dejenere nebûye, hûn viya bi çi ve girê didin?*

- Ez bawer im ev tişt beriya her tiştî ji çanda ola êzidiyan tê. Ji ber ku êzidî tiştên derveyî qebûl nakin, gelek bi dijarî qebûl dikin, bi taybetî jî di dereceya ziman û muzîkê de. Mesela ez li gund mezin bûme, li wî gundî rûmeta strana kurdî hebû, straneke bi zimanê din nedihat gotin, şerm dihat hesabê. Mesela 200-300 mêr li ser sofrê rûdiniştin stran distran, kesê şaş bistra an nizanîbûya ciyê wî li ser wê sifrê tunebû. Hosta distra, stran ji hosta derbasî hosta dibû. Ew stran bi paqijiya

xwe ji nifşekê derbasî nifşeke din dibûn. Paşê jî me di destpêkê de guh da paqijiyê. Di Radyoya Yêrîvanê de stranên di bin bandora sazbandiya rûsan, ermeniyen, tirkên de tune ne, tiştêkî ûsa tune ye. Salên paşîn Aramê Tîgran hat hinek wî kir lê dîsa rîya wî girtin, nehiştin ji kurdî derkeve. Ji ber ku pêwendiyên me bi Kurdistanê re tûnebûn, me her tişt li ser bîngeha folklorê xwe ava kir. Folklorê me jî paqij û dewlemend e.

R. Dildar: *Tê zanîn ku kurdên sovyetê bi piranî êzidî ne, hûn dikarin hinek qala ola êzidiyatîyê bikin?*

- Pirs ew e ku kurdên sovyetê bi piranî ne êzidî ne, bi piraniya xwe kurdên musulman in. Ji bextê xwe re, di komarê lê dijiyan de asîmîle bûn. Li Turkmenistan û Azerbay-canê belkî 700-800 hezar kurd hebûn lê ew asîmîle bûn. Pêşketina êzidiyan ew bû ku xwe parastin, asîmîle nebûn. Paşê jî alîkarî hebû, ji ermeniyen alîkarî girtin. Hukumeta sovyetê rê da wan, ermeniyen jî rê li pêşiya wan negirt. Hukumeta sovyetê rê da kurdên Azerbaycanê jî, lê azeriyen pêşî li wan girt. Heta salên şêstî. Piştî salên şêstî ermeniyen jî xwest pêşiya me bigirin, êdî nedibû, êdî me xwe girtibû. Wan nikaribû pêşiya me bigirtana.

R. Dildar: *Bi rastî em ola êzidiya-tiyê baş nas nakin, ji kîjan demê dest pê kiriye, taybetiyên wê çi ne, têkiliyên ola êzidiyatîyê û zerdeştîyê çi ne?*

- Di hevpeyvîneke ûsa de derheqê ola êzidiyan de tişt gotin gelek zehmet e, lê dîsa jî ola êzidiyan; li gor êzidiyan

bixwe û li gor gelek zanyaran dora çar hezar sal e ku heye. Ola êzidiyan di bingeha xwe de oleke kurdî ye. Li gor baweriyên gelek zanyaran û ez jî pişt-giriya vê zanîne dikim, ku an ola împaratoriya Medya ye an jî ji wê olê tê, elbet bi guhestinên mezin. Çimkî bi sedsalan zeman derbas bûye û bandora olên nû gelek hene. Ji wê demê heta îro ola babîliyan, asûriyan, zerdeştîyan, xaçperest û îslamiyan li ser vê axê derbas bûne. Nikaribûne di nav hev de bijîn lê bandor li hev kirine. Bi ya min ew berdewamiya ola împaratoriya Medya ye.

Şertê wê yê sereke ev e ku Xwedê yek e, bêheval û bêşîrîk e. Paşê di ola êzidiyan de bawerîya kirasguherinê heye. Di ola êzidiyan de ev bawerîyeke bingehîn e. Di ola êzidiyan de tiştek mayîn jî heye wek dibêjin Xwedê ji nûra xwe heft melek sêwirandin, paşê birêvebirina dinyayê spart wan. Tiştekî din jî heye ku dibêjin xerabî ne ji xwedê ye, xerabî ji merivan bi xwe ye.

R. Dildar: *Di derheqê têkiliyên êzidiyatî û zerdeştîyê de hûn dikarin çi bibêjin, kurd ola xwe ya kevn wek zerdeştîyê dibînin, heta îro welê hatiye qebûl kirin.*

- Ez ne di wê baweriyê de me ku kurd zerdeşt bin. Bêguman çend sed sal kurd di bin destê împaratoriyeke de mane ku ola wê ya fermî zerdeştî bûye. Meriv nikare bibêje tesîra zerdeştîyê li ser kurdan çenebûye. Lê zerdeştî di bingeha xwe de oleke dualîst e. Di ola êzidiyan de dualîzm tune ye. Xwedê yek e, bêheval û bêşîrîk e, a sereke ev e. Zerdeşt agir diparêzin lê êzidî rojê

diparêzin, roj nîşan e. Tu çirayê vêdixî, lê wê çirayê naparêzî. Ew çûye hinek guhestin kiriye û ji ola êzidiyan oleke nû der-xistiye. Dibe ku hinek tişt yek bin. Îcar, kê ji kê girtibe jî, bi sedsalan cîranê hev bûne, ji ber vê yekê jî bandora wan li ser hev hebûye.

R. Dildar: *Hinek nivîskarên Ewropî dibêjin êzidiyatî bi Şêx Adî dest pê kiriye, ev çiqas rast e?*

- Ev şaşîyeke gelek mezin e. Pirs ev e, zaneyên Ewropî ew ên li ser ola êzidiyan dinivîsînin giş pêşekzanê ola îslamê ne, û ew dixwazin ola êzidiyan wekî tekeyeke îslamî bibînin. Lê gelek nivîsar û dokuman hene ku ola êzidiyatî berî Şêx Adî heye. Şêx Adî hatiye êzidiyatîyê qebûl kiriye, ne ku wî oleke nû damezirandiye. Berî Şêx Adî Mîrê Laleşê Yezdîn e. Mîr bûye û çar kurên wî hebûne. Beriya Şêx Adî di nav êzidiyan de şêx tûne bûne, pîr hebûne, murîd hebûne û mîrgeha wan hebûye. Ola êzidiyan gelek kevn e, gelek berî şêx Adî hebûye. Şêx Adî hatiye hinek guhestin çêkiriye lê ew ol di bingeha xwe de wek berê maye.

R. Dildar: *Hûn ji Kurdistanê azad tên, we li wê derê çi hîs kir, li wir azadî çawa ye?*

- Zanî çîye, em li xerîbiyê mezin bûne û welatên ku em lê geriyane ne dijmin bin jî, te tim xêrnexwaz didîtin, çawa bibêjim, te di navbera xwe û wan de tim tiştek didît. Lê wexta ku hema çawa tu sînore Kurdistanê derbas dikî, xortên qet te nas nedikirin jî digotin, "Mamo were rûnî, çayekê vexwe." Rûmeta meriv heye. Heta meriv diçe li Kurdistanê seranser kontrol heye, ew

pêşmergeyên te kontrol dikin jî dîsa bi camêrî, bi rûmetgirtin ber bi riya digirin. Paşê, me di jiyana xwe de nedîtîbû ku tu herî bajarek an jî welatek ku giş bi zimanê te dipeyivin, zanî giş rûmeta te digirin, rûmeta çand û zimanê te digirin. Bi rastî Kurdistanê Azad xewnek e. Helbet her tişt bi dilê me nîn e, kêr û kurtî jî hene lê ew dest-pêka damezirandina dewletekê ye, hêsan nîn e, tecrube kêr in.

Piraniya serok û kadroyên kurdan jiyana wan di nav şer de dest pê kiriye. Ew fêrî şer bûne. Niha birêvebirê dewletek in û gelekê wan jî êdî fêr dibin. Kek Nêçîrvan niha jî li Amerîkayê ye, çûye kurs dibîne. Xwe fêr dikin, her diçe pêş ve diçin.

Di vê deverê de di nav tu dewletan de mafên gelên biçûk tune ne, xêncî Kurdistanê. Binêr tirkman gelek dijminatîyê bi kurdan re dikin, lê dibistan û radyo û rojnameyên wan hene, televîzyona wan, partiya wan heye, her tiştê wan heye. Dîsa her tiştê asûriyan heye. Dîsa rûmetgirtina ola êzidiyan heye. Mezinayiya her miletî ew e ku ew çawa li miletên kêmnîeteweyên li nav xwe dinêrin. Di vê holê de, hukumeta Kurdistan û gelê Kurdistanê Başûr gelek mezin e, li ber çavan e.

R. Dikdar: *Ji bo xebatên li ser wêjeyê tê-kiliyên we çêbûn an na?*

- Ji bo xebatên li ser wêjeyê, bi taybetî têkiliya min bi dezgeha Aras re çêbûn, li Hewlêrê ye, weşanxaneyê hukumetê ye. Û bi civaka rewşenbîrên Silêmaniyê re çêbûn. Bi *Unîversîteya Silêmaniyê* re, bi *Unîversîteya Hewlêrê* re

pêwendiyên me çêbûn. Bi taybetî pêwendiya min bi weşanxaneyê Spîrêz re çêbûn, ew li Dihokê ye. Ji ber ku ew bêtirs guh didin pirtukên zaravayê kurmancî û ew dixwazin pirtûkan bi tîpên latînî çap bikin. Bi rastî di vî warî de pêwendiyên me gelek baş çêbûn. Kek Mueyed Teyîb jî merivekî zana ye û şairekî baş e. Di navbera me de pêwendiyên baş çêbûn, ji îro pê ve em dê hevkarîya hev bikin.

R. Dikdar: *Bi gelemperî li Başûr tesîra ola îslamî gelek xurt e, gelo rewşa êzidiyan çawa ye?*

- Di vî warî de tiştek gelek ecêb e ku dostaniyeke mezin heye, di nav êzidiyan û îslamiyan de. Ji ber ku, berî her tiştî, hukumeta Kurdistanê pişt-giriya êzidiyan dike. Kek Mesûd carek li Dihokê gotibû "Eger êzidî ne kurd in, miletekî bi navê kurd tune ye." Paşê jî gotibû "Kî destê xwe drêjî êzidiyan bike, destê xwe dirêjî miletê kurd û Kurdistanê dike. Ez dixwazim dîsa bibêjim ku Hukumeta Kurdistanê bi tundî pişt-girtina hindikahiyên olî û neteweyan giş dike lê di navbera çûyin û hatinê de jî navbera êzidî û kurdên musulman gelek xweş e.

R. Dikdar: *Hûn hatin û we Kurdistanê Bakur jî dît, bi hindikî be jî çavderiyên we hene, hûn ê çi bibêjin?*

- Li Kurdistanê Bakur guhestin hene, guhestin ber bi başiyê ve diçe, lê dîsa jî ne bi dilê me ye, ji ber ku heta îro bi milyonan kurd hê jî bi zimanê xwe nizanin, hê jî asîmîle dibin, hê jî li bawerîya Kurdistanê mezin xwedî der-nakevin. Zanî, kurdariyê mezin,

kurdayetiyeke wek bibe îdeolojî, bi siyasetên biçûk ve girêdayî be, ew nayê xwarin.

R. Dildar: *Ji bo pêşeroja kurdan hûn dikarin çi bibêjin, hêviyên we çi ne?*

Îro em di dewreke ûsa de dijîn, gihiştîye dereceyeke ûsa ku em bixwazin nexwazin kes nikare pêşîya 40 milyon kurdî bigire. Dinya ber bi demokratiyê ve diçe, Amerîka îro cîyê xwe digire, bandora Ewropa li ser Tirkîyê heye, Îran û Sûriye jî bixwazin nexwazin dê azadiya Kurdistanê nas bikin. Îcar em ê bikaribin heta bidest-xistina wê azadiyê milletê xwe biparêzin an millet asimîle bibe? Îcar pirsê kurdan bi giştî, îro Başûrê Kurdistanê êdî hatiyê naskirin, Eger wek dewletekî serbixwe nehatibe naskirin jî, lê em wan pêwendîyan çêdikin, bi serok û serokwezîrên dewletan re pêwendîyan datînin. Çawa bibêjim, welatê me defakto, wek dewlet hatiyê naskirin û rîya şûn de vegehin tune ye. Carna dewletên heremê bi taybetî jî Tirkîye gefan dixwînin lê ew tişteki vala ye. Êdî kes nikare destê xwe bide ser Kurdistanê.

R. Dildar: *Ez ê dîsa hinek vegeirim ser wêjeyê. Romannûsên wek Mehmed Uzun dibêjin, "Romana kurdî bi min dest pê kiriye.." Gelo ev tişt rast e?*

- Saet xweş, Mehmed Uzun nivîskarek e, hatiye meydanê, wexta pirsê destpêkirinê tê, evya şasiyeke mezin e. Ji ber ku ez nizamî ew di sala çendan de ji dayika xwe bûye, lê romana Erebe Şemo "*Şivanê Kurd*" di sala 1935an de çap bûye û beriya ku romana Mehmed Uzun "*Tu*" çap bibe, 6-7 roman ne ji

aliyê nivîskarek ve, ji aliyê nivîskarên cihê-cihê ve hatine çapkirin. Û tişteki din, ev ne di derheqê Mehmed Uzun de ye, bi giştî gelek kurd dibêjin min dest pê kiriye, ê din dibêje min dest pê kiriye. Tiştêk ûsa tune, berî me tişt zû de hene, lê agahiya me jê tune ye. Em bibêjin, em serê xwe xwar dikin, Celadet Bedirxan karekî gelek mezin kiriye. *Hawara* wî şoreşekî çandî bû, lê berî ku ew alfabeya latînî di Hawarê de belav bike, rojnameya *Rêya Teze* bi tîpên latînî dihat çapkirinê, ev jî divê bê zanîn. Tişt hene ku divê neyên jibîrkin. Ew rastiya dîrokê ne, dibe ku baş bin an nebaş bin lê divê ev rastiya dîrokê bê parastin.

## FELSEFEYAOLA ÊZIDIYAN Û KOKA WÊ\*

Pîr Memo Osman  
Wergeradina ji erebî: Xelîl Duhokî

Di sala 1990î de ez ji bo xwendinê li bajarê Londinê bûm. Hîngê Malbenda Roşinbîrî ya Kurdî, li wir ji min daxwaz kir ku ez semînerekê li ser ola êzidiyan bidim. Ji bo ku vê daxwazê bi cih bînim, ez di nav pirtûkxaneyên Londinê de geriyam û gelek lêkolînên ku li ser êzidiyan hebûn min xwendin û zêdeyî zanîn û agahdariyên xwe jî, êdî min ev babet amade kir. Heta niha bi tenê pirtûkek bi navê "*Êzidiyatî, 1979, Bexda*" ji aliyê du nivîskarên hêja yên êzidî Xidirê Silêman û Xelîl Cindî ve hatiye berhevkirin, nexwe tevayiya lêkolînên din, ji aliyê nivîskarên ne êzidî ve bûne. Mirovê êzidî ji ber du sedemên bingeîn nikaribûye behsa ayînên xwe bike: Dijatiya rejîmên desthilatdar li Îraqê, ku rê li ber digirt û siyaseta ereb kirin û beeskirinê beramber ol û kurd- bûna wan bikar dianîn. Ev pîlan bi germî ji sala 1970an dest pê kir û heta niha jî berdewam e.

Tirsa ronakbîrên êzidî ji behskirina kesayetiya Şêx Adî, yê ku havî (biyanî)

ji ola êzidiyan û nizimkirina wî bo pileya mirovî bû. Çünke piraniya êzidiyan wî wek pêxember nas dikin, belkî wî dikine ruhê Tawûsê Melek û carînan jî, dikine ruhê Xwedê.

Pirsa êzidiyan, hizir û serinca dîrokzanan ranekêşaye û gelek bi kêmî û kurtî behsa wan hatiye kirin. Behsa wan (belkî ji bo cara yekê) di pirtûka Şaristanî de, yê ku di sala 1153ê zayinî de koç kiriye, hatiye kirin û careke din jî, di pirtûka *Seyahetname* ya Ewliya Çelebî de, ku wî jî di sala 1680ê z. de koç kiriye, hatiye kirin. Ji ber hindê jî dema Şêx Adî dest daye ser ola êzidiyan êdî wan nekarî roleke girîng bilîzin û cihên tiliyên xwe di dîrokê de çêbikin. Lê ew li Kurdistanê jiyana xwe ji hêriş û pelamarên musilmanan parastin. Çünke bi hizra musilmanan, ew kafir û gawir bûn û Şeytan dipe- ristin. Bo cara dawiyê jî, di destpêka çerxê 19ê zayinî de ew ketine ber hêrişa Mihemed Paşayê Rewanduzî, ku bi navê Mîrê Kor dihate nasîn. Ji ber hindê jî, roj li pey

rojê ew kêmbûne û her hind mabû ku bêne qirkirin.

Êzidî li Îraqê, Sûrîyê, Tirkîyê û Sovyeta berê di belav in. Piraniya êzidiyan jî, ji Tirkîyê mişextî welatê Elmanya bûne. Hejmara êzidiyan li tevayî welatan digihe nêzîkî nîv milyonî.

### **Termê Yezdan (Yazdan)**

Navê Yezdan, bo cara yekê di pirtûka Zerdestîyê de, li Avestayê, di rûpela 18an de wek Xwedayê pîroz hatiye saloxdan. Ji wî jî, peyva Yazd, ango Xwedê peyda bûye. Û Yazdan, wateya gelek Xwedayan dide. Manaya giştî jî ew e, ku hêjayî peristin û qurbanîyê ye. Ev jî manaya giştî ya Xwedayê pîroz û tevaya xwedayên Hindo-Îranî yên beriya Zerdestîyê jî dide. Bi vê çendê, êzidî bawer dikin ku ew yekem netewe ne ku Yezdan yan jî Xwedê peristine.<sup>(1)</sup>

### **Şeytan - Devil**

Di Zerdestîyê de navê Şeytanî, Asuras yan Ahuras yan Lords bû û di ola filehan (xiristiyan) de, bi Şeytan nav kirine û ew jî mîrê tariyê ye û dibêjinê "Firîştayê Ketî". Her wisa ola musulmanan jî, mîna ya filehan bi Şeytan nav dikin. Peyva "Divel" exrîqiye û ji peyva "Diabolos" hatiye wergirtin, ku manaya xirabî û sedem dide. Lê di dema nû (New Testment) de, peyva Şeytanî wek termek li dij Xwedê û dijberê wî bikar tê.

*Sedemên hebûna Şeytanî;*

\* Tiştê ku xirab xuyaye, ji bo tiştê pak pêwîst e.

\* Hebûna beşeke tiştêkî, ji hebûna aliyê başê tiştêkî ye.

\* Gerdûn ji toximê baş û xirab pêk hatiye.

\* Hebûna xirabiyê, ji bo veğerandina arezûya azad pêwîst e.

Lewre eger ji bo tiştî, Dirustker (xaliq) hebe, ev wê çendê digihîne ku dirustkerêkî xirabiyê jî heye. Ev jî, wê maneyê dide ku hebûnek xwezayî (siruştî) û ezeli ye, yan jî, ji bo mebesteke taybet peyda bûye.<sup>(2)</sup>

### **Tawûsê Melek**

Êzidî, mîna fileh û musulmanan bawer nakin ku Tawûsê Melek (Şeytan-Divel) serkêşê xirabiyê ye. Belkî ew bawer dikin ku serokê tevayî firîştayan e û ew digel Cibraîlî ruhê xelkê dikîşîne. Lê xirabî bi xwe di dilê mirovî de ye û serkanî jî ne Tawûsê Melek e. Her wisa çîroka dirustbûna gerdûnê, li cem êzidiyan ne wek olên din e. Ew bi vî rengî şirove dikin:

Berîya ku Xwedê heft firîştayên din dirust bike, Tawûsê Melek ji ronahîya xwe çêkir û ferman dayê ku ji kesê din re sucde neke! Dema ku Xwedê heft firîştayên din çêkir û ferman da, ku ji erdî axê bînin û ji wê jî helametê Ademî çêbikin. Xwedê, ji ruhê xwe pif kirê û ferman da tevayî firîştayan ku sucde ji bo Ademî bikin. Hemû firîştayan sucde kir, lê Tawûsê Melek nekir. Xwedê sedem jê pirsî, wî jî bersiv da û got, "Ez çawa sucde ji bo yekê din bikim! Ez ji ronahîya te me û Adem ji axê ye. Ez şîret û raspêra te li erdê naxînim." Hingê Xwedê ew xelat kir û kir serokê tevayî firîştayan û cîgirê xwe li ser erdî. Ji ber hindê jî, êzidî bawer dikin ku Tawûsê Melek, nûnerê Xwedê ye li ser erdî û salê carekê, di çarşemba yekê ya meha Nîsana rojhilatî de, tê xwarê ser erdî dibe û ew roj jî li cem êzidiyan dibe cejna serê sala nû. Di wê rojê de, Xwedê ji ronahîya xwe Tawûsê Melek

dirust kiriye. Êzidî baweriyeke muqîm bi vê çîrokê tînin û xuya dikin ku Xwedê Tawûsê Melek taqîb dike ka şîreta wî ji bîr ve kiriye û li wê pileyê ye ku bibe nûnerê wî li ser erdî, yan na? Nexwe, çima Xwedê ferman da firîşteyên xwe ku sucdê ji bo Ademî bikin, li demê ku Xwedê ferman dide, dibêje "Bibe, dibe (Kun feyekon). Tawûsê Melek, wek hizreke felsefî, ji aliyê wî xelkî ve têtê peristin, yên ku bawerî bi rastiyê tînin. Êzidî dibêjin ku bi tenê ew e, gelê yekane û hişyar ku bawerî bi rastiyê anî. Her wisa hizra peristina Tawûsê Melek, mîna hizra pileya bilindbûnê di zanista ciwanîyê (sublime) de ye û yê baweriyê bi vê hizrê neîne, nikare vê rastiyê jî bibîne. Lewre gelê êzidî şîya vê rastiyê û vê hizra ciwanîyê jî bibîne.

### Şêx Adî

Êzidî bawer in ku Şêx Adî hizra çîroka Tawûsê Melek dîtîye û bawerî jî pê aniye. Şêx Adî, kurrê Misafirê Hekarî ku di sala 557-558ên koçî de mirîye, du pirtûk<sup>(3)</sup> li pey xwe hiştine: **Cilwe û Mishefa Res\***. Ew jî, piştî mirina wî, di sala 743ên koçî de, peyda bûn. Felsefeya wî jî li ser du bingehan rawestiya ye; Guhdarî û Ravekirin. Her çend Şêx Adî, navê Tawûsê Melek naîne, lê ew guftûgoyên li ser çîroka dirustkirina gerdûnê, ku di Quranê de hatiye, dike. Şêx Adî bawer dike ku koka xirabî û başiyê yek e û dibêje, "Eger xirabî, bê vîn û îradeya Xwedê bibûya, dê bêhêz bûya. Yê bêhêz jî, nikare bibe Xwedayek. Çünke nabe ku tiştek bê viyan û bê agahdariya wî di mala wî de hebe. Êzidîyatî, hizir dike ku Husên Xellacê sofî jî bîr û baweriyên

Şêx Adî li ser pirsê berevaniyê ji Şeytanî hebûn. Şêx Adî ruhê Tawûsê Melek di ya xwe de didît, çünke digot:

\* Ez bûm yê Adem di bihuştê de jiyandî û Nemrûd jî havêtiye nav agirî.

\* Ez bûm yê Xwedê esmanî jê re gotî: Tu davdan(hakim) î, adil î û serdarê erd î.

\* Ez im Adîyê Şamî yê kurrê Misafirî. Xwedayê dilovan, nav, textê esmanî, kursî û heft erd dane min. Di nihênîya zanîna min de, ji bilî min çi Xwedê nîn in. Ev tişt xizmetkarên hêza min in.

\* Eger ez dikarim, dê bo cara duyê, yan jî siyê, vegerim vê dinê, yan jî yeka din bi riya ruhveguhaztinê.<sup>(4)</sup>

Hindek dîrokzan bi vî rengî behsa Şêx Adî û Laleşê dikin: *Laleş*, gundek e dikeve nav sînorên bajarê Mosilê. Li wê derê Şêx Adî û kurrê xwe şêx û îmamê kurdan dijiyan.<sup>(5)</sup> Lê Îbin Elsîr, hevçaxê Yaqot el-hemewî, mirina Şêx Adî divegerîne rûdanên sala 557ê koçî û bi vî rengî behs dike, "Li wir Şêx Adîyê kurrê Misafirî, mir û koç kir. Ew Xwedênas li bajarê Hekarî, ser bi bajarê Mosilê dijiya ku ew bi xwe ji Şamê, ji bajarê Balebekê bû. Dema ew çûye bajarê Mosilê, hejar û xelkên çiyayî li wan deveran bawerî danê û ew gelek bi nav û deng bû."<sup>(6)</sup> Her wisa hindek çavkaniyên din jî dibêjin, ku Şêx Adî ji hoza (eşîra) Dinbilî ya kurdî ye û bi zimanê kurdî dipeyvî.

### Şêx Adîyê Sofî

Berîya Şêx Adî, sofîyan cilên spî li xwe dikirin ku nîşana sersokiyê

(sakarî-sade) bû, lê Şêx Adî bi cilên reş guherandin û navê wî kire "Xerqe"<sup>(7)</sup> û xwendekarên wî jî, ew cil li xwe dikirin û heta niha jî hindek komên êzidiyan wan cilan bi kar tînin. Şêx Adî û xwendekarên xwe mîna komên sofîyan diketine xelwê û jiyana nexweş ji xelkê dûr diketin. Rojiyên dirêj digirtin û bi tenê giyayên nas di navbera wan de, dixwarin. Ew jî eger wan, an murîdên wan çandibûya. Dîsan, wan xwarinên nenas nedixwarin û qedexa jî dikirin. Ew peristin û nexwarina tiştên nenas heta niha jî di nav êzidiyan de hene, mîna nexwarina xes û kelemê.

Şêx Adî, hat û rêxistina olî ya kevin li cem êzidiyan guherand û sistema herêmî (pyramid) danî ku heta niha jî heye û bi van pileyên serekî ava kir:

1. Şêx: *Ango yên rojperist û ev pile jî, çil îcax in:*

- a. Adanî.
- b. Qatanî.
- c. Şemsanî.

2. Pîr: Ew çil îcax in.

3. Mirîd: Ew jî çil îcax in û di nav wan de jî ev pileyên ayînî hene: *Qewal û Feqîr*.<sup>(8)</sup>

Şêx Adî, peywendiyên giran û aloz di navbera van pileyan de çêkirin. Ji bo her êzidiyek, şêxek, pîrek û birayekî dawiyê (axretê) heye û ji bo wan jî, ahengên taybet danîne ku pê bigirin û jê bersivek bin. Şêx Adî, vê dabeşkirinê bi mohra sofîgeriyê boyax kir, rewîşt û tîtalên ola êzidiyan ên kevin û nû têkel kirin ku mirov bi zehmet ji hev cihê bike. Wî reformên xwe li ser diyardeyên derve destnîşan kirin, berovajî Zerdestî, yê ku guherînên navxweyî di ola xwe de çêkirin. Pirs û sedemên hatina Şêx Adî bo Laleşê ew jî

çîrokeke dirêj e û pêwîstî bi delîveka (firsend) baştir heye. Ya hêjayî gotinê ew e, ku di Laleşê de karê Rebenan (masîra-nun) û babê Çawîş (Keşeyê kasolîkî) heye ku nikare jinê bîne.

### **Nimêjên Êzidiyan**

Ev ferz ji nimêjên berîya Zerdestiyê (Şemsanî) û sofîgerîya ku Şêx Adî anî, têkel e û bi vî rengî ye:

\* Nimêja berîya spêdê (Fecir).

\* Nimêja roj hilatinê.

\* Nimêja nîvroyê.

\* Nimêja êvarê.

\* Nimêja roj avabûnê (Mexrib).

Lê nimêjkirin bi metodê kevn e û divêt piştî sûstina dest û serûçavan, nimêjker berê xwe bide rojê, dema ku roj derdikeve û ava dibe û ji bo nimêja nîvroyê jî berê xwe bide Laleşê, cihê pîroz li cem êzidiyan. Digel van jî, çendîn tika û nimêj helkeftin jî hene.<sup>(9)</sup>

### **Koka Ola Êzidiyan**

Ola êzidiyan berîya hatina Şêx Adî, oleke esmanî (cosmic) bû (Mebesta min ne ew e ku ji esmanî hatibû û xwedan pirtûkeka mîna Quranê ye). Ew bawer dike ku, binaxê vê gerdûnê başî ye û xirabî ji derve tê nav. Di vê boçûnê de, Zerdestiyatî û Êzidiyatî digehine hev û ola dawiyê, gelek kevintir e ji yên din. Ew yek ji wan olan e ku, 2000 sal berîya zayînê hatiye Kurdistan û Îranê. Dema Zerdest 500 sal berîya Zayînê peyda bû û ola wî bû ya dewletê, hingê karekî mezin li ser êzidiyatîyê kir. Dema ola musilmantiyê hat û ji bo ku êzidiyatî hebûn û berde-wambûna xwe biparêze, hingê êzidiyan her zû amojgariyên Şêx Adîyê sofî wergirtin û gelek guherîn bi ser de

çêbûn. Ji ber ku ola êzidiyan berîya hatina Şêx Adî, ji wan olan bû, ku di ser lawazî û bêhêziya xwe re jî gelek li dij hindê bû, ku biçe nav ola musulmanan û ji ber vê helwestê jî, çendîn car tûşî qirrkirin û vebirrandinên tevayî bû. Ji bo ku li dij musulmanan raweste, ew li riyên din digeriyan, ta ku bîr û baweriyên xwe biparêzin. Ji ber vî sedemî, dema musulmanan Kurdistan û Îran xistin bin kontrola xwe, her du ol; Zerdestîyatî û Êzidiyatî, wek du olên belav û eşkera, xwe havêtine riyên sofîgerî û peristvaniyê.

### Êzidiyatî û Zerdestîyatî:

*"Êzidiyatî pêxistina ola zerdestîyatî ya kevn e."* Zerdest, 300 sal berîya Îskenderê Makedonî jiyaye. Li gor şirovekirin û lêkolînên li ser zimanê Avestayê (pirtûka pîroz ya zerdestîyê) hatine kirin, çavkanî dupat dikin ku koka wê ji Mîdiya (bapîrên kurdan) hatiye. Her wisa felsefe û pîrensîbên wî, peywendiyên adet û baweriyên olên Hindî bi yên Îranî ve dupat (tekîd) dikin, zêdebarî pesin û rêzê ji bo baweriyên Aşivanî yan xwediyê aşayê<sup>(10)</sup>, ango mirovê ku li rastiye digere û hewl dide ji bo xwe peyda bike, ku ew jî gelek nêzîkî Nîrvanaya Budadî ye. Ne dîr e, ji ew Xwedayê bi navê Memê Aşvan di nav êzidiyan de her ew be, yê ku di felsefe û ola zerdestîyan de hatî.

Ez bawer dikim ku mezinî û payebilindiya zerdestî û girîngiya peyama wî, ji hindê tê ku wî tiştên nû di ola xwe de pêşkêş kirin û baweriyên felsefî yên şoreşgerî, wek dualîzm (sunaîye) damezrandin û heta niha jî wê hizrê roleke mezin di felsefe û zanista psîkolojîyê de dibînin. Ev dual-

îzm, şerenîxa berdewam e di navbera hêza baş û xirab de. Zerdestî bawerî bi Xwedayê başiyê, yê tek û tenha dianî ku çend çiç jê diçin:

a. *Xwedayê dilovaniyê*: ruh-pakî-başî.

b. *Xwedayê xirabiyê û ruhên şerok*.

Zerdestî van amojgariyên xwe anîn, çunke bab û kalikên wî ravekirineke eşkera ji bo pîrsa xirabiyê peyda nekiribûn. Ji lewre jî, zerdestîyatî ola îradeya azad e û her kes, bixwaze yan nexwaze, wê rastiye yan derewê dihilbijêre. Pileya olî (pîr) wek rêberê olî, di nav her du olan; zerdestî û êzidiyatîyê de hevpişk e. Her wisa adet û rewîştên din yên hevpişk, yên ku koka wan vedigere wan olên kevin, yên ku 2000 sal berîya zayînê, ji Hindê mişextî Îran û Kurdistanê bûn, ev in:

### Agir

Ev toxme nûnerê Mîtra(Mîthra)yê ye, ku dadvanê gerdûnê û desthilatdarê agirî bû.<sup>(11)</sup> Mîtra jî, mîna Arîme (Aryman) ye, ku li gor hizra zerdestî, wê di paşerojê de roleke girîng di rêkxistina gerdûnê de bibîne. Berê temaşayî agirî dikirin, wek nûnerê Rojê li erdê û mîna hêzeke gerdûnî, bi rojê û avabûna wê ve girêdayî ye.

### Roj

Wek çevenga (sîmbola) bihuştê dibînin û tîkela ku Xwedê pê gerdûna wan bi rê ve dibe. Zerdestî gelek rewîştên olên kevin wergirtiye. Lê bi germî li dij "daévas" û rola wî dirawestîn.

### Dualîzm

Ev jî hizra hebûna du hêzên beramberê hev û bi rolên xwe ji hev cihê, dipejirînin. Ev dualîzm di nav olên Hindî-Îranî yên kevin de hebûn. Du cîn

ji wan hene: Dualîzma gawirî û dualîzma sincî (exlaqî).

Dualîzm di zerdeştîyê de berra- bûn e, di navbera Xwedayê esmanî ku xweşî û bextîyariyê belav dike û Xwedayê li jêr erdî. Mirov qurbaniyan pêşkêşî wan dikin, da ku xwe ji ziyar û xirabîya wan dûr bikin.<sup>(12)</sup> Xwedayên li jêr erdî, li gor zerdeştîyê, ne ku bi tenê dûr kirin e, belkî cezadayîn e, anku digel Şeytanî, di dozexê de ne. Zerdeştîyatî bawer dike ku hebûna madî (hebûna matiryalîzmî), cihê şerenîxa van her du hêzan e, (başî û xirabî)yê û ev jî kakilê olên Hindo-Îranî yên kevn e. Ola êzidîyatî, zerdeştîyatî û Hido-Îraniyên kevn, bawerî bi ruhveguhaztinê (donadon) heye. Berdewam- bûna jiyane jî piştî mirinê, meseleyeke mîsoger e. Veşartin di gorrê de jî, anku mala ruhê piştî mirinê.

### **Ga**

Baweriya xwedênenasên kevin xuya dike ku mirina Ga, pêwîstiyek bû û tevayî heyberan (kaînat) û şînayî ji xwîna wî gayî şî û peyda bûne. Ev helkeftin vedigere qurbaniya salane ya Mîtra(Mithra) ji bo nûkirina jiyane û hatina bihareka pîrr bi giya û çerwaneke mişe, ji bo giyandaran. Ev aheng di payîzê de, dihate kirin. Heta niha jî êzidî ahengê di vê cejnê de dikin û ew li cem wan, ji cejnên mezin e ku dibêjin "Cema" û di dawiya demsala payîzê de tê kirin. Ahengên vê cejnê bi dirêjîya heft rojan, her ji 23yê Îlonê û heta yekê Çiriya Pêşîn (Tîşrîna Ewel) berdewam dibe. Di roja çarşembê de, li ser çiyayê Laleşê, li cem gorra Şêx Şemsî, ku yek ji xwedênasên navdar e û serkêşê êzidiyan e, Ga serjê dikin. Mebesta wan ji pêşkêşkirina Gayî ew e, ku destnîşana dawiya payîzê dikin û daxwaza hatina zivistaneke têrbaran

ku giya û şînahiyê ji heywanan re (çavkaniyên bingeîn yên jiyana wan) şîn bike. Ev jî, her ew Ga ye ku pêşkêşî (Appolo)yî kirî û Ga jî, sîmbola Çiriya Pêşîn e di stêrzaniyê de.

Li cem neteweyên Hindo-Îranî yên kevin, dema Ga serjê dikirin, agir hil dikirin û stiran jî digotin. Ev adet gihişte nav êzidî û zerdeştîyan jî. Li cem êzidîyan dehol û zirnayê lê dixin û stiranên olî jî tene gotin, agirî hil dikin û goşt dibirêjin û digel dankutê (simatê) li ser xelkê belav dikin.

Sal di nav gelên Hindo-Îranî de, ji 360 rojan û 12 mehan pêk dihatin. Her mehekê ji 30 roj û salekê jî, ji du demsal pêk dihatin: Ji biharê heta payîzê; ji payîzê heta biharê.

Ji wan re digotin, "Demsalên Xwedê". Di demsala yekê de, aheng di nav xweza û keskahiyê de digêran û bi helkeftina dawîbûna erkê salê, yê ku Mîtra jê berpirs e, ku wezîfe û erkê wî şînbûn û bergirtina rez, dehl, dext û danî ye. Lewre jî Ga pêşkêşî Mîtrayî dikirin. Heta niha jî, êzidî vê cejnê pîroz dikin û bi cejna "Serê Salê" nav dikin. Xelk malên xwe bi gul û çiçekan dixemlînin û di wê baweriyê de ne ku Tawûsê Melek wê di wê rojê de wek cîgirê Xwedê bête ser erdî û ji ber hindê jî, qurbana pêşkêşî wî dikin.

### **Ahoramezda**

Di ola Zerdeştî de, Ahoramezda parêzgarê xelkî ye. Di nav firîşteyan de wî bi tenê şîya hêza hîlbijartinê di navbera toxmê başî û xirabiyê de bikar bîne. Her ew bû di berê de, yê ku karî hîlbijêre û bikar bîne.<sup>(13)</sup>

Ev hizir nêzîkî çîroka dirustkirina gerdûnê û rola Tawûsê Melek e. Çûnke wî bersiva rast da Xwedê, dema jê re gotîye,

"Sucdê ji bo Ademî bike". Îna Xwedê ew xelat kir û pileya wî bilind kir û kire serokê tevayî firîşteyan. Ev jî mîna rola Ahoramezda ye, ku serokê esman-av-erd-sînahî-giyandar û mirovan e.

### Mirov di Zerdestî û Êzidiyatîyê de

Dualîzm baweriyê bi revîn û şkestina hêza xirabiyê beramberî hêza başiyê tîne û li dawiyê jî, serketina Ahoramezdayî. Ev jî, ew armanc e ku tevayî gerdûnê li bendê dimîne û ev serketin jî têgehistina Xwedê dupat dike û bi vê çendê, ola zerdestî dibe ya çêker û pêşketî. Meseleya başî û xirabiyê li cem zerdestîyan bi wîjdan, sinc û rewîştên mirovî ve girêdayî ye. Eger mirov têgihiştî be, ew dê riya başiyê hilbijêre û nezan be, ya xirabiyê. Ev ravekirin jî wek ya li cem êzidiyan e, dema ku dibêjin, başî û xirabî di mejî û wîjdana mirovî de ye. Ev jî li ser mirovî diraweste ka kîjanî dihilbijêre û çend bi Tawûsê Melek ve girêdayî ye, yê ku berê mirovî dide başî û rastiyê, çunke Xwedê jî mafê hilbijartinê dabûyê. Ravekirina vê çendê jî, bi hebûn û peydabûna taqet û şîyanên mirovî ve ye, ka heta çi pileyê dê bi kawdanên dorûberên xwe ve daxbar be, ku bibe mirovekî, -e baş yan jî xirab. Amojariyên zerdestiyê, li ser meseleya kesayetîya mirovî, roja dawiyê û riya rast, karekî mezin li ser ola êzidî, cihû, fileh, musulman û teoriyên xwedênasiyê, yên gelek zana kiriye. Zerdestî karekî mezin li ser guherîna ola êzidiyan kiriye, nemaze li ser rewşa naveroka navxwe ya cejn, adet û rewîştên wan.

Şêx Adî hat da ku guherînan di pêkanîna dirustkirina derve de bike, wek danîna sîstema herêmî û dabeşki-

rîna êzidiyatîyê li ser gelek pileyên olî, bêtî ku bikare naverok û felsefeya wê biguherîne, çunke şûnwarên kevin her man û kar û senga (giranî) wan jî, di jiyana rojane de her man. Lê digel hindê jî, em dikarî Şêx Adî û Zerdest bi du çakîker û serkêşên olî yên mezin bizanin, nemaze eger em temaşayê wê rewşa aloz û xeternak a ku çaverêyî ola Êzidiyan dikir bikin, dema musulman hatine deverê.

Em dikarî pêngavên Şêx Adî bi yên şoreşger bizanin, nexasim di wê dema berteng û tirsînak de, ku wî şîya vê ola kurdî ji vebirrandinê rizgar bike. Li dawiyê, eger zerdestiyatî oleke dualî be, êzidiyatî yekînî ye (wehdanî ye) û ew oleke metiryalî ye pêtir ji yê mîtafizîkî.\*\*

### Têbînî û Çavkanî

\* Mesele li ber Rudolf Frankî têkel bûye, çunke heta niha ne aşkera bûye ku her du pirtûk yên Şêx Adî ne. Şêx Hesenê kurrê birayê wî, *Cilwe* nivîsiye û dibêjin ya din jî Şêx Adî nivîsiye.

\*\* Ev gotar di kovara *Roşinbîriya Nû* de, hejmar 243, rûp 101- 111, bi zimanê erebî, belav bûye. Min jî di kovara Çira, hejmar 13, sala 1998î de belav kiriye (X. Duhokî).

1. The Encyclopedia of Religion, rûp 503.
2. Her ew çavkanî, rûp 319.
3. Rudolf Frank: Scheich adî/der grosse Heilige, Berlin, Mayer und muller. 1911, rûp 103.
4. Her ew çavkanî, rûp 8.
5. Yaqot Elhemewî di ferhenga wî ya cografîyê de. Di ( 626 koçî - 1229 zayînî) de miriye.
6. Îbin Elesîr, pirtûka wî, ji rûdanên dîrokê, di 630 koçî - 1233 zayînê de miriye.
7. Margaret Smith: Studies in Eearly mysticism in the near of middle East the shekdon press, London 1931, rûp 161.
8. Roger Lescot: Enquete sur les yezidîs De syrie et du djebel Sindjar. Beyrouth 1938, rûp 232.
9. E. S. Drower: Peacot Angel, London; John Mukry 1941, rûp 92.
10. R. C. Zaeher: The Dawn and Twilight of Zoroastrianism weidenfeld and Nicolson 1961, rûp 34.
11. Mary Boyce: AHistory of Zoroastrianism, Vol 1, leiden K-ln.E J. Brill 1975, rûp 29
12. Her ew çavkanî, rûp 233.
13. Her ew çavkanî, rûp 226.

# "MISHEFA REŞ" BI ZAR DI NAV SÎSTEMA QEWL Û BEYTÊN ÊZDIYAN DE

Prof. Celîlê Celîl

Li dawiya sedsala XIX û destpêka sedsala XXan ji aliyê zanyaran ve du pirtûkên êzdiyan ên pîroz ketin destê xwendevanan. Yek ji wan *Kitêbî Celwe* bû, ya din jî *Mishefa Reş*. Nivîsara van her du pirtûkên xef (sihrî) hatin xwendin û bi pirtûkekê tevî wergera wan a bi zimanê almanî û bi weşandineke lînguîstîk ve bi destê rohilatnasê Awusturyayî Martîn Hartmann di sala 1913an de li Wiyanyê hatin belavkirin.<sup>1</sup>

Ev her du pirtûk bi naveroka xwe balkêş bûn. Balkêşiya van destnivîsan ji aliyê zanyariyê ve heta roja îro jî dom dike. Ev destnivîs ku bi zimanê kurdî hatibûn nivîsandin, heta nika li çend zimanan hatine wergerandin û li

ser wan çend lêkolîn û wutar (gotar) hatine belavkirin.<sup>2</sup>

Malûmatî li ser heyîna destnivîsa *Mishefa Reş* û *Kitêbî Celwe* di nav êzdîxanê de tune bûye. Şêx û pîrên êzdiyan li ser van pirtûkan qal nekirine. Bawer dikim belkî di nav oldarên êzdiyan de jî kêr meriv hebûne ku li ser van her du destnivîsan haydar bûne. Tê famkirin, ku xwendina van nivîsaran qedexa bûye, ji ber ku tîpên nivîsa van pirtûkan bi

<sup>1</sup> Bittner M. Die heiligen Bücher der jeziden oder Teufelsanbeter (kurdisch und arabisch). Denkschriften der Kaiserlichen Akademie der Wissenschaften in Wien. Philosophisch-Historische Klasse. Band LV. Wien 1913.

<sup>2</sup> Jakob G. Ein neuer Text über die Jezidîs. "Beiträge zur Kenntnis des Orients. Halle., 1909. Bd. 7. S.30-35; Joseph Isya. Jezidi textes. "American Journal of Semitic Languages. Chicago. 1909.Vol. 25, Nr. 2-3. P.111-156, 218-254; Anastase M. La découverte récente des deux livres sacrés des Yézidîs. "Anthropos". Wien, 1911. Bd. 6.S. 1-39; Bittner M. Die beiden heiligen Bücher der jeziden im Lichte der Textkritik. "Anthropos". Wien 1911. Bd. 6. S. 628-639; Joseph Isya. Devillworship: The sacred books and traditions of the Yezidis. Boston, 1919; Mingana A. Sacred books of the Yezidis "Journal of the Royal Asiatic Society of Great Britain and Ireland". 1921. January. P. 117-119

xef bûne û him jî axaftina li ser wan qedexe bûye.

Bi giştî li ser êzdiyatîyê hemû rohilatnas, dîplomat, rêwî, dost û nedostan nivîsîne.<sup>3</sup> Pirtûk û wutar bi zimanê fransî, almanî, îngilîzî, îtalî, rûsî, ermenî, erebî, tirkî û her wiha bi gelek zimanên din çap bûne, lê piraniya wan her tenê li dora ola êzdiyan zivîrîne û bi zanîna xwe di kûrahiya bîrûbawe- riya êzdiyan de nikaribûne niqov bibin. Ji ber vê jî li ser êzdiyan û ola êzdiyan gelek tiştên nerast û bêbingeh hatine nivîsandin.

Piştî çapbûna *Kitêbî Celwe û Mishefa Reş* li bal zanyaran hêvî peyda bû ku ji vir ha de kêmanîna li ser parastina êzdiyan dê ji holê rabe. Di salên paşwextiyê de lêkolîna li ser êzdiyan û parastina êzdiyan bi çalakî pêş ve çû û pirtûk, wutarên nû yên balkêş çap bûn. Lê dîsa jî valahiya mezin di zanîna bingeha ola êzdiyan de berdewam dikir. Êzdiyatî dima veşartî.

Di salên sîhî de rohilatnas Roger Lescot li Sûriyê xwe xerîk kir li ser lêkolîna êzdiyatîyê. Di encamê de lêkolîneke giranbiha belav kir.<sup>4</sup> Di pêşgotina vê pirtûkê de Roger Lescot da xuyakirin, ku zanîna êzîdîzmê dê nîvco be, ne tam be, heger qewl û beytên êzdiyan neyên vekirin.

Baweriya Roger Lescot bêbingeh nîn bû. Xezîneya qewl û beytên êzdiyan ew bingeh bû, ku hemû qeyde-qanûn û qirarên rewşa êzdiyatîyê, filosofî û jiyana civakî tê de wek kodêksa tam bi zar (devkî; ne nivîskî) ji bo parastina

ola êzdiyan ciyê xwe girtibû. Şertê girîng ji bo jiyandariya qewl û beytan, ew qedexebûna nivîsara wan bû. Divêt hemû bi zar bihatana parastin. Ev şert ji karaktêra xefîbûna ola êzdiyan dihat, mecalek bû ku bingeha ola êzdiyan nekeve destê kesên ne êzdî.

Ji bo ku qewl û beyt li dem û dewranan bijîn û wek destûra bingehîn di nav civaka êzdiyatîyê de bêguhastin bimînin, sîstêmeke taybetî hatibû avakirin û çînekî taybetî jî -Çîna Qewalan- ji bo xizmeta ber vî karî hatibû avakirin.

Tabû ji ser nivîsara qewl û beytan îro jî bi rişma olî nehatiye rakirin. Rola qewl û beytan di jiyana êzdiyan de hê jî bi giranî maye. Lêbelê ji ber guhastina şertên sosyal-aborî di nav êzdîxanê de di bin bandora diywariya jiyana polîtîk û gelêrî de li dewletên Rohilata Nêzik, civaka êzdiyatîyê îro gihîştîye dereceyeke nû; jiyana xwe cudakirinê, xwe veşartinê ji bo parastina ola êzdiyan êdî qels bûye, kêrhatî nîn e. Rêmecalên (derfet; îmkan) nû vebûne ji bo peywendîyan (komunikasyon) li navbera xelqê dorûberê û li navbera gel û dewletên dînyalikê.

Xwendin û nivîsandin di nava êzdiyan de qedexe bûye. Viya jî şertekî giring bûye, ku parastina êzdiyan bêbandor û paqij maye. Tevli vê, di nîveka sedsala XXan de eşkere bû ku jiyandariya qewl û beytan di nav oldarên êzdiyan de di bin xeterê de ne, pir zeyîf û kêmtir bûye. Di civakên êzdîxanê, ku bi sînorên asê ji hev qutbûyî bûn, zanayên bingeha qirarên êzdîyatîyê, talib û hostayên qewl û beytan bi tek û tûkan mabûn. Gotina min bi taybetî li ser êzdîxana komarên Sovyêtê û Sûriyê ye. Lêbelê çawa ev her du civak,

<sup>3</sup> Binhêre J.S. Mûsaelyan "Bibliografiya po kûrdovêdenîyû". T. I, II, Sankt Peterburg 1966.

<sup>4</sup> Lescot R. Enquête sur les Yezidis de Syrie et du Djebel Sindjâr, beyrouth, 1938.

wisa jî pê re civaka êzdîxana Îraqê, berebere ber bi ronakbîriyê ve diçû, di riya perwerdeyê de ber bi hêlanên zan-yariyê ve diçû. Jiyana nû şertên nexwendewariyê ji navberê radikir.

Di salên 50-70 ên sedsaliya XXan de xwendewarên pêşîn ji nav êzdiyan xizmeteke mezin ji gelê xwe re, ji zanistiya cihanê re kirin. Wan bala xwe dan ser zanyariya zengîn a li ser qewl û beytan. Di van salan de li du ciyan, li Ermenistanê û li Îraqê ji hev bêxêber entelektuelên êzdiyan dest bi civandina qewl û beytan kirin.

Ew bûn salên girîng, merheleya pêşîn di karê berhevkirina qewl û beytên êzdiyan de. Li Îraqê Xelîl Cindî û Xidir Silêman bi çelengî dest bi civandina qewl û beytan kirin û du pirtûkên hêja raberî xwendevanan kirin.<sup>5</sup> Li Sovyêta berê bi destê Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîl ji nava êzdiyên Ermenistanê, Gurcistanê û Sûriyê dora 166 qewl û beyt hatin civandin, ji vana 56 çap bûne.<sup>6</sup>

Qewlê Qerefirqan di nav sistêma qewl û beytên êzdiyan de di cêrga qewlên giran û beranî de cî digire. Balkêşiya vî qewlî ji navê wî dest pê dike. "Qere" peyveke tirkî ye bi manaya reş de ye û "Firqan" (bi almanî - offenbarung) peyva erebî ye, ku di dîne îslamê de wek pirtûka pîroz, êpîtêt ji bo Quranê tê karanîn. Tê manaya zanîna li ser jiyana û bendan, ku ji bal Xwedê hatiye û ji wan re bûye qiyasa bêşik û şibhet. Peyva "Firqan" kar tînin wisa jî li ser berhevdana

(muqayesekirina) qewl-qirarên ku ji bal Xwedê derketine û pêşiyê bi zar (devkî) hatine parastin û paşê ketine nav defteran, wek mînak em bibêjin Talmûdên yahûdî, Bavên kinîsê di xaç-parêziyê de, yan jî ku ji hedîsan pêk hatiye di Îslamiyetê de.

Navlêkirina *Mishefa Reş û Qewlê Qerefirqan* manaya wan yek e; yanî, deftera reş, pirtûka reş. Her du gotin jî ji bo pirtûkên pîroz tene karanîn.

Ji bo berhevdana *Qewlê Qerefirqan* û berhevdana wê bi pirtûka *Mishefa Reş* re li ber destê me sê şaxên vî qewlî hene:

1. Li sala 1976an li Ermenistanê, li nehiya Hoktêmbêryanê, gundê Tsaraşatê, ji Memê Şêx Reşo me girtiye. (24 sebeq in).
2. Li sala 1982an li Sûriyê li qeza Efrînê li gundê Erşîqîbarê ji Şêx 'Elî me girtiye. (58 sebeq in)
3. Li sala 1999an li Dihokê Herêma Kurdistanê (Îraq), ji Şêx 'Elî me girtiye, yek wî li sala 1995an ji qewal Xidir hilda bû. (52 sebeq in).

Çavkaniya van hersê qewlan yek e. Cudatiya navbera van her tenê li ser kûvîkirina (di êzdîyatîyê de jibîrvekirina sebeqan) hinek sebeqan e, yan ji guhastina hinek peyvan e.

Şaxa pêşîn, ku li Ermenistanê me nivîsiye gelek sebeq ji nivî zêdetir jê winda bûne. Cudatî di navbera her du şaxên din de kême.

Jiyandariya vî qewlî li sê herêmên êzdînişîn, di nava sê birên êzdîxanê de: li Ermenistanê, Sûriyê û Îraqê, şahidiya vê yekê dide ku Qewlê Qerefirqan heta roja îro jî giringiya xwe, kêrhatina xwe ya fonksiyonal li nav gel winda nekiriye.

*Qewlê Qerefirqan* bi stîl û struktura

<sup>5</sup> Êzdîyatî li ber roşnaya hindek têkêstêd ayînê êzdîyan.. Bexda, 1979 ; Xidirê Silêman, Gundîyatî. Bexda 1985. [Bi tîpên erebî]

<sup>6</sup> Zargotîna kurda, kitêba I, Yêrêvan 1978. [38 qewl û beyt bi tîpên kirîlî]; "Zargotîna kurda", cîkda. II, Moskva 1978 [18 qewl û beyt bi tîpên latînî].

sêwirandinê, ziman û forma pêkanîna helbestiyê (nezm), li nav sîstêma qewl û beytên êzdiyan, ji yên mayîn cuda nabe. Dêmek krîterên eşkerekirina dema sêwirandina vî qewlî û yên mayîn yek in. Li ser vê bingehe em dikarin dema sêwirandina "Qewlê Qerefirqan" sedsalên 12-14an nas bikin.

Pirtûka *Mishefa Reş û Qewlê Qerefirqan* bi naverok ne wekhev in. *Mishefa Reş* ji destpêkê şîrove dike ka dinya çawa çêbûye. Gorî wê, beriya ku dinya ava bibe cewahirek hebûye, ew cewahir çil hezar salî li ser piştê teyrê Enqer maye û paşê ji dengê Xwedê li ser çar ciyan parçe bûye. Yek bi yek dinivîse, rojên çêbûna her heft mêrên dîwanê. Bi kurtî disekine li ser avakirina gemiyê û hatina Xwedê tevî her çar melean ve li Lalişa Nûranî û cîgirtina muqedes li ser erdê.

Kurtaya behskirina ser çêkirina hêmu mêr û melean, çîroka ser Adem û nav bi nav bîranîna tiştên qedexê ji bo êzdiyan, her wisa rokirina navên padîşahên ku li Rohilata Navîn ji kevnedemê ve hukumdariyê kirine, me tîne li ser wê şikberiyê, ku ev pirtûk li demeke dereng bi destê zaneyekî qirarên ola êzdiyan hatiye nivîsandin.

Dema em hemû pirsên ku di vê pirtûkê de cî girtine didin ber hev, em dibînin ku di bingeha wê de navaroka çend qewlan cî girtiye.

Çi ye navaroka *Qewlê Qerefirqan*?

Qewl bi motîva ku bi tîpolojî û xusûsiyeta sêwirandinên sofîstiyê pê re heye, dest pê dibe. Di qewl de guftûgo li ser heqîqeta axaftina padîşah e, ango Xwedê ye, li ser faktoreke girîng ji parastina êzîdiyatîyê: kifşkirina cî û girîngiya xerqe, sîmbola sofîzmê ya

mezin.

Di nav sofîzmiyê de dogmayeke bingeîn e, gava ku xas û ewliya, sofiyên şkestî sewda dibin û li wan peyda dibe hal (êkstaz), hingê ji vê dinyayê diqetin û digihîjin heqîqetê.

Her du sebeqên qewlê yên pêşîn ev in:

*Sibekê sewda bûm,  
Hal il min peyda bû,  
Ewil heya axir padşayê min xuya bû.*

Di hal de li ber kesê êzdî sibeheke pîroz vedibe, roja ku ulm, berat, xet û mişûr ji ezmanan nazilî ser erdê bûne.

*Li min xuya bû çi sibeke sor e,  
Padşayê min nazil kir ulm û berat, xet û mişûr e.*

*Ya dewrêş kerem ke, padşa te dixûne jor e.*

Kî ye ew dewrêş? Dewrêş Melek Fexredîn e. Li *Mishefa Reş* derheqa wî de tê gotin (sebeqên 8-9) ku ew yek ji heft melekên dîwanê bûye, ku Xwedê li roja şenbeyê (şemî) Melek Turayîlî xulq kir, ku Fexredîn e. Fexredîn însan û heywanên ruhber, teyr û wehş xuliqandin û li berîka xerqê danî û tevli melekekê ji cewherê hate der.

Qewl ji vir wê de li ser axaftina Melek Fexredîn li gel Xwedê ava dibe. Sebeqên *Qewlê Qerefirqan* bi rengê pirs û bersivan pey hev ro dibin. Ev diyalog heqîqeta xerqê û dewra wê di ola êzdiyan de tîne zar (tîne ser ziman) û dibe destûr ji bo naskirina girîngiya libasên xasan û sofîyan.

Mêtođa karanîna diyalogê, pirs û bersiv di edebiyata olparastiyê de, li cem gelek mîletan karaktêrekî meşhûr û naskirî ye. Bi vê mêtođa dogma û

qanûnên diyanetê bêhtir bi zelalî û konkrêt têne eşkerekirin.

Fikir wek çîrok, bi makkirin (ispatkirin) nayê gotin. Ew çawa frazayên (biwêj; îdyom; derbulmesel) kamil û ciyê xwe girtî têne raberkirin. Forma axaftinê ji navê Xwedê û pê- xemberan, wek axaftina ji devê wan derketî, ew ferzdogmayên diyanetê ji bo qebûlkirinê û peyçûnê bêhtir bihêz û erhede (bivê-nevê; îlla; garantî) dikin.

Pirsa Melek Fexredîn li ser xerqê, bi diyaloga di navbera wî û Xwedê de dest pê dibe: Melek Fexredîn pêş padşahê xwe vediweste û pirsyarekê jê dike:

*Îlahiyo, wehdil qehar heqîqet e,  
Muhbeta ib te ra bû, te çi jê dikete?*

Bersiv, eşkere dike, ku muhbeta Xwedê ew xerqe ye.

Sebeqên ku li pey vê tîn, berebere cî û dereceyên xerqê di nav ola êzdiyan de didin vekirin.

Beriya ku em li ser xerqê bisekinin, divêt em careke din vegerin ser sebeqa duduyan, li ku dibêje ku ulm û berat, xet û mişûr ji esmanan nazilî ser erdê bûne. Çi mana hebû ku hema ji destpêkê, beriya ku ji xerqê xeber bidin, van her çar tiştên pîroz ji bo ola êzdiyan bi bîr tînin:

1. *Ulm* - ew zanîn e: zanîna rênîşanên êzdiyatîyê. Ulmê êzdiyan bi riya qewl û beytan, bi makkirina wan vedibe. Dêmek, ji ber ku ew ulm bi destûra Xwedê hatiye şandin bo êzdiyan, ew tişteki pîroz e, ew qewl û beyt divêt neyên guhastin, neyên nû ve çêkirin.

2. *Berat* - ew nîşan e: divêt li cem hemû êzdiyan hebe. Berat ji axa gelîyê Lalişê, rengvekirî û bi ava *Kaniya Spî* tê

honandin, biçûk in, bi girbûna nokan e. Fonksiyona wan li cem êzdiyan wek xadiman e û di nav êzdiyan de wek nîşana êzdiyatîyê tê naskirin.

3. *Mişûr* - Deftereke destnivîs e. Di nava êzdiyan de gelek car li ser wê tê axaftin, lê bawer dikim kesî heta nika mişûra rast nedîtiye û venekiriye. Mişûr ji gotina erebî "maşwara" tê û bi manaya şêwr û nesîhetê tê famkirin, yanî, Deftera Nesîhetê. Nesîhet di nav parastina êzdiyan de ciyekî girîng digre. Bi riya nesîhetan bingeha moral, etîk û normên jiyana êzdiyan tê avakirin. Beyteke taybetî li ser nesîhetê û gelek sebeqên serbixwe ji keşkûla (berhevok, cihê ku felekê tişt civandine) nesîhetê hene. Bend-xanên nesîhetê di axaftina her şêxekî û her pîrekî de di nav êzdîxanê de têne gotin. Xaşxanên (bend-xanên) nesîhetê ji hev cuda ne, dikarin serbixwe jiyandar bin. Civandineke mezin ji bend-xanên nesîhetan li pirtûka "*Zargotina Kurdan*" hatine çapkirin.<sup>7</sup> Hêjayî gotinê ye, ku gelek xaşxanên nesîhetê di nav êzdiyan de wek nivîsarên klasîkê edebiyata kurdan Feqiyê Teyran tên naskirin.

<sup>7</sup> *Zargotina kurda*, Kitêba 1, Yêrêvan 1978, rûyên 132-142.

4. *Xet* - Bêşik bi gotina xet tiştê nivîsar tê famkirin. Lê çi ji sebeqa pey tê her em serwest dibin ku ew xet, Xeta Reş e:

*Çi sibeke geş e,  
Padşayê min nazil kir xetekî reş e,  
Ya dewrêş, kerem ke, padşa te dixûne  
il erş e.*

Ji vê gotinê em tîn ser wê fikrê ku

axaftina li ser nivîsandina bi tîpên reş e. Meriv dixwaze bawer bike ku ev gotin li ser *Mishefa Reş* e. Gelo ev dîtin rast e yan na, em li vir vê bihêlin, ku paşê lê vegerin. Lê nika em cardin bêm li ser diyaloga di navbera Melek Fexredîn û Xwedê de. Ji pirsiyara Melek Fexredîn em pê dihesin ku xerqe ji muhbeta Xwedê çêbûye. Ev zanistî angorî filsofiya dogmayên sofizmê ye. Kesê ku xerqê feqîran ber kiriye ji jiyana baş xwe mehrûm kiriye û li temamiya rojê xwe bi ebabeta (îbadet, perestîn; lavakirin) Xwedê gîro kiriye, xwe pêşkêşî navê Xwedê kiriye - ew li ber dilê Xwedê hizkîrî ye û qenc e, kirina wî bi dilê Xwedê ye. Xerqe şahidiyê dide ku xudanê wî li ber rehm û kere-ma Xwedê ye û ew hêjayî evîna Xwedê ye. Gorî qewlê êzdiyan xerqe ji eslê xas e. Ew li esmên pêşiyê berga melean û mêrê xas bûye. Şêx Adî, Şêx Hesên, Nasirdîn û Sicadîn, her çar mêrên ku tevli Xwedê li merkebê siwar bûne, wana ber kirine (li xwe kirine) û hatine Lalişê û paşê bi daxwaza Xwedê nazilî ser erdê bûne. Him xerqe, him havêna wê: Kaniya Spî pêşiyê li esmanan bûne, li wê derê hatine fesilkirin û morkirin. Dêmek ewana bi bingeha xwe ve pîroz in. Pîrê xerqê Sultan Êzîd e.

Bi saya diyalogên di navbera Melek Fexredîn û Xwedê de li ber me xaleke girîng vedibe. Gelo çi ye dewr û fonksiyona xerqê di nav sîstema pêkhatina civaka êzdiyan de?

Melek Fexredîn dipirse:

*-Ezîzê min, te da ser herfa kafîr û busulmane,  
Te nazil kir rûyê va erdan e  
Encîl, Tewrat, Zebûr û Quran e,  
Sunetxane bi çi êtin şehdeyî û îman e?*

Di şaxa qewlê ku li Ermenistanê me nivîsiye manaya vê sebeqê pîrsa Melek Fexredîn dîsa zelal û eşkere tê danîn:

*Şêx Ferxê Adiya padşê xwe deyn dike xeverdan,*

*Go:- Ezîzê min, te daye ser peşka heman cuhyê, file ye, surman e,*

*Daye destê wana Încîl e, Tewret e, Quran e,*

*Lê ew ometek ometa me ye, wê pê çi bîne bawerî û îman e?*

Dêmek Melek Fexredîn dipirse dêvla van pirtûkên pîroz ên di nav êzdiyan de wê çi cî bigre? Dewsa wan pirtûkan ji bo êzdiyan du tişt têne navkirin: Qewl û Xerqe. Bi nezera pêşin ev her du atrîbûtên (tiştên pîroz) girîng: Qewl û Xerqe, nêzikî hev nîn in û nayê bawerkirin ku ewana dê ciyê Quranê, Încîlê, Tewretê (Talmûd) û Zebûrê bigrin:

*We dibêje padşahê min xudan arkan e:  
- Belê Fexro, ez ê nazil kim rûyî va erda qewl û xerqe ne,*

*Sunetxane dê pê êtin şehdeyî û îman e.*

Girîng e em di bîra xwe de xweyî bikin, ev peyvên ji navê Xwedê gotî, ku wî xerqe û qewl şandine ji bo ku ew li nava êzdiyan ciyê van pirtûkan bigirin. Şik tê tune wek bi zanîna qewla oldarên êzdiyan dibin xwediyê dengiza (deryaya) zanînê. Di nav êzdiyan de cî û fonksiyona van pirtûkan divêt zengîniya zanîna qewl û beytan, parastina pîroziya xerqê bigire.

Çi ye dewr û fonksiyona xerqê? Pêşiyê em bisekinin li ser berhevdana çêkirina Xerqê li ser rûyê erdê, wek ew li *Qewlê Qerefirqan* tê zaranîn. Xwedê gotiye:

*Wa dibêje padşahê min î nûranî ye:  
-Belê Fexro, ez ê xuliqînim sê tiştê  
qîmetî ye,  
Mêş e, zergoz e, mî ye,  
Havênê hersêka ij Kaniya Spî ye,  
Ij mabênê miyê û zergozê çêkim  
xerqe ye.*

Ji van hersê navan: mêş, zergoz û mî, dewra mêşê di çêkirina xerqê de me nedît, tune. Çi ye zergoz û çi ye girîngiya wê? Zergoz navlêkirina darekê ye ji cinsê darên palûtê gûzan e. Wek li ferhenga Hejar em dixwînin, zergoz cinseke dara gûzê ya bêber e. Ji dîroka gelê kurd belî ye ku çiyayên Kurdistanê, xasma çiyayên Zagrosê li aliyê Kurdistanê Îranê, bi cinseke darekê gelek dewlemend bûye, bi rûsî jê re gotine, "Çêrnîlniyê orêşkî", yanî, "Guzên hubrê" û ew bûye yek ji wan madena ku tucarên Rûsyayê bol-bol (gelek; pirr; zêde-zêde) kirîne û birine ji bo firotanê. Ji bo çêkirina rengan kar anîne. Jê rengê reş, rengê hubra reş çêkirine. Bi almanî navê vê darê "Tintêbaum" e, yan jî dibêjin "Markfruchtbaum" (Latînî: Sêmîkarpûs). Ev dar li rohilatê Hindistanê pir bûye. Dêmek dara zergozê, êzdiyan kar anîne ji bo rengdana xerqê.

Xerqe honandine ji hirya pêz, mî di vî qewlî de tê navlêkirin ji bo hiriya pêz. Di qewla ku me li Ermenistanê nivîsiye, di sebeqa 20an de dibêje:

*Padşayê min go:  
- Koro, te çev bin spiye,  
Tu nizanî m'eniya vî xerqeyî çiyê?  
Hinek zergoz e, lepek hiriye.*

Bi tradîsyona çêkirina xerqê,

morkirina wê, yanî şûştina wê, gerek bi ava ji Kanya Spî be. Ji ber vê jî di qewlê de tê gotin ku havêna wî Kanya Spî ye.

Berkirina xerqê li feqîran e. Feqîr di civaka êzdiyan de wek kesên pîroz li ser rûyê erdê tîn jimartin, ji ber ku li wana lîbasa tiberik, lîbasa mêran, melekana û xasana e. Gorî sebeqa 45an: "Feqîran fikir ber xwe, Sunetxane dê pê êtin behwarî û şehde ye."

Li Qewlê Qerefirqan tê makkirin, ku navê feqîriyê ji destê Melek Fexredîn hatiye wergirtin, heqê berkirina (lixwekirina) xerqê li feqîran bi destê Melek Fexredîn bûye. Zergoz jî ji bo morkirina xerqê ji destê wî derketiye.

Di civaka êzdiyan de ji roja ku hed û sed hatiye danînê, cî û wezîfeya her grubeke oldaran; şêxan, pîran xuya ye. Ji bo parastina civakê her yek ji wan fonksiyoneke oldariyê diqedîne. Xuya ye, wisa jî wek jiyana wan a sosyal-aboriyê ser wê xizmetê bûye. Nebelîbûyîna dewra feqîran li civaka êzdiyan pîrsek bû, ku hewceyî safîkirinê bû. Ji ber vê jî li *Qewlê Qerefirqan* pîrs pês de tê û em makkirina vê pîrsê jî dibînin. Di sebeqa 52an de dixwînin:

*Padşê min hukmê xwe î rewya ye,  
Ij ba wî we dia ye,  
Da destê şêxa bisk û meqes e,  
Da destê pîra fitir û zekat e,  
Hinekî dilê xerqe il wê maye.*

Padşa (ango Xwedê) dilê xerqê û feqîran nahêle ku bimîne. Bi hukmê Padşê dewra feqîran di nav civaka êzdiyan de ji hemû oldaran jortir e. Şêx, pîr û mirîd divêt tewafî ber xerqê bin û bêne dest û damina (daw, pês; etek) feqîran, ji ber ku wan lîbasên mên û melekana ber kirine. Bi ferwara Xwedê sunetxane dive xerqe ji xwe re wek

îmanê nas bike. Neguhdarî, kêmanî himberî feqîran û xerqê gunehkariyeke mezin tê dîtin. Sebeqa 54an dibêje:

*Padşa dibêşte: - Fexro xerqe îman e,  
Hinçî il kêşa xerqê Şîxadî ib şik e, ib  
guman e,  
Dê ib çeplê wî bigrin bavêjin nav sefê  
neyaran e,  
Ciyê li axretê biora wejiwartî tang e  
û tûng e, doj e, cehnîmî ne, reml e û  
qetran e,  
Heta ebadên ibin ebad ew der ciyê wan e.*

Joriya (bilindahiya) ciyê feqîran beranberî şêx û pîran di civaka êzdiyan de gelek bi êşkere ye. Lê cî, dewr û rola feqîran li civakê çi ye? Jiyana bi teherê sofîyan, feqîr, destqetandiyên (destvek-işandiyên) ji jiyana baş û hêsan, ev hemû bingeheke mezin bûye, ku hurmeta van kesên feqîr li nav civaka êzdiyan bibe herî meqbûl. Zanîna qewl û qirarên diyanetê, jiber zanîna qewl û beytên ola êzdiyan, makkirin û bervedana wan ser hurmeta navê feqîran, navê taliban û zanyaran jî zêde kiriye. Feqîr bûye sîmbola baweriyê, îmanê. Ji ber vê jî, xerqe û qewl bi tevayî di bin ew rikna girîng ku wek pirtûkên pîroz: Quran, Încîl û Tewret in di diyanetên başqe de, li nav êzdîxanê cî bigrin. Ji vê em têne ser wê rastiyê, gelo çima qewl hatiye navkirin? Qewlê Qerefirqan? Ji ber çi ev nav cî guhastî bûye li ser pirtûka destxet bi navê Mishefa Reş?

Rengê spî di nav sofîzmê de rengê pîroz e. Ew reng bûye sîmbola spehîtiyê, paqîjiya jiyane û fikrên wan. Di civaka êzdîxanê de jî rengê spî wek rengê pîroz tê naskirin. Ji ber wê jî ji

êzdiyan re gotine "Miletê Cilspî". Rengê reş jî di civaka êzdiyan de pîroz e, ji ber rengê xerqê, cil û berg û serî girêdana feqîran. Rengê reş bûye sîmbol-şahidîtiya forma jiyana sofîyan, kesên ku bi dewrêşî û hejarî jiyana xwe domandine. Cil û bergên reş, libasên xasan û melean bûne, libasên wan mêran yên li şkeftên Lalişê xerqekirî, bi tac û hule, bi gulî û piştbanda bi rengê reş morkirî, salê duwanzdeh mehên jiyana xwe heta mirinê domandine. Seba vê gotine, xerqe îman e.

Cardin em vegerin ser peyva 'xet', 'xeta reş'. Gava di sebeqên 3 û 4an de hat gotin ku padîşah ji ezmanan nazil kir; ulm, berat, xet û mişûre, 'xet' bi zimanê kurdî du mana tê de hene, yek tîp; nivîsar, yek jî rê; ber bi alî ve, rêz, şov, xeta cot û hwd. Dema em biceribînin peyva 'xeta reş' navê qewlê jî 'Qewlê Qerefirqan' û xerqe îman e, bi hev re girê bidin û bidin ber hev, em dibînin ku Qerefirqan ji xerqa reş re hatiye gotin, xerqe bi xwe îman e, îman riya ol e, xeta ol e. Ev berhevdanî diha zelal dibe li sebeqên 42-43an, gava tê gotin, ku xerqe û qewl ji bo êzdîxanê dê bibin dewsa pirtûkên pîroz, wek Quran, Încîl û Tewretê ji bo musulmanan, xaçparêzan û yahûdiyan bûne. *Mishefa Reş* yan jî Furqana Reş di nav êzdîxanê de xerqe û qewl in.

Ser xerqe du qewlên din jî hene, ku me nivîsîne: Qewlê îmanê û Qewlê Xerqe. Di her du qewlan de jî hêjabûn û taybetiya xerqê tê pesinandin.

Ji berhevdana Qewlê Qerefirqanê bi pirtûka Mishefa Reş em tên li ser wê fikrê ku *Qewlê Qerefirqan* beriya *Mishefa Reş* peyda bûye û li paşwextiyê bûye bingeş ji bo pirtûka *Mishefa Reş*.

Beriya ku dawîya axaftina xwe li ser

*Qewlê Qerefirqan* bînim, daxwaza min heye ku careke din bala we bikşînim ser nirxa gencîneya kultura gelê kurd, ser qewl û beytên êzdiyan, mîrata zengîn ku zana û talibên gelê me bi sedan sal berê sêwirandine û sil-sile parastine anîne gihandine me.

Qewl û Beytên êzdiyan divêt bi çend mêzînan bêne pîvandîn:

a. Bi girîngiya wan a fonksiyonel û seramoniya, gorî xizmeta wan a ji ola êzdiyan re. Daxuyankirina wan wek destûra qeyde-qanûnên bingehîn ji bo jiyandarî û parastina civaka êzdiyatîyê.

b. Nirxandina Qewl û Beytan wek xezîneya bîr û bawariyê, filosofiya sofîzmê ye, bi awayeke kûr di nav kurdan de. Kûrbûna zanistîyê ku ji dewra xwe ya peydabûnê, sedsalên 12-14. diqete diçe digihîje dewra Zeradeştîyê û ji wê jî wêdetir.

c. Ser bingeha arkaîzma zimanê Qewl û Beytan vekirina îmkaniyeta dewlemendkirina zimanê lîteraturî û ferhenga peyvan.

d. Wek xezîneya lîteraturî ku li sedsalên navîn (12-14) li Kurdistanê bingeh girtiye û bûye dereceyeke bîreweriya berz, bûye neynika gulvedana hunera poêtîkayê (helbest, şîr) di nava kurdan de.

Sîstema Qewl û Beytan di çarçoveya olên, ku li dijî êzdiyatîyê bûne, dewra pirtûkan û zanyariyê lîstîye û civaka kurdên êzdî ji perîşanbûna entelektuelî û zanistî parastîye.

## **QEWLÊ QEREFIRQAN**

1.

Sibekê sewda bûm,  
Hal il min peyda bû,  
Ewil heya axir padşahê min xuya bû.

2.

Il min xuya bû çî sibeke sor e,  
Padşahê min nazil kir ulm û berat, xet û mişûr e.  
Ya dewrêş, kerem ke, padşah te dixûne jor e.

3.

Çî sibeke bi xilûr e,  
Padşahê min bo min nazil kir ulm û berat, xet û mişûr e,  
Padşah dibêje: "Ya dewrêş, kerem ke, padşah te dixûne li jor e.

4.

Çî sibeke geş e,  
Padşahê min nazil kir xetekî reş e,  
Ya dewrêş, kerem ke, padşah te dixûne li erş e.

5.

Çî sibeke bi qîmet e,  
Padşahê min bo min nazil kir ulm û berat, mişûr û xet e,  
Melek Fexredîn pêş padşahê xwe vediweste,  
Pirsyarekê jê dikete: "Wehdel qehar heqîqet e,  
Muhbeta bi te ra bû te çî jê dikete?"

6.

Melek Fexredîn pêş padşahê xwe vediweste, pirsyarek jê dikirî,  
- Îlahîo, wehdil qadir î,  
Berî binyan û erda, berî ezmana, muhbeta baxoê min çî bi te ra bû, te çî jê dikirî?

7.

Padşah dibêje: "Fexro, we ye,  
Erş û kursî kefa me ye,  
Muhbeta pê diperesim xerqe ye.

8.

Melek Fexredîn pêş padşahê xwe vediweste,  
Pirsyarek jê dikete,  
- Wehdil qehar heqîqet e, muhbeta ib te ra bû, te çî jê dikete?

9.

Melek Fexredîn pêş padşahê xwe vediweste, pirsyarek jê dikirî,

---

- Îlahîo, tu wehdil qirar î,  
Berî binyana û erda, berî ezmana, muhbeta baxoê min ib te ra bû, te çî jê dikirî?

10.

Padşah dibêje: "Fexro, we ye,  
Erş, kursî kefa me ye,  
Muhbeta pê diparêsim xerqe ye.

11.

Melek Fexredîn pêş padşahê xwe vediweste,  
Pê danî ser pê, dest ser dest e,  
Eseh cuwaba baxoê min durust e,  
Bedî nod hezar sal, muhbeta baxoê min çî ib te ra bû, me jî pê diparaste.

12.

Padşah we deng dike ib zar e:  
- Durr mewicî bû behr e,  
Xerqe dikir nijyare,  
Il qendîlê dikir vedişare,  
Bedî nod hezar sal deher kirin her çar yar e,  
Her çar yarê zergûn e, esilzade Şîxadî û Melek Şêx Hesên,  
Nasirdîn û Sicadîn, ewan ev diniya ib kar tîna.

13.

Ewan ev diniya îbabû kar e,  
Dur mewicî, bû behr e,  
Padşah e û her çar yar e,  
Il merkebê dibûn sûwar e,  
Tê seîrîn çar kenar e,  
Il Lalişê sekinî, go: "Eva heq war e".

14.

Heq war, sekinî,  
Padşahê min hêvên avête behrê, behr meînî,  
Duxanek jê duxunî,  
Her hevt ezman pê nijinî.

15.

Melek Fexredîn pirsyarek ij padşahê xwe dikirî:  
- Îlahîo, tu wehdil qadir î,  
Berî binyana, erda û berî ezmana, ib çî arkanî Kanya Spî nazil dikirî?

16.

Fexrê min î faxir e,  
Cuwaba te lêzim û fer e,  
Hêvênê Kanya Spî ij her û her e.

17.

Melek Fexredîn pirsyarek ij padşahê xwe dipirsiye:

- Wehdil qehar îlahî ye,

Mifta xerqê Sultan Şîxadî pê vedibit çî ye?

18.

Dibêşte: "Fexro, tarî ye, zulumat e,

Wehdil qehar heqîqet e,

Mifta xerqê Sultan Şîxadî pê vedibit Kanya Spî ye, bo mêra kir qublete.

19.

Fexrê min o id cî da,

Ilmdar o ilmê biîde,

Hêvênê Kanya Spî ij ba Sultan Êzîd e.

20.

Melek Fexredîn pêş padşahê xwe vediweste, pirsyarek jê dikirî:

- Ezîzê min, tu xaliqekî min î her û her î,

Berî binyana, erda û berî ezmana, berî mêra û berî meleka xerqe ib destê kîjan mêrî çê dikirî?

21.

Padşah dibêşte: "Fexrê min î faxire,

Cuwaba te lêzim û fer e,

Berî binyan û erda, berî ezmana û berî meleka, min xerqe ib destê Sultan Êzîd çê dikire".

22.

Melek Fexredîn pirsyarek ji padşahê xwe dikire:

- Ezîzê min, tu xaliqekî min î her û her e,

Berî binyan û erda, berî ezmana, berî mêra û berî meleka xerqe bi destê kîjan mêrî dikir bere?

23.

Padşah dibêşte: "Fexrê min î faxir e,

Cuwaba te lêzim û fer e,

Berî binyan û erda, berî ezmana û berî mêra û berî meleka, min xerqe ib destê Sultan Êzîd dikir ber e.

24.

Fexrê min o bi cî da,

Ilmdar o ib cî da,

Pîrê xerqê min Sultan Êzîd e.

25 .

Sultan Êzîd pîrê xerqê min e,

Bênaya çevê min e,  
Etqata min e û çandî momin e.

26.

Padşahê min î nûranî ye,  
Fexr e û Sultan Êzdî ye,  
Il ber xwe kirin tac, hule û xerqe id reş nûranî ye,  
Il birka Kanya Spî hêlaniye,  
Ij ew paş mêra şehde, bawarya xwe pê î naye.

27.

Sultan Êzîd dest avête qendîla qudretî ye,  
Durrek jê deraniye,  
Sultan Şîxadî ser kefa xwe daniye,  
Jê çê kirin tac û hule û xerqêd reş id nûranî ye,  
Teslîmî xasê Şîxadî kir weke tu zanî,  
Li ber xwe kir, ij ew paş mêra şehde îmana xwe pê anîye.

28.

Ewan li ber xwe kirbû ew sur e, ew xerqe ye,  
Dê ib Sultan Êzîd dan şehde ye,  
Lew ij nûra wan kişîfî berê sibê ye.

29.

Berê sibê ji nûra wan kişîfî,  
Erd û ezman têk ricîfî,  
Mêr il wedanîyê rûniştî ib heq riya Sultan Şîxadî û Melek Şêx Hesên ib hev ra axîfîn.

30.

Mêr il wedanîyê rûniştin, heq riya Sultan Şîxadî û Melek Şêx Hesên ib hev ra xeber da:  
-Ezîzê min, tu mufheta ser çendî derd e,  
Ib çi arkanî ij hev vekirin ezman û erd e?

31.

Melek Fexredîn pirsyarek ij padşahê xwe dikire:  
- Ezîzê min, tu xalîqekî min î her û her e,  
Ib çi arkanî te erd û ezman ij hev vedikire?

32.

Padşah dibêşte: "Fexrê min î faxir e,  
Cuwaba te il min lêzim û fer e,  
Me erd û ezman ij hev vedikire,  
Roj û hîv nav da daher dikire".

33.

Roj û hîv nav da daher dikire,

Buhuşt, doje nav da dikire.

34.

Padşah dibêşte: "Ez ê xuliqînim şev û roj e,  
Min nav dana buhuşt û doje.  
Melek Fexredîn kire hîv û Melek Şemsedîn kire roj e.

35.

Melek Fexredîn pirsyarek ij padşahê xwe dikire:  
- Ezîzê min tu xaliqekî min î her û her e,  
Ev buhuşt xas te ava dikire,  
Ev çi doje bû pêş miqabil diêwire?

36.

Padşah dibêşte: "Fexrê min î faxir e,  
Cuwaba te lêzim û fer e,  
Ew buhuşt xas min bo xudana ava dikire,  
Min ev doje çêdikire,  
Ê rojê sê cara ib navê Sultan Êzîd û Taûsî Melek dikifire.

37.

Melek Fexredîn pirsyarek ij padşahê xwe dikire:  
- Ezîzê min, tu xaliqekî min î her û her e,  
Ev buhuşt xas te ava dikire,  
Ev çi Adem bû nêv da diêwire?

38.

-Hey Fexrê mino pir usfet e,  
Mi ji Adem vavartibû hevtê û du mîlet e,  
Û hîjde hezar xulyaqet e,  
Lew jê ra kire coqet e.

39.

Melek Fexredîn pirsyarek ji padşahê xwe dikire,  
- Ezîzê min, tu xaliqekî min î her û her e,  
Bi çi arkanî heşem û qurêş ji hev vedikire?

40.

Padşah dibêşte: "Fexrê min î faxir e,  
Cuwaba te lêzim û fer e,  
Min heşem û qurêş ji hev dikire,  
Qal û qîl nav da daher dikire,  
Herdua Sultan Êzîd ib şûrê heqyê ji hev vedikire.

41.

Ew herfa ji mêj,

---

Caîz e wê herfê bikin tiftêş,  
Wê herfê ij hev vekirin heşem û qurêş.

42.

Qurêşî ib navê Sultan Êzîd bêtin behwar û îman e,  
Ezîzê min, te da ser herfa kafir û bisulman e,  
Te nazil kir rûî va erda Encîl, Tewrat, Zebûr û Quran e,  
Sunetxana ib çi êtin behwar û îman e?

43.

We dibêje padşahê min xudan arkan e,  
-Belê Fexro, ez ê nazil kim rûî va erda qewl û xerqan e,  
Sunetxane dê pê êtin şehdeî û îman e.

44.

We dibêje padşahê min î nûranî ye,  
-Belê Fexro, ezê xuliqînim sê tiştê qîmetî ye,  
Mêşe, zergoz e, mî ye,  
Hêvênê her sêka ij Kanya Spî ye,  
Ij mabênê mîyê û zergozê ez ê çêkim xerqe ye.

45.

Feqîr dikirin ber xwe ye,  
Sunetxana dê pê êtin behwarî û şehde ye.

46.

Melek Fexredîn pirsyarek ij padşahê xwe dikire:  
- Ezîzê min, tu xaliqekî her û her e,  
Bi çi arkanî il ezmana xerqe tevsîl dikire?

47.

Padşah dibêşte: "Fexrê min î faxir e,  
Cuwaba te lêzim û fer e,  
Min il ezmana xerqe tevsîl dikire,  
Teslîmî xasê Şîxadî dikire,  
Xasê Şîxadî teslîmî Melek Fexredîn dikire,  
Sunetxane dê pê êtin şehde û behwar e.

48.

Melek Fexredîn pirsyarek ji padşahê xwe dikire:  
- Ezîzê min, tu xaliqekî min î her û her e,  
Bi çi arkanî li ezmana zergoz tevsîr dikire?

49.

Padşah divêşte: "Fexrê min î faxir e,  
Cuwaba te lêzim û fer e,

Min il ezmana zergoz tevsîl dikire,  
Teslîmî xasî Şîxadî dikire,  
Xasî Şîxadî teslîmî Melek Fexredîn dikire,  
Melek Fexredîn teslîmî feqîra dikire,  
Feqîra pê xerqê xwe reş dikire,  
Sunetxane dê pê êtin şehde û behwar e.

50.

Padşahê min î pir hewas e,  
Da mêra ew nefes e,  
Da destê pîra fitir û zikat e,  
Da destê şêxa bisk û meqes e.

51.

Padşahê min î xefûr e, ij wî we destûr e,  
Da destê şêxa bisk û meqes e,  
Da destê pîra zikat û mişûr e.

52.

Padşahê min hukmê xwe î rewa ye,  
Ij ba wî we dia ye,  
Da destê şêxa bisk û meqes e,  
Da destê pîra fitir û zika ye,  
Hinekî dilê xerqe il wê ma ye.

53.

Padşah divêşte xerqe: "Bila wa bî,  
Çi ij kenera min tê nebî,  
Sunet suneta min e, sunetxane, her çar terîqet il dest û damina te bî,  
Hincî şahdaê te vê ra nebî, bila qe ib rûyê min nekevî.

54.

Padşah dibêşte: "Fexro, xerqe îman e,  
Hincî il kêşa xerqê Şîxadî ib şik e, ib gûman e,  
Dê ib çeplê wî bigrin bavêjne nav sefê bisulman e,  
Cîyê li axretê biora [bi wanra] wejiwartî tang e û tûng e,  
Doj e, cehnimî ne, reml e û qetran e,  
Heta ebedên ibin ebed ew der cîyê wan e.

55.

Ewan mêra lêk dinêrî,  
Dîwana Sultan Êzîd bûye şûşe birêqêd zêrî,  
Ew kasa şereb id tihûr mêra nob û nob lê digêrî.

56.

Padsah dibêşte: "Fexro, rojekê ib navê Sultan Êzîd diêm behwar e,  
Teslîmî wan beygo bikin wan kafira,  
Ed destê wan da debar nake çi musefir e.

57.

Padsah dibêşte: "Fexro, rojekê ib navê Sultan Êzîd diêm temam e,  
Teslîmî wan beygo bikin wan nemama,  
E serê we dê wan dibite temam e.

58.

Padşah dibêşte: "Fexro, rojekê ib navê Sultan Êzîd diême rûyê van erda,  
Dê derman bikim birîna û derda,  
Dê derman bikim birîna û kovana,  
Hincî il kêşa vî qewlî î bi şike î guman e,  
Dê ib çeplê wan bigrin bavêjne nava sefê bisulman e,  
Cehnimî ne, reml û qetran e,  
Heta ebedên ibin ebed ew der ciyê wane.

59.

Ev qewl e, qewlê Qerefirqan e,  
Temamata vî qewlî il Melekê mewtê Dawûd î bin Derman e,  
Ê Bazîd il Bastamê, Gavanê Zerzan e, il her çar biran e.

60.

Em kê in, Xwedê û Şîxadî herî temam e,  
Rehme il hostê min hev qewla jê pirsî,  
Rehme il dê û bavê hazira û gudara û mal û mezelê em tê da,  
Xwedê ava bike,  
Wel ezîz Ella, wel daîm Ella, wel baqî Ella.

---

Nivîsarnasî:

Meha gulanê sala 1982an li gundê Qîbarê (Erşîqîbar) ser qeza Efrînê (Sûriye) ji zarê Şêx 'Eliyê Şêx Şemo hatiye nivîsandin.

---

# Sal 1840-41, Li Diyarbekir Xela û Mirina 5.000 Kurdî

Dr. Felat Dilgeş

Horatîo Southgate, carekê di sala 1838an de, careke din jî di sala 1841an de, di navbera sê salan de du car Kurdistanê ziyaret dike. Nivîskar, çavdêriyên xwe yênera duduyan di kitêba bi navê *“Çîroka Zîyareta Dêra Suryanî (Aqûbî) ya Mezopotamya”* [Narrative of a visit to the Syrian [Jacobite] Church of Mesopotamia] dinivîse. Yekem car li sala 1856an ji aliyê *Dana and Company* ve li New Yorkê tê çapkirin. Çapa di destê me de, li sala 2003an ji aliyê Gorgias Pressê ve li New Jersey hatiye çêkirin.

Horatîo Southgate, di 7ê Gulana 1841an de ji Stenbolê bi gemiyekê ber bi Trabzonê ve bi rê dikeve. Gemî di 9ê Gulanê de digihîje Sînopê, her eynî rojê êvarê di Samsûnê re derbas dibe û di 10ê Gulanê de digihîje Trabzonê. Hê gava ku li Stenbolê ye, Horatîo Southgate fermannameyekê ji desthilatdarên dewleta Osmanî distîne, da ku di gera wî de paşa û waliyên her herêmê jê

re bibin alîkar û kes jê re zehmetiyê dernexe, herwiha bikaribe li her derê ji bo xwe muhafizan jî rayî bike.

Bi awayê ku ji kitêba wî tê fêmkirin, Horatîo Southgate li Amerîka keşe ye û di hatina xwe de, ji bo ku dêrên xirîstiyanan jê re bibin alîkar, nameyekê ji berpirsiyarên dêra xwe jî bi xwe re tîne. Ji ber ku carekê di 1838an de jî hatiye, cara duduyan pirr zehmetiyê nakşîne, çunke êdî hin nasên wî jî li derên ku berê ziyaret kiriye, çêbûne.

Horatîo Southgate, di kîjan bajar û qesebeyê re derbas bibe, salixê wê derê dide, di derheqê nufûsa bajêr a xirîstiyân û misilman de, li gor texmîna xwe hejmara ermenî, suryanî, rûm û cihûyan jî dide. Hema bibêjin ji serî heta bi dawiya kitêbê qala kurdan û Kurdistanê tê kirin. Nivîskar bi dehan car gotina “Kurdistanê” bi kar tîne, ji rewş û jiyana kurdan, ji mêvanperweriya wan qal dike.

Piştî ku bi gemiyê ji Stenbolê tê Trabzonê, Horatîo Southgate ji wê derê pê ve êdî bi welaqan, bi hesp û hêstiran riya xwe berdewam dike. Di vê rêwîtiyê de zilamek rûm ê ku navê wî Basîl e, wek tercuman bi wî re digere. Belê li her bajarî, Horatîo Southgate, li gor hewcedariya xwe çend muhafizan jî digire.

Horatîo Southgate ji Trabzonê derbasî Gumuşxaneyê dibe, ji wê derê tê Sîwasê, ji Sîwasê tê Hekîmxanê, ji Hekîmxanê tê Xarpêtê, ji wê derê tê Madenê, ji Madenê tê Erxenî, ji Erxenîyê tê Diyarbekir. Hê gava ku ew li Gumuşxaneyê ye waliyê wê derê jê re dibêje ku li Diyarbekir xela heye. Hê li Erxenî, Horatîo Southgate bi rûyê tal ê xelaya ku di nav kurdan de ye dinase. Bi vê gera Southgate em hîn dibin ku di sala 1840-41an de li Diyarbekir û der û dora wê, heta li Mêrdîn û Nisêbînê xelayek giran a ku milletê kurd dişkîne heye. Tam di vê demê de Bedirxan Begê Botî li Cizîrê û der û dora wê li ser hukûm e û ev dever dema xwe ya zêrîn diji.

Horatîo Southgate, ji Diyarbekir tê Mêrdînê, ji wê derê tê Nisêbînê, ji Nisêbînê derbasî Mosilê dibe, ji Mosilê tê Zaxoyê, ji Zaxoyê jî tê Cizîrê. Gava ku ji Zaxoyê dixwaze were Cizîrê, li ser rê tê gundekî bi navê Bîtouna, li wir di navbera wî û axayê gund de sohbetek wisa çêdibe ku em ji vê sohbetê li ser rewşa Cizîra Botan a wê demê, ku Bedirxan Beg li ser kar e, agahiyên heja bi dest dixînin.

Horatîo Southgate wiha dinivîse: "Me xwarinê xwar, sohbeta xwe kir, me xwe vezeland û heta sibehê em bêdeng razan. Hingê gundiyan ez bi du zîlamê peya verêkirim. Wan dê ez bibirama gundê bi navê Hadîd, ku du saet dûr bû û min ê ji bo wan li wir hesp rayî bikira. Li gundê Hadîd ku yê misilmanan e

hesp tune bûn. Em rabûn çûn gundekî din bi navê Bîtouna, bi qasî çend deqîqeyî li aliyê rojhilatê ve diket û axayek lê dima. Wî axayî em bi dilgermî qebûl kirin û ji bo destpêkirina rojê taştêyek baş da me. Belê ew bi fikra me ya ku em ê di herêma Cizîrê ya ku pirr baş tê îdarekirin de, bi muhafizan seya-het bikin kenîya. Wî ji me re got, 'Zêrê xwe deynin ser serê xwe û li riya xwe herin. Dê tu kes we aciz neke.' Wî zilamek jî da me ku rê bi şanî me bide. Ev zîlamê ku ewê parsek be, kîsê xwe li wê derê hişt û bi me re hat. Ew di rêveçûna xwe de pirr giran bû, loma min ew bi şûn de şand ku here ser karê xwe û riya mayî, em bi serê xwe çûn. Axayê dilgeş ê Bîtouna rast gotibû. Li vir hewcedarî bi muhafizan tunebû. Gundî li her derê belav bûbûn û genimê xwe diçînin. Mêr û jin bi hev re dixebitîn, hemû di karê xwe de şa û dilgeş xuya dikirin. Berê zeviyên wan ceh û genim bû. Li hin deran, ne li ser kotan (milan), gilgilê Hindîstanî yê ku li ser rehekê bejin davêje hatibû çandin. Em di du zeviyên ku tê de titûn hatibû danîn de jî rast hatin. Sala çûyî li herêmê zuwayî hebûye, belê îsal debir heta tu bixwazî adan e. Kifş e ku rûyê tevahiya axê, bi da- yina berê xwe dikene. Cihêtiya mezin a di navbera Mosil û Cizîrê de bala min kişand. Li Mosilê her tişt tarî û rizîyayî xuya dikir. Gund nîvenîv xera bûbûn, xelq tirsonek û dişkêstî bû. Li vir (Cizîrê) her tişt heye û firehî ye, millet bi karê xwe ve bilî ye, wê hewldana wan hatina axê jî zêde kiriye. Ya ku min bi çavê xwe dît, ez dam yeqînkirin ku li vir, du taybetiyên mezin ên îdarekirinê yên ku welat dixwaze hatine ser hev. Ev jî hişkî û edalet e. Paşayê Mosilê hişk e, îdareya wî pirr xerab e û li ser milkê hemwelatiyên xwe tadar e. Belê Begê

Cizîrê hem hişk e û hem jî bi edalet e. Bi kêmanî ew gelê xwe di bin barên ku nikarin ji binî rabin de napelçiqîne û ev edaleta bê musamaha ya ku hêjayî pesindanê ye, kiriye ku herêma wek welatekî Ewropayê di aramî û aştiyê de be. Hê çend sal berê herêma ji aliyê serokên serhildêran ve dihat îdarekirin û tevahiya axê bûbû şikefta rêbiran (r.168-169)."

Bi awayekî baş, bi adelet îdarekirina Cizîrê û di nav firehiyê de jiyana miletê kurdê ku di bin serweriya Bedirxan Beg de ye, berpirsiyarên dewleta Osmanî gelek aciz dike û bi vî awayî ew dixwazin zûka dawî li vî karî binin. Piştî ku Horatîo Southgate ji Mosilê vedigere, hê di rê de dibihîze ku hêrêma Cizîrê bi Mosilê ve hatiye girêdan. Yê ku vê xebera reş tîne, ji Stenbolê ji Horatîo Southgate re nameyek jî anîye. Çünke wan berê hevûdu li Stenbolê naskirine. Horatîo Southgate li ser xebera fermana Padîşah a ku Cizîrê bi Mosilê ve girê dide, wiha dinivîse:

"... Hingê di wê wextê de ji Stenbolê ferman hat ku Cizîra dewlemend dida paşayê Mosilê. Tatarê ciwan, kesê pêşî bû ku ev mizgînî digihand Paşa, ku bi leşkerên xwe li Darayê bû û amadekariya êrîşekê li ser kurdên li çiya dikir. Pişt re wî hin zilam şandin ku riyên derbasbûnê kifş bikin û dû re 1.500 zilam rêkir ser wan û kir ku kurd serî daynin. Gihîştina fermanê ya bo Mosilê bi guleberdanê hatibû pîrozkirin û bi pênc an şeş qanûnî re li nêzikî deriyê Mosilê hatibû daleqandin (r.236-237)."

Niha jî em bêtîr li zêde li ser rewşa Cizîrê rawestin, em werin ser xelaya salên 1840-41an, ku rûpelek trajîk ê dîroka me ye, em ji devê şahidê bûyerê

bixwînin. Di rêzên jêrîn de derseke girîng a ku divê em kurd jê bistînin û bi kûrahî li ser rawestin heye. Di vê demê de cihêtiya Diyarbekir û Cizîrê ev e: Cizîr di bin desthilatiya Bedirxan Begê kurd de ye, Diyarbekir jî ji aliyê paşayên Osmanî yên ku bi ferman hatine tayînkirin, tê îdarekirin. Gava ku kurd xwe îdare dikin, welatê xwe geş dikin, rûyê gelê xwe xweş dikin, lê çaxê ji aliyê hinekên din ve tînin îdarekirin, ji nêza, ji birçîna, ji zîlm û xelayê dimirin. Di dema ku nifûsa Mosilê bîst hezar e, li kuçe û kolanên Diyarbekir pênc hezar mirov ji ber xelayê dimirin.

Werin em bi hev re ya ku Horatîo Southgate bi çavên serê xwe dîtiye bixwînin:

"Zarokên nîvtazî û birçî, ku ji ber xelayê ji malên xwe derketibûn, li ber qehweya piçûk a ku em ê şevê lê derbas bikin kom bûbûn. Rûyê wan ê çilmisî, parsûyên wan ên derketî, kûrahiya êşa ku dikişandin rast nîşan dida. Hin ji wan ji ber xelayê wisa jar ketibûn ku rehên bedena wan, goştê ranê wan heliyabû, wisa ku ji mirov zêdetir dirûvê îskeletan bi wan dixist Belê hê ev perçeyek piçûk ê rastîya wî sûretê tirsdar bû, ku min ê li Diyarbekirê bidîta (r. 90)."

Horatîo Southgate, di 1ê Hezîrana 1841an de digihîje bajêr û sosreta ku li Diyarbekir dibîne wiha dinivîse: "Min ji waliyê Gumuşxaneyê yê hêja li ser xelaya li Diyarbekir bihîstibû, belê ez tu car nefikirîbûm ku ew dê wek ya ku bi ber çavê min ketî be, gava ku ez ketim bajêr û min dît. Em teze ji deriyê Konstantîpolê derbas bûbûn û em hêdî hêdî di nav kolanên qelebalix re dibuhurîn. Hingê ji nişka ve hespê min, ji ber tiştêkî ku li pêş wî dirêj kirî ye vecinîqî. Çaxê min li pêşiya xwe nihêrt,

min dît ku merivek li ser piştê dirêjkirî, rûyê wî li tava germ e. Çavên wî bi çavên min ketin, ez tu car rastî nêrîneke wisa perîşan û bêhêvî nehatibûm. Hê beriya ku ez bisekinim an lêkolînekê bikim, em bi ecele hatin derbaskirin û qerebalix li pişt me civiya. Min ji rêber pirsekê kir, belê wî girmila xwe hejand -ku pirrê caran li Tirkîyê weha bersîv tê dayin- û got: 'Nizanibe û dev jê berde.' Beriya ku em bigihîjin dera ku em ê lê bimînin, em di ser çar-pênc kesên wiha re derbas bûn. Hinek ji wan ser çavê xwe nixavtîbûn, belê me ji lerizîna dest û lingên wan, ji zû û kurt hilmstendina ku kincên ser dilê wan dihejand fêhm dikir ku ew ezabê mirinê dikşînin. Yên din, ku ez naxwazim bibîr bînim; bi dîtina kesên din re êdî em jî hînî dîmenê dibûn, belê ya ku bi yê pêşî re di hişê min de bi cih bû, bi tu awayî nikare jê bê avêtin. Çünke ev dîtina pêşî û teze bû. Dîmena ku min dît wisa zindî bû ku ji ber çavê min nedîçû. Min ev niha dît. Ev çavên camîn, ev nêrîna mirinê, ev ezabê ku tê kişandin, bêhêvîti û lavakirin. Hêvîdar im ez cardin tiştêkî wiha nebînim!

Piştî ku em li dera ku em dê lê bimînin bi cih bûn, ez zûka çûm derve ku ez vê yekê hê bi berfirehî hîn bibim. Ne hewce bû ku ez dûr ve herim, mirî û yê ku li ber mirinê bûn li her derê bûn. Hin li nav kuçeyan vezelandî bûn û her hespê ku derbas dibû dikaribû pê li wan bike, hin li ber deriyên dewlemandan ketibûn, hin li ber deriyên bajêr bûn, belê pirraniya wan li ser riyên bingehîn û bazaran bûn. Hemû zilamên der û dorê kirîn û firotanê dikirin. Li dera ha bêhna bi lezet a xwarinxaneyekê belav dibû, li aliyê din, li firnekê nanê teze ji derve ve xuya dikir. Li vî milî dezgeha qesabek, li dera ha kesên ku zebze, meywe, av, şerbet û heta tiştên ku ji bo

jiyanê luks tînin hesibandin difirotin. Ev feqîrên ku ji birçîna jar ketine, neçar li navê vezeliyane û nikarin xwe tev bidin, hêdî hêdî ji ber xelaya giran dimiriyan.

Ma kî dikare ji vê bawer bike? Li qunceki zarokekî qirêjî tê dîtîn, ku destê xwe yê qermîçî dirêj dike, da ku hestiyekî ku avêtine ber seyan bigire. Li hêla din, zarokekî din jî hestiyekî ku avêtine kuçeyê û tiştêk pê ve tune dikoje. Li jêrê, li bin sivêrneka malekê, zilamekî hestîgir ê ku berê xurt bûye vezelandiye, belê niha ji qelsî parsûyên wî xuya dikin û bûye mîna îskeletek, xwe bi qedera xwe ve berdaye û li ber mirinê ye. Binêrin ka çawa singê wî lê dixê, di ezabê dawî de dest û lingên wî çawa dilerizin. Va ye jinîkek, bebekek li ber singê wê ye û zarokekî yeksalî an dusalî li ser çoka wê ye. Wisa qels in ku hestiyên wan xuya dikin. Bi zorê dirûvê mirovan bi wan dikare. Û dayika ku ew anîne, wisa xuya dike ku kezêba mirov jê re diperte. Gava ku ew derbas bûm, bi çî çavên lavakirinê li min nihêrt. Kî dikare li ber vê yekê xwe ragire? Li gel vê, qerebalixa ku mijûl xuya ye derbas dibe, bêtî ku bala xwe bidin sefaleta li ser rê. Tu dê bibêjî vê rewşa bêhêvî ya ku ew mirov tê de ne, qet bi bala wan neketiye, da ku li wan werin rehmê. Dê ew mirovên ha ji heywanan re bêtir bi rehim bin, ma li hember mirovên wekî wan, çî tiştî dilê wan kiriye kevir?

Keşeyekî xirîstîyan di vir re derbas dibe. Xwedênegiravî ew xizmetkarê wî Îsayî ye ku hînî me kiriye ku em ji dijminên xwe jî hes bikin, ji her kesî re qencyê bikin, em ji yê din re bikin ku ew jî ji me re bikin. Diviya ku wî bi dibavanî li van zilamên bêçare yê li ber mirinê binihêrta. Belê na, tu dê bibêjî ku wî ew nedîtine û qîrîna wan nehatiye guhên wî. Zilamekî ku dike ruhê xwe

bide li pêş wî, li ser riya wî vezelandî ye. Ji bo ku pê lê neke divê riya xwe biguhêre. Wisa jî ew riya xwe diguhêre û di ser wî re derbas dibe. Nêzikî wî jinîkek vezelandî ye. Serê xwe daniye ser kevirek. Belê bi perîşaniya wê re, serê wê ji ser kevîr bi paş ve şeqitiye û ketiye bin stûyê wê. Bi vî halê xwe yê dişewat ew ji bo ku hin lê werin rehmê diqîre. Keşe di vir re derbas dibe û pê re serê xwe li aliyê din dizivîrîne. Kî dikare vê qîrîna lavakar ji nedîtî ve were? Ewê raweste û pê re bipeyive. Na! Bêyî ku ew tenezûl bike û saniyeyekê bisekine, ew rast derbas dibe.

‘Sedemên vê yekê çi ne?’ Min ji zîlamekî ewle yê misilman ku em bi hev re dimeşîyan pirsî. Wî bihîstibû ku em ji Stenbolê hatine, ji bo ku xeberan bibihîze gazî me kiribû û bi min re hatibû himamê.

Wî got, ‘Ew Kurd in.’

‘Belê ew misilman in, li ser bawerîya we ne, ma hûn çima li wan xwedî dernakevin?’

‘Bihêle bila kûçik (seg) bicehimin!’ Bersîva wî ya berbat a nemirovî ev bû.

‘Wan têra xwe serê me êşandine. Em dixwazin ku tev bi vî awayî, tevê nîjada wan bi vî awayî, her bi vî awayî bimirin.’

Divê xwendevan fêma bike ku kurdên wîlayeta Diyarbekir hergav hemwelatîyên nerazî û talûke hatine dîtin û hîssên bi vî awayî yên li hember wan, ji dema Sultanê rehmetî ve ku dixwest serî bi wan bitewîne û sistema xwe ya leşkerî ya nû di nav wan de bicih bike vir ve, zêde bûne. Ew bi zorê ji gundên xwe hatine derxistin û di lîsteya ordiyê de hatine nivîsandin. Tê bîra min, gava ku ez cara pêşî hatim bajêr (sala 1838-FD), du sed mîrên wan wek garana

dewaran dabûn pêşîya xwe û diajotin, dê û bavên wan ên pîr li pey wan dihatin, digiriyan û bi destên xwe li xwe dixistin. Kurd di bin tîrsa bêsalix a Nîzamî Cedîd, anga “Pergala Nû” de ne û bêguman ev ji bo wan felaketeke mezin e. Gundên wan ji aliyê berpirsiyarên ku mirov dişînin leşkeriyê ve hatine dagîrkirin, zarokên wan bi zorê ji wan hatine stendin û bi zorê şandine eskeriyê. Vê nûbûnê felaketê hê mezintir kiriye. Loma ne ecêb bû, gava ku di sala 1839an de ordiya tirk li Nîzîbê têk çû, wan jî xwest ku heyfa xwe ji yên ku wan dipelçiqandin bistînin, piçek para wan jî di tevliheviya ku ji bo demeke kurt derket de çêbû. Bi vê kirina xwe, wan tenê hesabê zêde yê ku wê paşê bi pergala nû re ji wan bihata xwestin zêdetir kir. Misilmanên bajêr ji kurdan pîrr nefret kirine an nefreta xwe ya ku ji berê ve hebûye hê xurttir kirine. Di her du salên dawîn de baran neketiye û di encamê de debir bi tevahî hatiye birrîn. Kurdên ku ji birçîna ji gundên xwe derketine, neçar mane ku werin bajêr û li vir kesê ku li wan were rehmê derneketiye. Bi sedan ji wan di kolanan de mirine, rojê bîst an sî kes dimirin. Çaxê ku bihar hatiye, gelekana riya bi saya giya û fêkiyên ku li çolê tîr bi destxistin riya jiyanê dîtine, belê hê jî, di dema ziyareta min de jî, rojê di navbera pênc û deh kesa de li kolanan dimirin. Xela wisa giran bûye ku wan goştê mekruhê mîna pisîk û kûçikan xwarine. Heta goştê mirovan xwarine.

Mirov mirov be, ma gelo mirov çawa dikare li hember vê yeka ku li ber çavê mirov çêdibe, di ber xwe bide. Belê kes, ji bo ku ji wan re bibe alîkar tiliya xwe naleqîne. Ez dikim hişê xwe bixwim. Min ji desthilatdarek gelek pêbawer bihîst ku di navbera çar û pênc hezar

kesan de mirov li kuçe û kolanên Diyarbekir telef bûne. Hemû kesên ku mirine jî kurd in. Di hin gundên ku vala bûne de ermenî jî hebûne, belê mîletê wan li wan xwedî derketiye. Îcar li mala ku ez lê dimînim, çaxê dengê parsê li ber derî tê, eger bi ermenîkî be, an bi awayê “Bi navê Mesîh” bê lavakirin, tafilê xizmetkarek bi pere an bi xwarinê tê şandin. Eger yê parsek bi kurdî parsê bike, qet tu kes bala xwe nade wî. Ez li ber vê dilhişkiya xirîstiyanan şaş mam. Şeva duduyan a ku ez gihîştibûm bajêr, ez ji aliyê ticarek xirîstiyân ê dewlemend ve dawetî xwarinê hatibûm kirin. Li wir min çend rêberên dêrê yên dînî nas kirin. Şîva êvarê, li ser daxwaza min û hevalê min ê ermenî, saet di dehan de, li derve (hewşa malê- FD) dihat dayin. Li gor wextê tirkên, dema adetî saet şeşê êvarê bû. Li gor hesabê me, vê demê, saetekê piştî nivê şevê dikir<sup>[1]</sup>.

Ji ber ku em ê serê sibehê zû biketina rê, me ji mazûvanê xwe rica kir ku medenîbûna Stenbolê nîşanî me bide û şîva me, bi çûna ava ya rojê re bide me. Belê ev ji heddê xwe zêde bêadetî bû û mazûvan dikaribû ji vê yekê re riza nîşan nede. Bi zehmetiyeke mezin me ew dan yeqînkirin, me li hev kir û şîv saet di dehan de hat dayin. Zengînên Diyarbekir bi luksî û dewlemendiya sifreyên xwe, bi tekûziya lîkorên xwe; ez bi xemgînî lê zêde dikim, bi gelek serbestî bi îsrafkirina wan tîr zanî. Li ser vê yekê em, piştî çûna ava ya rojê re civiyan, ji hingê heta saet dehan bêrawest pîpo, nargîle, qehwe û şerab hat. Ser sifreyê bi dehan cûreyên fêkiyên hişkkirî hatibû xemilandin, wisa ku îştaha mirov radikirin. Di nav cûreyên vexwarinan de vazo û qedehên ji ava gulan tije jî hebûn. Ev jî tenê ji bo nîşandanê bûn. Lê kêleka masê satilek

tijî ji ava bûzê hebû, di nav de tasek hebû û xulaman ji vê derê qedehên mêvanan tije dikir. Li navê garson digeriyan, bi kûpên destê xwe yên tije araq, ji yên ku ev vexwarina hişk vedixwarin re xizmetê dikirin. Bifikirin, seremoniyek bi vî awayî şeş, heta sê saetan dajot..”

Gelo di dema vê nangiraniyê de berpirsiyarên dewletê çi dikirin. Helbet li tevahiya axa dewleta Osmanî xela nebû û dewleta ku bi darê zorê bi hezaran mirov ji bo şandina şer û sitendina eskeriyê dicivand, eger bixwesta dikaribû tasek şorbe ji hemwelatîyên xwe yên li ber mirinê re jî rayî bikira. Em siyaset û helwesta dewletê ya li hember xelaya li Diyarbekir cardin ji rêzên nivîskar bixwînin:

“Xela wisa berbat bû ku nufûsa li gundan vala bûbû, têkiliyên xwezayî, têkiliyên eqrebayî û exlaqî ji hev ketibûn. Dê û bavan, ji bo bidestxistina loqek nan keçên xwe difirotin, keçên ku dê û bavên xwe winda kiribûn, xwe difirotin kesên ku wê ji wan re bibin alîkar. Di hemû vê dema bêkeys de, îdarekarên tirk qet nefikirîbûn û xem nekiribûn ku daxwazên gelê xwe yên ku ji ber xelayê dimirin bînin cih û wan xelas bikin. Ez fikirîm ku ez serî li paşayê Diyarbekir ê ku cinawirê mirovan e û firehiya wî bi qasî bejna wî ye, bixînim; belê her kesî got ku bêfeyde ye. Min jî dev jê berda. Ya rast, tirk difikirin ku ev fersendeke baş e, da ku ji hemwelatîyên xwe yên xerab xelas bibin. Loma bi daxwazên mirovî, li hember nêrîna taybetî ya siyaseta dewletê rawestin, beredayî bû (r.121).”

[1] Wek hemû rojhilatîyên tirk ji roja xwe bi çû- yina ava ya rojê re dest pê dikin. Ango li gor wan, gava ku roj diçe ava saet duwanzdeh e. Îcar jixwe li gor guherina rojê saet diguhurin.



**Ji Bîrewerîya 74 Saliya Rûdana 08/08/1930  
ya li Kerkûkê...  
DUH Û ÎROYA PIRSA KURDÎ Û KERKÛK\***

**Zahir Rojbeyanî**

**Wergerandina ji soranî: Vedan Adem**

Hikumeta Brîtanyayê belên dabû Hikumeta Iraqê ku heta sala 1932an dewleta Iraqê bike endam di Yekîtiya Netewan (YN) de.

Ji bo bicihanîna vê belênî peymaneke nû pêdivî bû di navbera her du hikumetan de, bi merama destveanîna vê peymanê jî, ku piştî hingê bi Peymana 30ê Hezîrana 1930an hate nasîn. Nûrî Seîd, yekem wezareta xwe li ser rasparda melîk Feyselê I. pêkanî, ku li roja 23.3.1930 destnîşan kiribû.

Nûrî Seîd bo çespandina hikumeta xwe û derbazkirina wê peymana çaverêkirî, hejmareke pêngavên bi navê çaksazî avêtin, ewên li ser astê Iraqê û erebî bû, me ew dem nîn e li ser rawestin, lê yên ku pêwendîya wan bi Kurdistanê re heye, ev e hindek in ji wan:

\* Di 10ê Nîsana 1930î de, bi



**Zahir Rojbeyanî**

beyannameyekê ragihand ku hikumeta wî di kombûna bihêt a Meclisî Ûme (Meclisa Gel) de, dê projeyek derbarê ziman û xwendina kurdî de li deverên bakur (şîmal) danîte ber çav.

\* Rêveberîya perwerdeya Hewlêr û Mosilê û rêveberîya perwerdeya Silêmaniyê li Bexdayê ji hev cuda kirin, li Kerkûkê jî dayreyeke mearifê

bo hemû deverên kurdinişîn damezrand û mamostayekî kurd kire mufetîşê wan deveran.

\* Li ser astê bernameyên xwendinê jî hindek pirtûkên cografya, mêjû, ayîn (ol; dîn), zanist û hindek tiştên din jî kirin kurdî.

\* Wê demê li Kerkûkê heftenameyeke hikumî (fermî; resmî) bi navê *Kerkûk* bi tirkî derdiket, dema ku Nûrî Seîd hatîye ser karî, 4 rûpel jê kirine kurdî.

\* Du stêrk êxistine ser diruşma Iraqê wek sembolek bo kurd û ereban.

\* Kesayetên wek bernîyasa kurd Tofîq Wehbî kire muteserîfê Silêmanî û Evdilhemîd Ebdul Mecîd jî kire muteserîfê Hewlêrê û çendîn kesayetîyên din jî pileyên îdarî û darayî pê rasipardin, wek Salih Zekî û Xelef Şewqî û Macid Mistefa û... Dan û stendinên di navbera Iraqê û Brîtanîyayê de bo girêdana peymana 30ê Hezîrana 1930î dest pê kir, li 30. 6. 1930 hate îmzekirin, hefteyek berîya morkirinê melîk Feyselê I. li 23. 6. 1930 geşte kir bo Ewropayê.

Li 1. 7. 1930 serokwezîr Nûrî Seîd geşte kir bo Ewropayê, lê ew peyman li 18. 7. 1930 bi resmî ragihand.

Sîyasîyên bernîyasên Iraqî derbarê Reşîd Alî Geylanî, Tofîq Swîdî, Kamil Çadirçî, Xefer ebu Timen, Mizahim Paçeçî û çendên din jî gelek bi dijarî dijî wê peymanê rawestîyan. Belê ji aliyê gelên Kurdistanê ve karesat ji wê jî rasterast û karîger bû, çunke wê peymanê çi amaje bo mafên gelê kurd tê de nîn bû... Bi vî rengî li hemû derên

Iraqê bo hera, bi taybetî li Kurdistanê, li Silêmanîyê û Kerkûkê. Dema Melîk çûye seferê erşê Iraqê teslîmê Xazîyê kurê xwe kir ku walî-ehd bû, Nûrî Seîd ku çûbû Brîtanîyayê, Cafer Eskerî yê zava û xezûrê wî li cihê xwe danî bû, ku wezîrê bergirîyê bû di hikumeta wî de, her wiha diyarê Mendûbê Samî Brîtanî jî ku bo hindekarîyên peymanê çûbû Brîtanîyayê, Mêcer Bong li cihê xwe danî bû digel belavkirina deqê peymannameyê, ev sê wekîl rû bi rûyê nerazîbûna xelkê bûn. Li Silêmanîyê Heme Axayê Ewrehman Axa, Şêx Qadirê Hefîd, Reşîd Necîb, Îzet Begê Usman Paşa û welatîyan "Heyeta Wetenî" damezirandin û hinartina (şandina) birûske-yan ji Silêmanî û Kerkûkê dest bi geşe kir. Emîr Xazî kurê melîk Feysel û welîehdê erşê wî li 16ê Tîrmeha 1930an serdana Kerkûk û Silêmanîyê kiribû. Hikumeta Iraqê jî li 5. 8. 1930 şandeyeke bala bo serdana Kurdistanê û hawîşkirina xelkê wê pêk anî, ku pêkhatibû ji serokê hikumetê bi wekalet Cafer Eskerî, wezîrê karê hundir Cemîl Medfey û wezîrê dadê Cemal Baban, bi hevalîniya wekîlê Mendûbê Samî yê Brîtanî li Iraqê. Ev şande li roja 8. 8. 1930 gihîşte Kerkûk û li 9-8 ji wir ber bi Hewlêr û 10-8 çûne Silêmanîyê, serokê hikumeta Iraqê bi wekaletîyê Cafer Eskerî û Mendûbê Samî yê Brîtanî bi wekalet li her sê bajaran digel mezin û cema-werên wan kom bûn û peyama dewleta Iraqê û Brîtanîyayê bi vî rengî gihande xelkê...

### **Serokê Hikumeta Iraqê bi Wekaleta Cafer Eskerî:**

“Min hindek birûske û erzên hindekan xwendin ku nerazîbûna xwe derbirîne li ser hindê ku behsa pirsâ kurdî di peymannamê de nehatîye... Min divêt bigihînme we ku hikumeta Iraqê ya rijde li ser wê bernameyê ji bo piştrastkirina birayên kurd danîye.. Belê hikumeta şikudara melîk Feyselê I. gelek bi dijarî ya rijde li ser binbirkirina her nezeyeka zîyanê bigihînite yekîtiya nîştimanî ya Iraqê, yan ewê hevsûya germ û li gor ku di navbera her du hikumetên dost; Tirkîye û Îranê de têk bidet... Paşî wekilê mutemedê samî Brîtanî pêşkêş kir, wî jî ev çende û gelek tiştên din tekîd kirin ku “Hikumeta Iraqê amade ye û pêxweş e cudahî di navbera reayên şikudara melîk Feysel, kurd û ereban de neke, ewa li dev hikumeta Brîtanya cihê pîtedana yekê ye, ew e ku damezrandina dewleteke serbest û azad bo Iraqê mîsoger bike... Piştewaniya hîç bîzavekê naket, eger dîyar bû ku digel vê sîyasetê naguncît, wek xwestina cudabûna kurdan, min hindek aliyên nemesûl jî dîtin, wiha hizir dikin ku sîyaseta dumaî ya hikumeta şikudara Brîtanyayê handana bizava nîştmanî ya kurdî ye, ev jî her bo îrtîbaka hikumeta Iraqê bi tenê nîn e, belkî ji bo îrtîbak pêkirina her du hikumetên xuşdivî yên hevsêwî; Iraq û Îranê ye...” Li Silêmanîyê bi xwepêşandan û şandina birûske û yadaştnameyên heyeta wetenî û kesayetiyên bernîyas pêşwazî li van gotinên serokwezîrê Iraqê bi wekalet, û wekilê mutemedê

Samî Brîtanî hate kirin, ev kar heta roja 6. 9. 1930 û şerê bi nav û deng ê ber dergehê serayê, û piştî hingê jî berdewamî hebû... Şandeya bala ya hikumeta Bexda demjimêr 10ê spêdê li roja 8. 8. 1930 bi balafirekê gihîşte Kerkûkê, kesayetên maqûl û endamên perlemanî û bazirgan û fermanser û serokeşîr û cemawereke pir li avahîyê (qîşle) pêşwazîya wan kirin, ku serokwezîran bi wekalet û Mendûbê Samî yê Brîtanî bi wekalet, wê axiftinê kirin, ku dengê nerazîbûnê di nav xelkê de bilind bû, digel endamên şandeya bala ya Bexda û ew çêbû ewa rojnameya *Jîyan* (hejmar 257 ya roja 14. 8. 1930) bi dûr û dirêjî amaje pê kiribû, di wê girjbûnê de, wek rojnameya *Jîyan* dibêje, bi hejmar bi tenê 4 kes digel hindê bûn ku Kerkûkê bixine ser Iraqê û bajarên Hewlêr û Silêmanîyê bihêne cuda- kirin, ew çar kes jî ev bûn:

Ebdula Safî Efendî (tirkman bû)

Mistefa Safî Efendî (yeqobî, ku birayê wî bû.)

Faris Axayê Beyatî (ku digotin ereb e, lê di rastîyê de Beyat tirkên azêrî ne û li devera Silêman Beg dijîn).

Şêx Muhemed Hebîb Efendî (ku rojnameya *Jîyan* dibêje “çunke Qazî û memur e, mecbur e”).

Ji bilî vana, kesên di piştewaniya hindê nekir, ku Kerkûkê ji Silêmanîyê û Hewlêrê cuda bikin û bixine ser Iraqê. Ew kesên bernîyasên kurd jî ku di vê kombûna cemawerî de bergirîya kurdistanbûna Kerkûkê kirin, gelek bûn: Ji Muhemed Begê Caf, Seyid Ehmed Efendîyê Xaneqa, Seyid Muhemed Efendîyê Cebarî bigre û vekêşê, dirêje pê hate dan

heta kar ghiştîye hindê, serokwezîrê bi wekalet Cafer Eskerî rabît û bêjite Muhemed Begê Caf: “Bi şerefa hikumeta xwe te temîn dikim ku bi temamî muqereratên Sibet el Umem dê bo we bi cih binîn û ev lîwa jî dê mifayê jê binît”.

Hêjayê amaje pêkirinê ye, ku xelkê Kerkûkê li rapirsîya 25. 2. 1925 ya “Sibet El-Umem” de deng neda hindê ku Kerkûk bixine ser dewleta Iraqê. Her wiha li demê hewabeya melîk Feyselê I. jî de, ku li Tebaxa 1921ê hatiye kirin, dîsan xelkê Kerkûkê mubaya melîk Feyselî red kir... Ku her yekê ji van rûdanan dirêjîyên xwe hene, lê pirs ev e, erê îro û duhîya pirs kurd, belên û peyman û helwest û peywendîyên kurd û ereb û îngilîz û tirk, îran û hemû aliyên pirs kurdî, piştî nêzîkî 70-80 salan çi guherînkari bi ser de hatiye?!...

## II

Kerkûkîyan ji mal û karên wan dernexin, ji hizba wan derbixînin da ku riya rast a kurdîtiyê bibînin

Hindek kes û aliyên siyasî yên xwedî desthilat jî hene, wiha hizir dikin ku pirs kurdî û qeyrana (krîza) hukmî li Iraqê digel morkirina yasaya berwext ya birêvebirinê, hemû dê bi dumahî hatine û... Êdî çi kar digel xelkê nemaye, ji ber hindê rêxistinên seyr ji bo ji xwevekirina vî xelkî dikin û didine dest çarenivîseke ne dîyar, ku yê ronî nîn e, dê wan berve kû ve birêke?!... Yek ji wan teorîyên seyr ên di van roja gazîyan

bo dixwazin, ew e ya ku dibêjin, erkê rizgarkirina Kerkûk û girêdana wê bi Kurdistanê ve, bi tenê erkê Kerkûkîyan e û heger ewan Kerkûkê divêt, bila ew xebatê bo wî bikin!...

Kerkûk wek xak û wek xelk jî, ev e; pitir ji 80 salan e bi her bihayekê hebûye, nasnameya xwe ya dîrokî û netewî parastîye, sereray hindê, bi sedan û heta bi hezaran korên Kerkûkê pişkdarîyeka karîger di bizava rizgarîxwaza kurdî de kirine. Çi caran li bîra kesê nebûye li dema pêşmer- geyetî û berevaniyê de, ku cudahiyê di navbera Qeredax û Xalxalan û Zimar û Zimnako û Pîremegirûn û Hendirên û Zozik û Sefîn û Metîn û Gare de biket.

Her ji serdemê Şêx Mehmedê Hefîd û Şêx Ehmedê Barzanî û Barzaniyê nemir û... Şoreşa sala 43an berdewama kurdî, heta îro jî, ev e cara yekem e hizirên kavilker û xirabkerên wiha bêne gotin, ku her bajarek û bajêrokek, ew bi xwe, xwe rizgar biket... Dijminên kurdan ji wê çendê dimirin!

### **Kerkûk Xwediyê Ji Sisêyan Yek a Gaza Iraqê ye**

Kerkûk xudanê pêncemîn embara gaza jêr-erdê cihanê ye.

Erdê Kerkûkê, yê avî û dêm, têra hemû îraqîyan dike, heger hijmara danîştwanên wê bigihête 30 mîlyon kesan jî, genim û ceh û dan û dikakî dê berhem hênît, ev jî dibîte giranîya asayîşa xwarinê li Iraqê.

Kerkûk riya bazirganî û serbazî û pêk ve girêdana hemû Kurdistanê ye.

Kerkûk tixûbê sirûştî yê berevanî-  
kirinê ye ji jorîya Kurdistanê re.

Kerkûk heta niha nasnameya xwe  
ya parastî, sereray hemû ew ên bi  
serê xelkê Kerkûkê ve înayin, hêşta  
pitirîya danîştwanên Kerkûkê kurd in  
û ne gihîştine haletê bê umêdiyê,  
daku xelk dest jê berde.

Kerkûk ew bajar e ku Edmonds bo  
hikumeta Brîtanî nivîsî û gotî:

"Bê Kerkûk mehal e dewleta Iraqî  
bihête pêkanîn."

Kerkûkek ku ji bo pêkanîna  
dewleta Iraqê ev giringîya wî hebît,  
dê bo Kurdistanê divêt çi giringî û  
pîtepêdana wî hebît?!...

Kerkûkek ku dewletên hawîrdor  
wiha hizir dikin ku heger bixine ser  
herêma Kurdistanê Iraqê, dê bikete  
dewlet... Ez nizamim çawa  
(munezirek) hizra wî bo wê çendê  
diçît, Kerkûkeke wiha ku ew "buda"  
netewî heye, bo xelkê xudanên bajêrî  
bihêlin, ku ji ber enfal û teerîb (ere-  
bkirin) û derbederkirinê û birçikir-  
inê û bi dûvketinê, ku birişt û şîyanên  
kirîya vegeirîne pê nemane?...

Ewên tebenaya vê teorîya cehen-  
emî (destberdana ji Kerkûkê bo  
kerkûkiyan) dikin, niha jî li hindek  
bajaran fişarê dixine ser hindek fer-  
manberên bi eslê xwe kerkûkî, daku  
karê xwe bihêlin û vegeirî Kerkûkê,  
bêyî ku li wir çi karî, yan her jêdereke  
jîyanê bo wan dabîn bikin li hindek  
deran.

1- Ew karmend kurd in û yên biza-  
vê dikin kevnebeasiyên derkirî ji  
ereb û tirkmanan divegerînin ser  
karên wan ê li serdema rijêma berê.

2- Hêşta li Kerkûkê xwandina kurdî  
li hemû qonaxan û li hemû tax û  
deveran nehatîye damezirandin.

3- Hêşta kurrîn û firotina erd û  
xaniyan li dûv biryara 42. ya  
serdemê rijêma berê, ji kurdan re û  
bo kurdan qedexe ye.

4- Teror û kuştina kesayetên civakî-  
îdarî yên kurd, rojane li ber çavên  
desthelatdaran li Kerkûkê dihêne  
encamdan.

5- Çi rêkxiraw û dezgehek, harîkarî  
û yarmetiyê pêşkêşî wan  
kerkûkiyên aware nakin, ew kesên  
pê li cureta xwe û paşeroja zarokên  
xwe naye û vegeirîyane Kerkûkê û  
havîn û zivistanên dijarwêrên par û  
îsal di xîvetan (kon) de borandine.

### **Hindî Rejîma Sedamî Mabû:**

Kerkûk bi erd û xelkê xwe ve,  
karta fişarê bû li ser rejîma berê ya  
Bexdayê.

Heta şerê navxwe yê li seba deshi-  
latê hatiye kirin, Kerkûk sotemeniyê  
wî şerê xwekujîyê bû.

Heta vekêşên her du îdareyan  
berdewam bû, Kerkûk bi erd û xelkê  
xwe ve parsenga havkêşê bû...

Lê digel morkirina yasaya  
berwexta birêvebirina Iraqê, erd û  
xelkê Kerkûkê ew hemû girîngîye ji  
dest da, û ew kerkûkiyên li bajarên  
din dijîn bi vî rengî dihêne dîtin:

Li ser astê wezîfeyê; dibêjin  
kerkûkî hindek cihên îdarî û wezîfeyî  
yên baş dagîr kirine, divêt bo muna-  
fsên xwe ji xelkê wî bajêrî bihêlin.

Li ser astê pîrsa sekinî jî; heger

kerkûkî vegerin dê naçar bin wan awayî û erdan erzan bifirosîn, ku li bar û doxên berê dabûnê, yan wan bi xwe kirîne...

Kurdistanê û seroşniwî xaniyên hindek kesan û tirombêlên hindekên din û kompanîyayên heftser hindekên din jî bi kevneber, hiciz û daxistinê yan hindekên din, naçar bin xoşî û nîmetên dinê bihêlin û vegerin gund û şikeft û çîyayan...

Munezir, bi zorî şandina awareyên Kerkûkê, ev xwestina xwe di bin van perdeyan de diveşêrin:

Dibêjin, kurdên Kerkûkê heger di serjimêriyê de pitirîya danîştwanî derketin, dê bajêrê wan bikevîte ser bi Kurdistanê ve.

Dibêjin, heger pitirîya berbijêrên kurd di hilbijartinên seranserî de serbikevin, ew niwêner dişên di perlemanê çaverê yê Iraqê de Kerkûkê bi-xine ser herêma Kurdistanê, lê ev wiha nîn e, û di deqên yasaya berwexta hukmî li Iraqê, ku dê bibîte tekstê da-riştina destûra hemîşeyî, di çi bend û birrkan de deqeke yasayî ya ronî, yan zimnî nehatîye nûsîn ku amajeyê bi çewatîya çareserkirina pirsê Kerkûkê bidet.

Di yasayê de nehatîye gotin ku heger di serjimêriya Çirîya Yekem ya îsal de, kurd pitirîya xelkê Kerkûkê bin, dê Kerkûk bikevîte ser herêma Kurdistanê.

Her wiha nehatîye gotin ku heger pitirîya nûnerên kurdên Kerkûkê di perlemanê Iraqê de bihête, biryar ev li domahîya vê salê yan li destpêka sala nû hilbijartin bihêne kirin, ku pirranî kurd bûn, dê Kerkûk bixine

ser herêma Kurdistanê.

Di yasayê de ew jî bi ronî nehatîye gotin, ku dê li Kerkûkê referendum bête kirin û heger xelkî bivêt, dê Kerkûk bikevîte ser herêma Kurdistanê. Belkî pêçewanê wê çendê, di yasaya berwext a Iraqê de gelek bi ronî û bi deq ya hatî:

Bexda û Kerkûk di çi keş û hewan de nabît biçine di hîç federalîyekê de, ... Û bo dabirîna Kerkûkê nîye li Kurdistan?!... (Binêre li yasaya ....)

Di deqê yasaya berwext de hatîye gotin ku wiha nabît di Iraqê de hîç herêmeke federal ji sê parêzgehan (wîlayetan) pitir pêk bihêt. Ev jî deqeke zimnî ye ji bo hindê ku qet her çar parêzgehên Kurdistanê (Kerkûk, Hewlêr, Silêmanî û Dihok) neşên pêk ve herêmeka federal pêk bihînin, dîyar e di vî kawdanî jî de dê qurbanî bi Kerkûkê bihête dan, ji ber hindê tenzîrat bo paqijkirina bajarên din ji kudên Kerkûkê dihête kirin!...

Di yasaya berwext de hatîye nivîsîn, ku nabît destkarîya sinorên niha yên parêzgehan bihête kirin, ev jî ya ron e, ku ji bo hindê ye bajêrokên Kifrî, Kelar, Çemçemal, Dûzxormatû û ewên din ne êxine ser Kerkûkê, ne ku hejmara kurdan li Kerkûk vegerîte şêweya xwe ya sirûştî, ku ev jî li Perlemanê Çaverê ya Iraqê çûye ser û ew qeza û nahiye yên ji Kerkûkê hatin dabirrin dê biçine ser bajarên ereban, li wê demê ji sisêyan yek a xelk û erdê Kurdistanê bi yekcarî dê ji dest me biçît, û sinorên Mosil û Tikrît û Dîyala dê bigehine di nav cergê sinorên cografî û îdarî yên

Kurdistanê!...

Di yasaya berwext de bi deq hatîye û dibêjît, hemû kesan bêyî hîç qeyd û mercek bo wî heye li her dereke Iraqê bît, bibîte xwedîyê milk. Ev jî cihgîrkirina her wê sîyaseta erebkirinê ye, ji ber hindê Ednan Paçeçî li demê îmkîrîna Yasaya Berwext de, amaje bi vê birrê kir û ji hemî birr û deqên yasayê gotî:

“Ez şanazîyê bi vê birrê dikim ku mafê mulkîyetê didête hemî Iraqîyan li her ciheke Iraqê bît!...”

Em jî wiha hizir dikin, di Yasaya Berwext a birêvebirina Iraqê de sîyaseta erebkirina Kerkûkê hatîye çespendin, qenaeta me jî ew nîye ku di Perlemana Çaverê ya Iraqê de çendekê, yan gelek ji wan destkeftîyan ji dest bidin ku niha “li ser kaxizan” bo herêma Kurdistanê hatîne tomarkirin!...

Munezîre!... Berêzan, em ên Kerkûkî, heta niha bi hezaran caran bi arezûya xwe em bo viya rawestiyane, heta îdîa jî bît, binaxên viya me dihêl-xeletînin, çavên me bigrin, çunke me umîdek hebû, lê ev car Kerkûk ya li ber rêya hat û nehatê û yan jî gelek ron e û akamên wê jî gelek dizeqin.. Hêvî ye êdî bizav di serdebirina me nekin, em jî dibît êdî li asta îdîa bêyî binaxa viya, xwe xesîm nekin!... Kurdên aware yê Kerkûkê, ewên heta niha jî neveg-erîyane Kerkûkê. Ew dişên xwe heger bo rojekê jî bît bo serjimêriyê, ya ji bo dengdanê û helbijartinan heger bi mêvanî jî bît biçine bajarê xwe, xwe binivîsin û dengê xwe bidin...

Me deftera nufûsa Kerkûkê ya heyî li dema dengdan û serjimêriyan û bo tiştên din jî, em dişên bigihînin cihê meramê, lê Kerkûk ji aliyê sîyasî ve (hatiye ji destdan) bi tekîd vegevandina wê jî ji wê çarenivîsê karekî nîştimanî û helwêsteke mezin divêt, wek ku Barzanîyê nemir li sala 1975an wergirtibû. Ew di demeke wiha de bû ku her du blokên rojava û rojhilatê jî pîlan li ser digêran, lê bi nîvê Kerkûkê jî razî nedibû... Ku digot, “Nedibû ku ji bo Kerkûkê ew hemû destkeftîyên din ên rêkevtina Adara 1970an ji dest bidin!” Aha li wir ew serkirdeyê mezin, ku bi kûrahî li ramana wê ya dîrokî gihiştibû, gelek bi piştrastî vê bersivê dida û digot:

*“Min nevêt di paşerojê de du lawên Kerkûkî di ber gora min re biborin û bibêjin: Te bo çi dest ji Kerkûkê berda?”*

Ev e, helwêst û hestê mênûyî yê Barzanîyê nemir beramber Kerkûkê. Em ji wê çendê piştrast in ku heqekî Barzanî li pişt bît ji nav neçûye û ji nav naçît. Ewan jî li dû hesabên xwe de biçin û xelk û erdê Kerkûkê dikine qurbanê destkeftîyên xwe, dîyar e li ber wan tif û leanetan dikevin!...

Dê bêtînan wan munezîran jî, ger hûn rast dibêjin.

---

\* Rojnameya Xebat - 9. 8. 2004



# Bajarê Kerkûkê Li Rabirdû û Niha

Ewnî Dawûdî  
(Lêkolînerek Kurdê Îraqê li Siwêd)

Arapçadan çevire: Dilkani

Bêguman Kerkûk bajarek rehberdayê dêrînî ye. Lewre mêjûya wî vedigere sedsalên gelek bihurî. Kela wî ya li rojhilatê Çemê Xasse, di hundirê bajêr de li piya, şahidê vê yekê ye. Kerkûk yek ji bajarên dîrokî yên muhîm e ku di dema pêşveçûna bajarvaniya di herêma li navbera her du çeman; Dicle û Firatî de ava bûye. Delîlên mêjûyî didin xuyakirin, ên ku kerpîçên pêşîn danîne bo avakirina vî bajarî Kotî (Gotî) ne. Kolandinên Arkeolojîk diselmînin ku li wir bajarek bi navê "Arebxa" an "Arenca" an jî "Arefa" hebûye. Ansîklopediya Îslamî jî vê rastiye tekîd dike. Lewre derbarê Kerkûkê de tê gotin ku S. H. Gadd û Sidney Smith bawer dikin ku Kerkûka<sup>1</sup> niha heman bajar e ku bi navê "Arebxa" dihate naskirin.

<sup>1</sup> Wek ku Keşe Yûsif di qesîdeyeke xwe de tarîfa wê dike.

Bo vê yekê şaredariya Kerkûkê, vî navê mêjûyî "Arefa" kir navê taxa nû ya ku ji bo karker û erdkarên nefta Îraqê hate avakirin. Paşê ev nav wergeriya "Erefe" ya niha, digel ku babilîyan jê re digot, "Amîxeh" ango "Erefeh". Pirzan Tewfîq Wehbî dibêje, "Kerkûk bajarekî dêrîn e, kevintir e ji bajarê Hewlêrê, li nivîsên mîxî yên di destê me de ji yên herî pêş derbarê Kerkûkê de, ew nivîsa ku di teqwîma coxrafya- ya meşhûr de ye, derbarê mumtele- katê "sercûn" "serkûn" (Akadî, 2530-2473 berîya Zayînî) de ya di teqwîma navborî de em dibînin ku navê bajarê Erbex di nav hin navên din de wek "Aşûriyeh, Lûlûbî, Kûtîyûm, Akad û hwd." Kifş e ku Erbex bajarê Kerkûkê<sup>2</sup> ye."

<sup>2</sup> Resenê navê Kerkûkê ye, bi pênuşa Pirrzana yê rehmetî Tewfîq Wehbî, rojnameya *el-Ittihad*, jimare: 344, În 12.11.1999 sala heştan.

Bajarê Kerkûkê bi heman navê "Erabxa" hatiye navkirin di pirtûka *Destpêka Belavbûna Mesîhyetîyê* di Împeretoriya Îraniyan de (Mîsûbirotmaya û Îran 100-537)."<sup>3</sup>

Di pirtûka *Îraqa Kevn û Nû* de birêz Ebdurrezzaq el-Hesenî hin çavkanî- yên Suryaniyan nîşan daye û dibêje, "... Sdnabal melîkê Aşûriyan vî bajarî ava kiriye." Û Dr. Şakir Xesbak jî di pirtûka xwe ya "Kurd û Pirsgirêka Kurd"<sup>4</sup> de dibêje, "Kûtiyan vî bajarî ava kirine." Di pirtûka *Nêrînên Dîrokî* ya Leyla Namiq Caf de tê gotin, ku "Kûtî di vî bajarî de jiyane û bajarê "Erabxa" ji xwe re kirine navend."<sup>5</sup>

Doktor Şakir Xesbak careke dî di pirtûka xwe ya *Îraqa Bakûr* de dupat dike ku "Sumerî û Akadîyan li xwe danîne ku welatê Kûtiyan ku paytexta wî "Erabxa" ya nêzîkî bajarê Kerkûkê ya niha ye."

Ji lêkolîna me ya derbarê vî bajarî, ango "Arebxa" de em digihîjin zeximkirina gotina ku dibêje, ev bajar ji hêla Kûtiyan ve hatiye avakirin, ji ber ku "Tklî-Nzt" ê pêşîn qiralê Aşûriyan (1255-1218 B.Z.) tomar kiriye ku wî fetha bajarê "Erbex" kiriye. Qiralê Aşûriyan ê pêşîn bûye, wî bajarî dagir

kiriye. Di pey de ketiye destê qiralê Îlamî, Şhlk-Enşşnk (1165-1151)<sup>6</sup>, ango piştî avabûna bajarê "Erbexa" bi deh qernî.

Bo vê yekê avabûna wî ji alîyê Aşûriyan ve dûr tê dîtin. Dîtina mamosta Kerîm Zend ev e, ku di dawîya sedsala şeşan a B.Z. de ji hêla xwecihan ve ji bajarê Kerkûkê re hatiye gotin. Di dema Sumeriyan de ev gotin hatiye bikarhanîn. Ev nav di bingeş de ji "kar" bi wateya xebat û emelê, û ji "kûk" re bi wateya dijwar û birêkûpêk û mezin pêk tê.<sup>7</sup> Her du gotin jî kurdî ne, heta roja me ya îro jî bikar tênê.<sup>8</sup> Lê Pirzan Tewfîq Wehbî bawer dike ku navê Kerkûkê yê niha ji "Kerk-Kele(qela)"<sup>9</sup> pêk hatiye.

Dîrok dibêje ku Kerkûk parçeyek ji Împeretoriya Mîdî bûye. Piştî peymanana wan a bi Balîyînên Nû re, ya ku encama wê têkçûna Împeretoriya Aşûrî û hilweşîna paytexta wê Neynewa (Nînowa) bû. Medan ji bajarî re gotine "Kiyehrek", Sasanîyan jê re "Kermekan" ango bajarê germ gotine<sup>10</sup>, di çavkanîyên Suryanîyan de navê wî "Bîskermay" bûye.

<sup>6</sup> Tewfîq Wehbî, çavkaniya borî.

<sup>7</sup> Kerkûk di Bîreweriya Dîrokê de, Çanda Nû, jîmare: 245, Kerîm Zend, danerê cografyaya Kurdistanê, sala 1957.

<sup>8</sup> Ji wateya bêjeyê ez têdigihêim ku mebest bi vî navî Kela Kerkûkê ye, û bajêr vî girtiye. Lewre bi dîrokê sabit e ku kela Kerkûkê ya zexm, mêjûya wê vedigere hezar salan û her li piya ye û wargeha mirovan e, di salên heştê yê sedsala bîstan de li dora pênc hezar meriv di hundirê kelehê de bich û war dibûn, ev rewşa han kêm e di mêjûya keleşan de.

<sup>9</sup> *Herêma Kerkûk û Hewlândên Guhartina Rastiya wê ya Netewî*, Dr. Nûrî Telabanî, London-1995.

<sup>10</sup> "Germekan" pîteya "g" yê hawê misriyan bi "c" yê tê bilêvkirin. Hêjayî gotinê ye ku kurd jî herêma Kerkûkê û hawirdora wî re "Germiyan" dibêjin di vê dema niha de.

<sup>3</sup> Pirtûka Çi. B. Esmuns, mamostayê lêkolînên Îranî di Zankoya Kopenhagê de, Parêzer Cercîs Fetullah wê wergerandîye Erebi digel perawêzan (çavkaniyan). Ez li vir dixwazim bibêjim ku her du bêjeyên kurd û Kurdistanê li vir min bi destnivîsa kurdî nivîsiye.

<sup>4</sup> Kerkûka Îraqî hembêzîyara neteweyên xwedî şaristanî û çandên cûrbicûr. Reûf Mihemed Elî El-Ensarî, lêkolînerê Avahiya Îslamî, rojnameya Elheyat, jîmare: 13356, Şemî, Çiriya Pêşîn (Oktobir) 1999.

<sup>5</sup> Kerkûka Îraqî hembêzîyara neteweyên xwedî şaristanî û çandên cûrbicûr. Reûf Mihemed Elî El-Ensarî, lêkolînerê Avahiya Îslamî, rojnameya Elheyat, jîmare: 13356, Şemî, Çiriya Pêşîn (Oktobir) 1999. Tewfîq Wehbî, çavkaniya borî.

Gava ku Selûqîyan (nisbeta bi bal yek ji serdarên Îskender ve ye) hin beşên bajarên her du çeman dagîr kirine, Kerkûk bi "bajarê Selûqîs" hate navkirin, bo vê yekê hin dibêjin, "Kela Selûqîs". Di pirtûka *El Mincid Fîlalam* çapa wê ya duwanzdehem de bi "Kerka Dibîs Selux" bi nav bûye. Heman ew nav e di pirtûka Dr. Nûrî Talebanî<sup>11</sup> de "Garhha De Beth Selook" e.

Her du lêkolînerên bermahiyan (asaran) ên Îraqî; Baqir Taha û Fuad Sefer (Dr. Cemal Reşîd li dij wan e.) bawer dikin ku navê Kerûkê têkiliya wî bi gotina "gurgur" ve heye. Ev gotin jî Kurdî ye. Ji dengê "Agir" û "Ronahîyê" hatiye girtin. Lê "Baba Gurgur" ev navê niha yê ku ji herêma neftê ye, ji nêzî bajêr re tê gotin, bêjeyeke Kurdî ye. Wateya wî "Bavê Nûranî" ye, bingeha wî wek ku parêzer Ebas Ezawî dibêje, navê şêxekî meşhûr bûye. Şêxek ji şêxên Bektaşiyên Kerkûkê navê wî "Baba Gurgur"<sup>12</sup> bûye.

Hinekan gotiye ew agirê ezêlî yê ku ta îro bêrawestî pêtî dide, di dawîya salên 550an ên B.Z. de, di serdema Nebûxez Nesser (qiralê Babîlî) de derketiye.

Şêx Yaqût el-Hemewî qala Kerkûkê bi navê "Kerxênî" dike û dibêje, "Kelehek di erdekî nizm de xweş ristî, di nava Daqûqa û Erbilê de, li ser girek bilind, avahiyên li dora wê hindik in."<sup>13</sup>

<sup>11</sup> Dr. Nûrî Telebanî, çavkaniya borî.

<sup>12</sup> Ebbas el-Zawî, *Mêjûya Îraqê di Navbera Her Du Dagirkeriyan de*, beşa pêncan, r. 104.

<sup>13</sup> Şêx Yaqût el-Hemewî, *Ferhenga Bajaran*, beşa sêyem.

Ez nanihêrim li wê dîtina ku dibêje navê niha yê bajarî di dema Tîmurleng de jê re hatiye gotin. Çi gava ku qal û behsa dîtînên derbarê hîmê navlêkirina Kerkûkê û dêrînîya bajarî de bête kirin, bêguman avakirina wî vedigere hezarê duwem ê beriya Zayînê.<sup>14</sup> Ji belgeyên bidestketî hatiye zanîn ku li gundê "Terkelan" a ku bi 12 km. dûrî Kerkûkê ye, Kerkûk perçeyek ji bajarên Kaşîyan e (li nik hinek dîrokzanan ew in bapîrên kurdên niha), yên ku di dawîya 1600ê beriya Zayînî de Babîlê dagîr kirine.<sup>15</sup>

Encama axaftinê, Lêkolîner Cercîs dibêje, "Kerkûk navek mêjûyî ye, dûman li serê nîn e, ji wê herêmê tevî re navekî wî yê dîrokî heye, ê ku mêjûzanên ereb û misilman wî nas dikin, ew jî "Bacirmî" an "Kermîk" e.<sup>16</sup>

Kerkûk ji parêzgehên (wîlayet) Îraqê yên din cuda ye, ku bajarek bi bîrên neftê malkar e, cûrbicûr niştecihê wî hene, gelek bûyerên bixwîn lê jîyane, gelek siyasetên nemirovî lê qewimîne derbarê rûniştvanên wî yên bingeşin de ku kurd û li dû re tirkman û bêguman Mesîhî jî ji niştecihên wî yên kevn in. Wê tevkujîya ku Tîmurleng anîye bi serê wan de şahidê vê yekê ye. Hebûna Mesîhîyan li bajêr gelek kevintir e ji hebûna ereban û tirkmanên li wir.

<sup>14</sup> Baldayinek bi dest ketiye di pirtûka "Bajarên Nava Her Du Çeman, Şaristaniyên Babîlî û Aşûriyan", Vêkxistina L. Dilabort, bêjeya "Kûr Kûr" ew derbirîneke bi gelemperî ji alema şêna bi niştecih re tê gotin, lê bi taybet ji derveyî tixûbê Sumeran re, dibe ku li wir têkilî di nav "Kûr Kûr" û navê "Kerkûk" ê niha de hebe, bi taybet gava ku em bînin ber çavê xwe ku Kerkûk li derveyî herêma "Sumer" e.

<sup>15</sup> Parêzer Cercîs Fetullah, *Zêdebûnek bo Borîya Nêz*.

<sup>16</sup> Parêzer Cercîs Fetullah, çavkaniya borî.

Kerkûk di heft esran de naven-deke girîng bûye ji bo Nestûriyên Mesîhî, her tim Kurdî bûye ji bo Usqofên Keldanî. Xwedî şanazî ye bi kevintir dêra di alemê de, ku di nîvê duwemîn ê sadsala pêncan a Zayînî de hatiye avakirin. Ji bo bîranîna şehîdên zilma qiralê Sasaniyan Yezdgurdê duwem (438-457) bi navê "Dêra Şehîdan" hatiye naskirin. Tirkên Osmanî di 1918an de wî kiribûn barxana pêwis- tîyên cengê û xurdemenîyan. Li nik nêzbûna hêzên Brîtanî ber bi bajêr ve, wê dêrê bi tevayî kavi kirin.<sup>17</sup>

Dr. Şakir Xesbak derbarê hebûna Mesîhiyan li bajarê Kerkûkê de ya vê sedsalê wiha dibêje, "Rêjeya suryaniyan di parêzgeha Kerkûkê de gelek hindik e, di bajarê Kerkûkê de bicîh bûne. Koma wan ji keldanî û asûrîyan pêk tê, digel jimareyek hindik ji ermeniyan. Dîyar e ku jimareyeke mezin ji wan ên ku li wir bicîh û war bûne di dawîya Cenga Mezin a Pêşîn de di şîrketa nefta Îraqê de xebitîne.<sup>18</sup> Ji destpêka çaryeka sedsala bîstan heta roja me ya îro di ser Kerkûkê de çend merheleyên bi xeter û aşîkar bihurîne. Kerkûkê serhildana xwe dîyar kir û pênc salan ji derveyî dewleta Îraqê ma. Ango ji sala 1918an ve. Di wê demê de alaya Îraqî li ser avahiyên wê bilind nebû.

## Bûyera Şerê Leşkerên Asûrî

Yek ji bûyerên xemnak ên ku di ser Kerkûkê de bihurîne, bûyera pevçûna nava leşkerên Asûrî<sup>19</sup> û rûniştvanên xwecihî yên di nav bajêr de ye. Ev yek ji wan merheleyan e ku divêt meriv li ser raweste û birame, da ku meriv jê wane (ders) bigre û rewşa Kerkûkê ya wê demê rave û ronî bike. Bo vê yekê ravekirina nihêrînên cûrbicûr derbarê vê rûdanê de ez sûddar dibînim.

Bi dîtina Dr. Qustentîn Betrofiç "... karbidestên neteweyên cûrbicûr fit kirine û wan bera hev dane. Hemû karbidestên Îraqî -ji bilî Refet Paşa serwerê kevn ê Mosilê ku gelek hestiyar bû bo pirsgerêka asûriyan, û dixebitî ji bo yekîtiya nava gelên cûrbicûr ên Îraqî- hewl didan agirê fitnetiyê geş bikin di nava netewan de, ku gelek bûyer şahidiyê li ser vê yekê dikin, digel wî şerê bixwîn ku di 4ê Gulana 1924an de li Kerkûkê qewimî. Pirsgerêk li sûkê dest pê kir, di nav firoşkarên tirk ên xwecihî û leşkerên asûrî de. Dû re li kolanên bajêr belav bû. Heta ku serdarîya asûrîyan bêgav bû ku hin yekîneyên leşkerî û hin hêzan bihinêre (bişîne) bajêr. Bes wê demê şer rawestiya. Lê roja li dû re misilmanên xwecihî êrîş birin bi ser malên asûriyan de. Wê gavê karbidestên îngilîzî dest bi girtina sedem û egerên şer kirin û wan dadgeh kirin."<sup>20</sup>

<sup>19</sup> Hin nivîskarên asûrî bawer dikin ku guhartina tîpa "ş" yê bi "s" ye, li Îraqê asûrî bi asûrî tên naskirin. Her çend bi fonolojiye ve têtê girêdan, lê ew ji viya gelek kûrtir e, ji vê guhartina hêsan a her du pîtan (tîp) re wateyek siyasî û fikrî heye di fikra Îraqî de. Armanca wan ew e, ku bibêjin asûrî ne asûriyên kevn in, wan ên ku Împeratoriyeke fireh ava kiribûn û di hezarê pêşîn ê beriya Zayînê de li gorepanên dirêj û fireh li herêma El-Hîlal û El-Xesîb (Heyva Berdar, bideramet) serwerî kirine. Asûrî di hizra Îraqî de, Ebremer Şibîra, macîstêr di ilmê civakî de, Kovara Eştar, jimara pêşîn, sala pêşîn zivistana 1999.

<sup>20</sup> F. B. Matyîf (Barimtî), *Asûrî û Pîrsa Asûrî di Sedsala Nû de*, wergera H.D.E. El-Ehalî bo weşanê.

<sup>17</sup> Parêzer Cercîs Fetullah, çavkaniya borî, Bo zêdebûna agahdariya derbarê dêrên kevn de serî li pirtûka "Tur-Abdîn" dide, vêkxistina "Hollerwoger" bi zimanê Tirkî û Elmanî û Îngilîzî. Mînak li wir navê hin dêrên kevn hene, ew bi xwe dêrîntirîn ji wan ên lêkolîner, Parêzer Cercîs Fetullah gotine. Mînak dêra "Mor Hsabon" li gundek nêzî Mîdyadê di dawîya 400î de hatiye avakirin. Agahiyên ku min gotin, encama guftûgoyên bi hinek dostên sûryanî re bû, li Siwêd.

<sup>18</sup> Dr. Şakir Xesbak, *Îraqa Bakur*: Lêkolîna hawîrdorên wê yên xweristî û mirovahî, Çapxaneya Şefîq, Bexda, 1973.

Lê dîrokzanê Îraqî Ebdurrezzaq el-Hesenî ji hêleke din ve li bûyerê dini-hêre û dibêje, "Di 4ê meha Gulana sala 1924an de komek ji leşkerên asûrî li sûkên Kerkûkê hin pêwistîyên xwe dikirrîn. Hinek ji leşkeran û yek ji dêmanîyan pevdiçînin, yek ji leşkeran birîndar dibe, yên din direvin navendên xwe. Hawar didin hevalên xwe û hemû bi hev re alavên kuştin û wêrankirinê hildigirin, ji navendên xwe derdikevin, rastê kî tîn agir lê dibarînin. Du polîs dixwazin bibin asteng, her duwan jî dikuvin. Serkarê polîsan Murad Rehmetullah û îbn-Mûbarek derketina hêzên polîsan ji navendên wan asteng dikin, serdarên polîsên Brîtanî vê yekê dixwaze. Xwecih (bajarîyên sîvîl) bêgav dimînin ku xwe biparêzin. Leşker xwe diavêjin malên mesîhiyan, ji malan bi xwecihîyan re şer dikin, ên tîn kuştin, ên tîn birîndarkirin; jimareya birîndar û kuştîyan nêzikî dusedî dibin."<sup>21</sup>

Di 5ê Gulana sala 1924an de nûnerê Îngilîz H. Dûbs agahdarî dide, têde ev heye: "Karesata duh serê sibehê karîgerîyek pirr li ser min kir, ji roja pêşîn ve em leşkerên asûrî ji Kerkûkê derdixin, dibin cîyekî dûr. Hin serdarên Brîtanî hatine bijartin. Wê bi lezûbez lêgerîna bikin. Ez soz û bext didim we (bo xwecihîyên Kerkûkê) gava gunehê yekê ji wan biselme, em dê di sizakirina wî de kêmasî nîşan nedin, ên ku zirar û zîyan dîtine jî dê zirar û zîyana wan bê dabînkirin."<sup>22</sup>

<sup>21</sup> Ebdurrezzaq El-Hesenî, *Mêjûya Wezîrtiyên Îraqê*, beşa pêşîn û çapa wê ya heftemîn a fireh û zêdekirî.

<sup>22</sup> Ebdurrezzaq el-Hesenî, çavkaniya borî. Hinek kitkîten din hene, em li vir nikarin qala wan bikin.

Lê di pey viya de gelek dît ku ew dadgehkirina ku hatibû sozdan di ser re bû, lewre dozê birin dadgeheke taybet. Heyeta vê dadgehê ji serokê dadgeha pêşîn a Kerkûkê el-Mistîr Brîcard bi serokî, endamê dadmendê Kerkûkê birêz Amin Nezmî û dadmendê aşîyê Ebdilkerîm Kerkûkî, efserek Brîtanî ji serokatiya esmanî û el-Mar Şemûn patîkê asûrî pêk dihat. Raya giştî li rû hebûna patîk di dadgehê de derket.

Lê gotinên brîtanîyîyên ku ji rêvebirina Îraqê berpirs bûn, ev bûn: "Di bûyera Kerkûkê de jimareyek ji misilmanan hatine kuştin, li ser destê du komên di bajêr de digerin. Agir berdane ser her kesên ku dinen misilman in."<sup>23</sup>

Karbidestê bilind yekîneyek pîyadeyên Brîtanîyê şandiye Kerkûkê da ku giyanê Mesîhiyan biparêze ji tolhildana Misilmanên ku bi çavê serê xwe dîtîbûn ku çawa Mesîhiyan malên xwe ji leşkeran re vekiribûn û derfet dabûn wan ku bikevin hundir û bi xwecihîyan re şer bikin."<sup>24</sup>

Lêkolînerê Îraqî Cercîs Fethullahê parêzer derbarê destpêka vê bûyerê de hin kitkîten hûr ên ku me di çavkaniyên din de nedîtine vedibêje. Lewre ew bûyerê bi awayê ku hatiye dinirxîne ku dibêje, "Di serê sibeha 4ê Gulana 1924an de du leşkerên asûrî ji bo kirrîna pêwistîyên xwe tîne sûkê, ew û firoşkarên tirkman bi dev didin hev, paşê vedigere şerê destan û hin dikandarên din jî tevî dibin. Hinek dibêjin, ev bûyer ji rûyê hin gotinên kirêt çêbûye, hin gotinên ku li dilê meriv dikevin,

<sup>23</sup> Ebdurrezzaq el-Hesenî, çavkaniya borî.

<sup>24</sup> Ebdurrezzaq el-Hesenî, çavkaniya borî.

agir di xwîna rojhilatîyan de dadidin û meriv nikare xwe li ber wan bigre! Di rûniştina dadgehkirina leşke-rên berguman de ji şahidan hatiye bihîstin ku tirkmanan ji leşkeran re hin gotinên ku bi şeref û namûsa meriv dikevin gotine, wek "Hûn dê herin şer ...!.. Wê gavê em dê bi jinên we wiha, wiha bikin!..." Digel bi îşaretên bi dest û endamên din, îşaretên biwate! Bi rastî viya ne destpêk bûye, belkî encama nefret û hêrsa wan a razayî bûye. Ji dema wan biyanîyên ji derve hatine Kerkûkê û di kolanên wî de bi qureti dimeşîyan, nûnerîya hêzên dagîrker dikirin." Li jorê di rûpela 736an de bi ser ve dike: "Tişteki din jî, ku tu çavkanîyên Îraqî ji binî ve qal nakin heye, ku hinekan xwecihîyên çekdar fit kirine, ew jî ji bo tolhildanê radibin di roja duduyan de êrîş dibin taxa mesîhiyên Keldanî, malên wan talan dikin, deh û tişteki ji wan dikujin, yek jî dadgeh nabe."<sup>25</sup>

Piştî du sal ji dîroka bûyerê, di 29ê Pûşpera 1926an de, di bin zordestiya îngilîzan de hukumeta Îraqê, biryara lêborîna sizadiyîyên (cezaxwarîyên) di bûyerê de, da. Dadgeha taybet bo heşt merivan cezaya bigirtîgehê ya herûher (muebet) û pênc salan jî dabû yekî. Lêborîn ji bo van egeran bû:

- a) Tawanên ku wan kiribûn encama fitkirinên berwest bûn.
- b) Biyanîtiya wan di vê niştimanê de, ji bo ku reha bibin ji karesat û xaxên tûşî wan bûbûn û bi rengekî xweş û hêsan di bin parastina Hukumeta Îraqê de bijîn, li welatên cûrbicûr

koçber bûne. Ji ber vê yekê hêjayî lêbûn û dilnermiya qiral in.

c) Bihurîna gelek dem di ser bûyerê de. Jibîrbûyîna encam û karîgerîyên bûyerê bi rengekî wisa ku ne hêja ye heta dawîya wê sizayê dirêj di girtîgehê de bimînin.

d) Binemal û malbatên wan, di rewşekê de ne ku meriv ji wan re digrî, di tenganîya pêwistîyên jiyanê de ne.

e) Lêborîna ku tete xwestin bi hinek mercan ve girêdayî ye. Lewre dê tîkûz serbest nebin. Dê li warekî diyar de bin, di bin çavdêriyê de bin. Ev yek egerê lêborînê ye. Meclîsa wezîran biryar girt ku wan hemûyan bihinêre (bişîne) gundê "May" a li bakûrê rojavayê Îmadîyê ye.<sup>26</sup>

Sedem û egerên nepenîyên di pişt bûyerê de çi dibin bila bibin, ê ku gava qal û behsa wan bike, divêt dîr nemîne ji qala destûrdarê wê demê, ji hestên gihanî yên encamên Cenga Cîhanê ya Pêşîn, ji rola tevgerên hêlên dijber di dema cengê de, karîgerîya vê rolê di dilê xwecihîyan de, ku cûrbicûr netew û cûrbicûr dîn bûn. Osmaniyan di serweriya bajarî de ji ber zimanê hevbeş hêmanên tirkmanî di ser kurdan re digirtin. Ji ber vê yekê tirkmanan xwe serwerên bajêr didît. Yek nedişîya bikeve qirika wan. Bi reva Osmaniyan di Cenga Cîhanê ya Pêşîn de, ev rewş di eleniya tirkmanan de guherî. Leşkerên asûrî di cengê de roleke girîng lîstin di leha hêzên dijber ên Osmaniyan de. Bo vê yekê di hêla tirkman û gelek

<sup>25</sup> Cercîs Fetullah, *Iraq di Serdema Qasim de: Boçûn û Bîrewerîyên 1958-1988*, beşa duwem.

<sup>26</sup> Ebdurrezraq Elhesenî, *Mêjûya Wezîrtîyan*, beşa duwem, "Tevahiya raportên civata wezîran ên mehên Nisana Pûşber 1926, r. 160-162",

kurdan ve nehatin heskirin. Ji ber ku leşkerên asûrî di şer de li dijî daxwazên Şêx Mehmûdê Hefîd bo hebûna kurdan, hêla îngilîzan kirin; li ser hesabê îngilîzan di pelîşandina şoreşa Bîtsî de roleke aşîkar lîstin. Ev şixul bûn sedemê nefreta misilmanên bi sedsalan di bin sîya alaya îslamê de jîyabûn, ew alaya ku Babê Alî di Îstanbulê de nûnerîya wê dikir. Hebûna wan Mesîhiyên çekdar di wî bajarê ku heta duh ji çarçoveya serweriya îslamî dihat dîtin, li dijî hestên wan û serweriya wan bû. Wan asûrîyên ku li ser destê Osmanîyan eziyet xwaribûn di dema cengê de, di heman rewşê de bûn. Fîtkarê binge-hîn bo wê rûdana xemnak ew giyanê nefret û hezîya nava her du hêlan bû.

Meha Tîrmehê li nik rûniştvanên herêma nava her du çeman îlahê erzanîyê ye. Vê mehê bi xwe, ango pîrr bi nîsbet Îraqîyan ve cudatiya wê heye ji mehên salê yên din. Şoreşa 14ê Tîrmeha sala 1958an di vê mehê de qewimî, da ku berê Îraqê biguhêre û vegere bi hêleke din, ji layê Brîtanya ve hatibû pîlankirin. Derbarê 14ê Tîrmehê de gelean nivisîne. Bi qasî derbarê vê dema kin ji temenê Îraqê a tijî bûyer û guhartin de hatiye nivisîn, di mêjûya Îraqê ya hemdem de ew qas nehatiye nivisîn. Pirranî yekdev in ku jê re dibêjin, "Şoreş". Pirranîya gelê Îraqê vê yekê diselmînin. Hinek din jê re dibêjin, "Guhartin û Diya Pirs-girêkan". Heta ji wan hatiye li dij cengîyane, belkî hevalbendiya di wê de gihîştîye dewreyê tixûb. Hinek hene jê re dibêjin, "Bizava Efserên Azad".

Di hivdehê meha sala 1968an de, bê heylêbûn, Baasiyan deshilatdariyê ji hemûyan girt, heta roja me ya niha. Û herêmê kaşî tirajedî û karesatan kirin ku hemûyê Îraqê ji wan dikîşînin, bi taybetî Kerkûk (qal û behsa wan paşê dê bête gotin), di demên dahatû de bi sedem mîrata giran ya ku Îraq pê ve hatiye qeydkirin em dê ji wan hê pîrr bikişînin! Bîranînên Kerkûkê yên tahl bi giştî di meha Tîrmehê de hene. Di 12ê Tîrmeha sala 1946an de bi hindikî deh şehîd bûn digel bîst birîndaran di karberdana Gawirbaxî de.

### **Karberdana Gawirbaxî**

Pîlankara karberdanê Partiya Kominîst a Îraqê bû. Lewre wê îşaretê destpêka karberdanê di roja 3ê Tîrmeha sala 1946an de da. Bi nêzî pênc hezar karkerî vê bange-waziyê pejirand. Daxwaza wan a binge-hîn zêdekirina mizeya (ûcret) rojane ji sedî 80, heta 250 fîlsî bû, û bo bidestxistina hinek mafan bû. Wek sazkirina komeleyê, birêkûpêkkirina dabînê (sîgorta) li dij nexweşî û karberdan û pîrîyê û hwd. Pirranîya karkeran ji şîrketa nefta Îraqî bûn. Piştî çend rûniştinan negihîştin çareserîyek ku her du alîyan razî bikin. Karkeran kiribû adet ku rojê çend katjimêr li baxçeyê Gawirbaxî bibihurînin. Di duwanzdehê Tîrmehê de karkeran dît ku hêzên polîsan ji sê hêlan ve dor ji wan girtine. Di destpêkê de bi daran li wan dan, piştî jihevketina wan, gule li wan barandin. Çi bû û çi nebû!... Piştî lêkolînê hat dîtin ku hemû kuştî ji pişt ve gule li wan ketine.

## Bûyerên Kerkûkê yên bixwîn di Tîrmeha 1959an de <sup>27</sup>

Sêzdeh sal piştî karberdana Gawirbaxî di vê mehê de, di çardeh û pazdehê Tîrmeha sala 1959an de li bajarê Kerkûkê hinek bûyerên bi xwîn hatin jîyîn. Qurbanîyên wan ji xwecihiyên Kerkûkê bûn; sîh û yek (31) kuştî û bi nîzîkî sîh (30) birîndarî. Ev jimar li gor pirtûka *Îraq* ya Hena Betatû ne, lê li nik Cercîs Fetullah parêzer, "32 kuştî û 130 birîndar bûne". Pirranîya wan tirkman bûne, di encama nijadperestîya qewmî û pevçûna vê yekê de. Di 22ê Pûşpera sala 1963an de bi ser jimareya qurbanîyan ve bîst û heşt kesên din jî hatin daleqandin. Pirranîya wan destê wan tevlî xwîna qurbanîyên pêvajoya 14ê Tîrmeha 1959an nebûbû. Ji bilî çar tirkmanan, ên din kurd bûn. Tevlî ku 43 sal di ser wan bûyerên bixwîn re derbas bûye û digel xebatên hêlên dijber ên wê demê jî, hîn perde ji ser berpîrsên bingeîn ên wan bûyeran ranebûye. Her wisa ranebûye ji ser fitker û pîlankerên wan bûyeran di pişt perdeyê de. Her wekî ku dîyar e, lehengên vê şanoya bixwîn ji kurd û tirkman û ko-minîstan bûne. Mamoste Hena Betatû, serokatiya Partiya Kominîst a Îraqê ya berê dikir ji bo tedvîrgerandina vê bûyerê. Lewre dibêjin "Niha baş xuya bû ku ew bûyer nehâtine tedvîrkerin ji alîyê mezinên wan ve, ango ji hêla kominîstan ve û çavgiirtinî jî jê re

<sup>27</sup> Qala kitkita bûyerê dûbarekirina ku meriv dibetilîne ye. Belga derbarê wê de nivîsiye û her hêlek guneh avêtîye ustûyê ê din. Bo vê yekê li vêrê qala dîtinên mêjûvanên ku wan bûyeran bigiyanek bê alîdarî û dûrê hestên jîheddeer, girtine dest, em dê bikin..

nekirine.<sup>28</sup> Nîjadperest sûcî diavêjin stûyê kurdan de. Refîq ebû Surûd, wek ku Cercîs Fethullahê parêzer vî navî jê re dibêje<sup>29</sup> berpîrsên vê bûyerê karkerên şîrketa nefta Îraqê dibînin. Tirkman jî dibêjin, ew tiştê di wê pêvajoyê de qewimî karkeran tevdîr kiribû. Di pişt wî de kominîst û kurd bûn. Kurd jî bawer dikin ku fitkirin ji hêla tirkmanan ve dest pê kiriye. Berîya rûdanê bi çend rojan dirûşmên fitker berze kirin. Semed çi dibin û ê ku vê tevdana xemnak kiriye kî dibe bila bibe, lê metirsiya şerên Kerkûkê dê bidome, wek çirûskeke ku tibabek dînamîtan dîtqîne! Êdî wê gavê xebata ji bo ku viya bi fitkirinê bû yan jî bi tevdana kî bû? Tu sûdê nade.<sup>30</sup>

Dr. Nûrî Telabanî wiha bawer dike, "Dîyarkirina sedemên bingeîn ên wê bûyerê gelek zor e, lewre hin sedemên ku hev temam dikirin hebûne, her du hêl jî ketine bin karîgerîya fitên desthilatdariyê, rola fitên komên neteweyî, fitên Baasîyên hevalbendên tirkmanan û rola hin sedemên derve jî hebûye."<sup>31</sup>

Ev dîtina Nûrî Talebanî ku rola fitkirina desthilatdariyê tê de heye, tê zexmkirin bi baweriya Cercîs Fetullah ku dibêje, "Li wir xelegeke windabûyî heye, bi ravekirina rastîyên vê xalê, tiştên ber çav. Piştî

<sup>28</sup> Hena Betatû, *El-Îraq*, pirtûka sêyem, Qominîst û Baasî û Efserên Azad, wergêra Efff El-Rezzaq.

<sup>29</sup> Di axaftinek de ku kovara Çanda Nû weşandiye 6. 9.1983. Cercîs Fethullah, *Îraq di Serdema Qasim de*, boçûn û bireweriyên 1958, beşa duwem, 1988.

<sup>30</sup> Cercîs Fethullah, *Îraq di Serdema Qasim de*, boçûn û bireweriyên 1958-1988, beşa duwem.

<sup>31</sup> Dr. Nûrî Talebanî, mamostayê zankoyê di zagonê de, *Herêma Kerkûkê û Hewlêdanê Guhartina Rastiya Neteweyî*, Londra, 1995

bûyera bixwîn, serwerê leşkerî ku karkerek di fermana Qasim de bû, lijneyek lêkolînê şiyand, bi serokatîya orgeneral Ebdurrehman Ebdusetar, bi endamtiya qazîyê Dadgeha Temyîzê Wedî Curcî û qazî Hafîz Xalîd, yarbay Sebîh Reûf, Serdar, Şakîb el-Mudellel. Min zanî ku nivîsarek dirêj hatiye amadekirin. Birêz Wedî Curcî wê rêkiriye. Armanca lijneyê bicihanîna lêkolîna derbarê bûyerê de, tewqîfa bergumanan û bicihanîna xebatên kişîrkirina kiryar û sedeman. Yekî jî ji wan ên derbarê karesatê de nivîsîna xwe negihîştandine vê belgeyê.<sup>32</sup>

Niha di arşîva Wezaretê Berevaniyê de, li benda musameheyê ye ji bo ku lêkolîner jê sûdê wergirin. Gelo bo çî nivîskaran derbarê vê karesatê de ji bo bidestxistina wê hewl nedane? Gelek ji wan jî şîyana wan li ser vê yekê hebû. Heta sazîyên fermî bi xwe jî vebir egerên wan bûyeran nîşan nadin. Gotara ku serkarê polîsan ji femandariya wan re şandiye, dîyar dike ku tevdan û fitîkirin ji hêla tirkmanan ve bûye. Serkarê ewlekariyê dike stûyê hin beşên leşkerî ku pîrrê wan jî kurd bûne.<sup>33</sup>

Mamoste Hena Betatû di cîyekî din de ji mijara xwe ya derbarê wan bûyeran de, bo ku careke din zexm bike, dibêje "Gava ku bête gotin, ew teqîn

bi pîlan û tedvîr bûye, an ji rûyê keldanî û pêldanên cûrbicûr ên ji heder ku dubare dibin bo nefret û neyartîyên nijadî, yan encama her duwan pev re ye."<sup>34</sup>

Di namilkeyeke bê dîrok de du mezinên tirkman; Teshîn Refet û Şakîr Sabîr, îddîa dikin ku berîya rûdanan bi çend rojan ji êlên kurdên li dora bajêr gelek zîlam anîne nav bajêr. Viya jî bo zeximkirina ku bûyer bi pîlan e, digel ku bûyer dijî wî diselimînin. Gotara Dr. Nûrî Talebanî dibêje, "Efserên kurd roleke mezin listin di desteserkirina rewşên ewleka- riyê de yên xirab bûbûn di bajêr de û bûn astenga destdirêjiya can û malan, û nehiştina cotkarên kurd ên gundên li nêzî Kerkûkê ku bikevin bajarî di sibeha 15ê Tîrmeha 1959an de, gelek tiştên nexweş ên di pey re dê çêbûbûna, asteng kirin."<sup>35</sup>

Bîrhatîyên wê bûyera biêş, her li hişên aliyên tund dixê, agirê nefret û neyartîyê geş dike. Her alî dixebite ku tawan û gumanên berê biavêje stûyê ê din. Bêguman tu aliyek ji wan bûyeran sûddar nebûye. Betatû dibêje, "Bi qasî wan bûyerên Kerkûkê yên bixwîn ku 14-16ê Tîrmehê de pêk hatin, tu tişteke ezîyetê nedaye kominîstan."<sup>36</sup>

Di vê yekê de Cercîs hevalbendiya Betatû dike, "Nehatiye serê Partiya Kominîst a Îraqê û kominîstên Îraqî ji ezîyet û xirabbûna navê wan bi qasî ku wan bûyerên di 14-15ê meha Tîrmeha 1959an de qewimîn ku anîye bi serê wan de..."<sup>37</sup>

<sup>32</sup> Ebdurrezzaq El-Hesenî, çavkaniya borî.

<sup>33</sup> Mamosta Hena Batût, di pirtûka xwe ya navborî de qala vê agahiyê dike û her wisa lêkolîner Ebdurrezzaq El-Hesenî jî qala wê dike, "Raportek ji gerîndeyên polîsan, ku ji parêzger re hatiye şandin: bi nivîsa jimare: 497 û bi mêjûya 15ê Tîrmeh. "Raportek ji gerîndeyên ewletîya Kerkûkê bo gerîndeyê ewletîya giştî bi nivîsa jimare: 6433 bi mêjûya 18ê Tîrmehê.

<sup>34</sup> Hena Batût, çavkaniya borî.

<sup>35</sup> Dr. Nûrî Telebanî, çavkaniya borî.

<sup>36</sup> Hena Batût, çavkaniya borî.

<sup>37</sup> Cercîs Fetullah, çavkaniya borî.

Ev bûyer bi nîsbet kominîstan, bi nîsbet kurd û tirkmanan, wan bûyerên bi jan her û her wek ewrekî reş li ser tîkiliyên wan ên bi hev re kon vedigre. Di sîyaseta wan a pîlankirî de, Baasiyan bo erebkirina bajarê Kerkûkê sudek mezin ji vê yekê dît. Lewre şewata Baasiyan bi kurdan tenê nesekini, tirkman jî girt binê xwe. Ji nav lêkolîna me ya wê serdemê ji dîroka Îraqê, em têgihîştin ku hin aliyan ji rûdanên wan rojên bêyom sûd dîtine, hene. Tenê nav û dengê kominîstan bi wan rûdanan xirab nebû, belkî şoreşa 14ê Tîrmehê bi xwe jî li pêş neyarên xwe tazîm e. Ew dijmînên ku li benda zîllet û kêmahiyên wê bûn, da ku ya herî piçûk, herî mezin nîşan bidin ku şîrketa nefta Îraqê ji rojava heta Komara Erebia Yekbûyî. Tu dev ji şîtatên hevî berde, Îrana Şah, Tirkîye ya hevalbenda Rojava û endama Sentoyê. Ji ber ku bidestxistina wê hêmana ku ber pê dirijyan bo pîskirina Şoreşê û eybdarkirina serokê wê Evdîlkerîm Qasim, bi taybet alavên ragihandinê yên Misrê û di wê rewşê de ku hê di ser şîtata Îraqê ya nû de salek nebihurîye, ya ku bi van hêzên dijmîn dorpeç bûye. Gelê ne mentiqî ye ku pêçiya van hêzan di pişt perdeyê de dafikên nepenî bihonin? Kî bûn maldarên ku alîkariya koman dikirin bi mal? Bi navê kêmkirinên veşarî (Elmûnaqe-satussir-riyeh) hatibûn naskirin û bo windakirina kasayetiyan çepgir û navdarên kurd li Kerkûkê dixebitîn.<sup>38</sup> Wan koman bi maldaran re diketin bazarê û li dij hev diketin berberîyeke pîs û ecêb ku heta niha nehatiye bihîstin.

<sup>38</sup> Vê rastîyê ji min re gelek bi şid û bid got. Ev yek ji mikurên hin ji wan koman bûn di girtîgeha Kerkûkê de, ji girtîyên sîyasî re ku bi wan re di girtîgehê de bûn, hatibûn mikurê, ango bi kirinên xwe yên kirêt hatibûn mikurê qal kir. Ji min re yekî ku guman û şûbheya min di gotinên wî de nîn e, ku yek ji endamên wan Koman

Bo her serîyek mîqdarek mal hebû di komkirineke veşarî de. Koma ku amade bû ji kuştinê re, heta bi erzantir pereyî, ew bû ku serê qurbaniyek û mîqdarek di hate dayin, bidest dixist. Bêguman Baasî û baskê qewmî yê erebî li Îraqê û derveyî wê yên ku li dijî serweriya Qasim bûn, roleke ne hindik lîstin bi avêtina êzingan a nav agirê geş. Piştî di ser wan rûdanan de bihurîna wê tibabê ji zeman, divê em vê pîrsê bikin, ku gelo dem hê jî nehatiye bo pêçana rûpela reş ji mêjûya bajarî, û bo destpêkirina xebata hevbeş ji bo rawestina pêş sîyaseta erebkirinê û bo avakirina bajarê Kerkûkê li ser hîmê têgihîştinê, biratiya netewan, bo gelên dahatû?

Gava ku em bobelat û karesatên ku li ser bajarî de derbas bûne istîsna bikin, mafê Kerkûkê yê ku şanaz bike bi lawên xwe yên ku navê wî bilind kirine di esmanê wêjeyê de ji nava "Mecmûetû Kerkûk" an "Cemaetû Kerkûk" a bi rêz, a ku roleke bingeîn lîstîye di pêşveçûna helbesta Îraqî de. Ber û semereya wan bû wek oksîjena ku helbesta Îraqî hiljenî (tenefus kir) bi derbirrîna helbestvan Ebdulqadir el-Cenabî.<sup>39</sup>

Helbestvan û romannûs Fadil el-Ezawî yê ku dilê cematê ye, ew jî îşaret dike ku "Li bal ruh û giyanê nû yê ku Koma Kerkûkê biriye Bexdayê û bandoriya xwe li ser wêjeya Îraqê hiştîye."<sup>40</sup>

bû û navê wî jî Serbî bû, bi vê rastîyê hat mikurê, bi devê xwe yê tije digot, "Ew bûyer qurbana listîkek bi qirêj a mezinên wan serbest û li derveyî girtîgehê kêf dikin, ew jî ne paşeroja xwe zane û ne zane wê çi bête serê wî. Ew dostê min ê ku vê agahiyê da min wiha dewam kir, "Ez beriya ku bême girtin, min ji Partiya Kominist bihîst ku koman wan kiryanan dikin he ne, lê min digot ev propagandaya dijber e, heta ku ez rastê wan hatim li girtîgehê, li sala 1961an.

<sup>39</sup> *Cûdayîyên Helbesta Îraqî ya Nû*, bijartin û belgekirin û pêşkêşkirin, Ebdulqadir El-Cenabî.

<sup>40</sup> Şahidiya Fadil El-Ezawî, Kovara *Feradis*, jimare: 4 û 5.

## **Koma Kerkûkê**

Koma Kerkûkê di wî bajarî de wateya biratiya neteweyan anî ber çavan ku xuya kirîye piştî neftê nav lê fikir. Pirrnetewebûna wî bûbû sedemê rûdanên bi xwîn, ên ku rewşa dêrana wan zehmet e. Digel taybetiyên bajêr û pirrneteweyîya wî, ev civatê ji lawên wî kom bû. Xweşikiya zimanê nivîsandina wan û dilê helbest û wêjeyê wan civandibû ser hev. Bi vî dixwestin ramanên rizîyayî yên bilindbûyî biguhêrin. Armanca wê nûveda-na herî xweşik, serîrakerîna pêş teqlîdê bû. Yek ji birêvebirên vê civatê ku Serkûn Bûlîs e, wiha pesnê wî dide, "Civandina vê koma çalak di bajarek wek Kerkûkê de, di wê demê bi xwe de, ji mûcîzeyek piçûk ne hindiktir e."<sup>41</sup> Koma Kerkûkê ev e: Fadil el-Zawî, Serkûn Bûlîs, Yûsif el-Heyderî, Enwer el-Gêsanî, Mueyyed el-Rawî, Muhyeddîn Zengene, Selah Fayîq, Celîl el-Qeysî, Can Demû û Peder Yûsif Seîd. Her yek ji vana şopek û bandorek aşîkar û bi rûmet li ser nifşa şêstî ya Îraqê hiştiye, çî di helbestê yan roman yan şanoyê de.

Digel jiyana neyînî ya ku Komê ji hev dûr xistibû di dûgelên (dewlet) alemê de, gihiştina wan û serdanên wan ên kin ji hev nediqetiyên, da ku vegerînin wan rojên ku dilê wan pîrr dixwest, bi awayek banga dehşet û ecêbmayînê fikir. Pîrtirê wan jî Peder Yûsif Seîd bû, ê ku ji dêrê bû û cîyekî amade kiribû bo kombûn û hevdiştin û nîqasha ser qesîde û nûjenî di wêjeya alemê de. Di bîranînên wî de cîyekî teybet ê Kerkûkê heye, ku dibêje, "Du kolan dirêj dibûn di wî bajarê xweşik de, di yekî ji wan de û di şevek bihurî de

rastê helbestvanek gelek rûbiken û zimanşîrîn hatim. Bi pêçîyên xwe helbestvan û nivîskarên din bi rayî min dida. Cudahiya temen û karê rojane me ji hev diqetand. Lewre ez berpirs bûm, di kolana ku navê wê "Kolana Rawestgehê" bû de dijîyam. Gava ku ez rastî wan hatim, xortên teze bûn, li cîyê ku dê pirtûkên evînî bixwendana, min dît ku xerîkî bi wêjeya alemê ne, wek romanên helbestî.

"Tiştê herî xerîb û li ber çavan bi wan re ev bû, ku jiyana xwe hemû dabûn wêjeyê. Bê heskirina dinyayê dijîn, bê daxwazên maddî û erkî, bi vî awayê man heta îro. Ez gava ku rastê wan hatim, karê wan behsa ji nûjeniyê bû, her yek ji wan destxistîyê xwe digihand ên din, ola wan û netewa wan û rêzaniya wan, wan ji hev cuda nedikir..." Peder wiha didomîne, "Me, wê komê her sal serdana wî bajarê xweşik fikir, civînan pêk dihanî, yan di dêrê de yan jî di mala me yekî de."<sup>42</sup>

Ev mûcîze yeke çandî bû ku sîyasatmedaran jê fam nedikirin. Berîya sêsed salî helbestvanê kurd Ehmedê Xanî yê xwedîyê Mem û Zînê bi dengê bilind gazî kirîye û gotiye, "Helbestvan ne berpirsê zulmê ne, berpirs serwer û hikumdar in!"

Digel xebata vê koma hêja bo pêşvebirina helbest û roman û çîrokê bi awayek gelemperî, ew tiştê ku wan ji nifşa şêstî yên din vediqetîne cûrbicûriya netewî û olî ya vê Komê ye. Her yek ji wan re kenda (îrsa) xwe ya dîrokî û ferhengî hildigirt, digihand wê zarê ku pê dinivîsandin (ku erebî bû) da ku wêjeyek ji dengên berî û netewî û olî yê paqij were meydane. Ev cûr

<sup>41</sup> Şahidiya serokê polis, *Feradîs*, çavkaniya borî.

<sup>42</sup> Şahidiya Ebdurehman Mecîd Er-Rîbî, *Feradîs*, çavkaniya borî.

bicûreyahan li dijî sîyasatmedariyê ye, ya ku nakokîyên nijadî diafirîne da ku yek li yekî bixe û ew sûdê jê bigre. Di bûyerên Kerkûkê yên bi xwînê de ev tişt bi xwe bû.

Helbestvanê Îraqî yê bi navûdeng Ebdurrahman Mecîd er-Ribî ji koma Kerkûkê diaxive û dibêje, "Di bajarên Îraqî yên din de komên wêjevanan hebûn ên ku berhemên xwe bi roj-nameyên Bexdayê û kovarên Erebi de diweşandin. Mezintirên wan koman û ya ku zêdetirîn bala meriv dikêşand "Koma Kerkûkê" bû ya ku ji ereb û kurd û asûrî yan pêk dihat û bi Erebi dinivîsand."<sup>43</sup>

Enwer el-Gêsanî ku yek ji vê Komê ye, rengêkî din bi me dide hînkirin, yê xweşik û ronîkerê vî bajarê ku di bin perdeyê de hiştine, wek ku ji bilî neftê tiştek tê de nîn e. Ji rûyê siyasetên bala yên rejîmên dawîn û ji ber kêmnihêrîna

kom ji Kerkûkê hat, xuya bû ji mêjûya dirêj a pêşveçûna hunerî û ramanî ya wî bajarî yê ku her tim cî û war bûye bo hin mirovên ku girêdayê bi huner û stran û raman û hezkirinê ve bûne. Çarçoveya firehtir a Koma Kerkûkê tê de bûn, gava gihîşte Bexdayê ji hin kesayetîyan pêk dihat wek, Suad el-Hurmuza (nivîskar, rojnamevan, bêjer), Ebdussemmed Xanîqah (romannivîs, parêzer), Qehtan Necatî el-Hurmuza (romannivîs), Îsmet Necatî el-Hurmuza (nûnerê şanoyê), Muhyeddîn Zengene (romannivîs), Yusif el-Heyderî (romannivîs), Zuhdî el-Dawudî (derhêner), Muhemed Ehmed Rustem (romannivîs), el-Qus Yûsiv Seîd (rexnegir). Derbarê wan û di çarçoveya herî fireh de hinek din jî hebûne wek, Sînan Seîd (rojnamevan, wênekêş), Mehmûd el-Ûbeydî (wênekêş), Yarbay Siddîq Ehmed (wênekêş), Faîq Masum (romannivîs), Huseyn Elî el-Hewremanî (romannivîs), helbestvan Şêx Rîza Talebanî, helbestvan Dede Hîcrî.<sup>44</sup>

Enwer el-Gêsanî di ciyekî din de, di derbarê îşkence û girtîgehkirinên ku hatiye bi serê wan wêjevanan de, dibêje, "Salên Bexdayê bi nisbet Koma Kerkûkê dema xwedî çand bûn û zehmet kişandibûn, dema gihîştin Bexdayê di ser wan de gelek girtin û îşkence bihurîn, rastê mirin û kuştinê hatin. Me bi çavê serê xwe dît ji derîyek girtîgeha Kerkûkê, êvarek, bîst û şeş zilam ketin avahiya sereke ya girtîgehê, paşê mirî derketin. Piştî xeniqandina

<sup>43</sup> Ez divêm behsa wî helbestvanê bêhemta bikim. Hinek nivîskarên tirkman wek; Şakir Sabrî û Eta Terzî bi başî dibêjin ew tirkman e, lê ji bo rasteqîniya dirokî ez dibêjim; Hîcrî Dede yê Kakayî angaşt a ku tirkman e nekiriye, berovajî wî daxwaz kiriye ku navê wî di nava helbestvanê kurd de be. Helbestvan Dede Hîcrî, helbestên bi kurdî, tirkî û Farisî dinivîsî, 18 vêkxistinê bi her sê zimanan hebûne. Dîwanek wî ya Farisî bi navê "el-Tuht-e-Suleymaniyet" diyarîya Silêmaniyê hebûye. Behsa bajarê Silêmaniyê, herêmen wê, xweşikiya wê, navê el û malbatên wê yên naskirî dike. Her du zaravayên kurdî; Mukrî û Hewremanî pirr xweş dizanî û bi wan helbest dinivîsî, em baş dizanin ku zaravayê Hewramî (Goranî) ew zarav e ku êla Kakayîya kurdiya navdar pê diaxife, a ku ji êlên herî kevn ên Kerkûkî ye, a ku di salên sih û çilîyên sedsala bîstî de weşan dikir. Pirrê helbestên wî yên Kurdî di her du rojnameyên; Jîn û Jiyan de dihatin weşandin. Ev her du kovarên kurdî li Silêmanî derdiketin. Helbestvan Dede Hîcrî çar qesîdeyên bi her du zaravayên kurdî, bi Tirkî û Farisî jî di bîranîna dostê xwe helbestvanê kurd ê mezin Pîremêrd de, di 25.8.1950î de li Silêmaniyê pêşkêş kiriye.

Qesîdeyên xwe bi hisên girînê re pêşkêş dikir ji ber windakirina vî helbestvanê mezin. Hinek ji van e min girtin di gotara nuwaze de hatine, ya wêjevan Xefûr Salih Ebdullah di rojnama el-Menar el-Kurdî de, jimar: 65 duşem 3.9.1999.

<sup>44</sup> Rast 28 e ne 26, wan di bûyerên Kerkûkê yên bi xwînê yên sala 1959an de hatibû gunehbarkirin û hatibûn daleqandin. Piştî Şoreşa 8ê Reşemîya rêş 1963 û pirrê wan jî destê wan tevî xwîna pez nebûbû li gorî derbirrîna parêzer Fethullah.

wan, berbangê termên wan bi qamy-onekveguhezti da ku di kolanan de bi kêzm û dîrekên kehrebayê ve dale-qînin, serê sibehê wan ên ku vana ji xwe re neyar didîtin, bi def û zirne pêşwaziya mirina wan dikirin."<sup>45</sup>

.....

.....

(ev der, ji ber ku mînakên nêzîkê hev bûn, me kurt kir.)

### **Kurdistanîya Kerkûkê û Sîyaseta Erebkirinê**

Ne li gor angaştên kurdan bi tenê, belkî li gor belgeyên dewletê û rastiyên dîrokî û nexşeyên birûmet, kurd herî dêrînên rûniştvan ên herêmê ne: "Eşkere ye ku hîma kurdan ya dîrokî vedigere Kûtîyan, her çendî dîtina meşhûr veğerandine bi bal Medan ve jî. Dîrokzan li ser hebûna miletek bi navê Kûtî (Gûtî), berîya Zayînê bi du hezar salî dijîn di herêmek ku yek ji herêmên kurdan a sereke ye. Ew jî herêma nava çemê Dicle û Zaba Jêr û çemê Diyala ye."<sup>46</sup> Dr. Fuad Kemal derbarê vê xalê de wiha dibêje, "Mêjûya peydabûna kurdan bi tevîbûna Medan û niştecihên resen çêdibe." Yên ku xelkê Kutî ne, babîlîyan ji wan re digot, "Kardû". Nexwe tê ber çavan ku kurd bi hezaran sal e li vê herêmê dijîn. Wateya viya ne ev e ku vî bajarî îro kurdîya xwerû ye. Belkî Kerkûk bajarekî biratîyê ye bi jiyana gelek netewan wek kurd, tirkman, ereb, mesîhî û wd.

\* \* \*

<sup>45</sup> Şahidiya Fadiel el-Ezawî, *Feradîs*, çavkaniya borî.

<sup>46</sup> Dr. Şakir Xesbek, Îraqa Bakur, çavkaniya borî.

Kerkûk di serdema Osmaniyan de navenda wîlayeta Şehrezorê bû, ya ku ji gelek herêmên Kurdistanê pêk dihat, wek: Rewanduz, Erbil, Koysenç, Şeqlewa, Pişder, Ranya. Berîya ku Erbil bibe wîlayeta bi serê xwe û ji veqetandina Rewanduz û Şeqlewa û Pişder û Ranyayê vana bidin ser wîlayeta nû. Dewleta nû ya Îraqê bi Kerkûkê re wek parçeyek ji Kurdistanê Îraqê tevdi-geriya. Viya bû sedem ku Melîk Feyselê Yekem tixûbên welatê xwe ji nûner H. Dûbs bipirse, wî jî pirsra Melîk Feysel hinart (şand) Londinê. Bersîva mîsogerîya Kurdistanîbûna Kerkûkê dupat kir, bersîv derbarê hemû Kurdistanê Başûr de bû.

Tixûbên wî yên başûrî ji silsileya çiyayên Hemrîn dest pê dikir. Dema hukumeta Îraqê di heyama qiraltiyê de zagonê zimanên xwecih ên Îraqê der-xist. Bi taybet zagona bikaranîna zimanê Kurdî kire fealiyetê û gerînen-detîya hindekarî û perwerdeyîyê damezrand, bi taybet bo herêma Kurdistanê. Navenda vê gerînen-detîyê jî Kerkûk bû.

Serjimara ku desteya Yekîtiya Netewan (YN) pêk anî vê yekê dupat dike. Vê desteyê hinartibûn Kurdistanê Îraqê. Di pey nîqaş û gengeşiyên wê gavê de, li ser parêzgeha (wîlayeta) Mosilê gengeşî derketibû; ji hêlek ve Brîtanya-Îraq û Tirkîye, ji hêleke din ve kurd bi tenê li dijî her du hêlan ve. Desteyê ji gelê kurd pirs dikir: "Bi kîjan birêveberîyê re hûn jiyane dixwazin? Bi tirkan re an bi Îraqê re?"

Kesayetiyeke kurd, Babanzade Îzet Begî bersîva wan daye û ji wan hêrs bûye, gotiye "Hûn çima pirs nakin, nabêjin gelo hûn birêveberîya kurdî dixwazin, an na?"

Encama serjimariyê li parêzgeha Kerkûkê bi vî rengê hatibû:

|                  |        |     |
|------------------|--------|-----|
| Jimara kurdan    | 87.500 | %63 |
| Jimara tirkmanan | 26.10. | %19 |
| Jimara ereban    | 25.250 | %18 |

Serjimara Îraqê hindek cuda bû ji serjimara desteya şandî, ew jî bi vî awayî hatibû:

|                  |        |     |
|------------------|--------|-----|
| Jimara kurdan    | 81.400 | %59 |
| Jimara tirkmanan | 58.741 | %21 |
| Jimara ereban    | 26.654 | %19 |

Di ansîklopediya erebî ya alemî de wiha tê gotin, "Kerkûk paytexta komên kurdî ye li bakurê Îraqê."<sup>47</sup> Ansîklopediya erebî ya kurdî di rûpela 449an de dide zanîn ku Kerkûk ji bajarên sereke ye di Kurdistana Îraqê de. Her wiha di ansîklopediya Siwêdî ya salê de jî tê gotin ku Kerkûk di hundirê cografyaya Kurdistanê de ye<sup>48</sup> û yek ji bajarên hilberînerên neftî ye. Vana hinek mînakên hêsan in ji nava ansîklopediyan. Bi dehan govanên (şahid) din hene, Kurdistaniya Kerkûkê dupat dikin.

Ji hêla dîrokê ve jî em dibînin ku êlên kurdan ji her hêlê ve dor ji bajêr girtine. Wek êla Cebârî, Talebanî, Zengene, Şêxbizinî, Caf, Hemewend, Şiwan, Dawidan, Kakanî û ji bilî wan jî pirr in û dirêjîya her yek ji van êlan jî digihîje nava bajêr. Pirrê herêman jî navê wan Kurdî ne, digel newal û gir û mayîyê hêmayên (nîşanên) bajêr.

Li wir wisa hinek êlên tirkman û ereban jî li dora bajêr hene, lê hindik in, ne qasî êlên kurdan e. Bo zeximkirina Kurdistaniya Kerkûkê, em vê jî dibêjin, "Mezinê êla Dawidî Dara Beg ji

pêşîyên parlamenterên Kerkûkê ye, bo ku nûneriya bajêr bike di civata damezirîner de li sala 1924an.

Dîsa hêjayî gotinê ye ku parêzgerê pêşîn ê vî bajêrî kesayetiyeke kurd e. General Fetah kurê Silêman Paşa, nasbûyî bi Fettah Paşa ye. Piştî vêkxistina hukumeta Îraqê di tarîxa 15. 8. 1921an de hatiye tayîn û terxankirin bo parêzgeriya Kerkûkê. Di vî meqamî de bi nêzî çar salan ma, heta sala 1924an.<sup>49</sup>

Pirraniya nûnerên Kerkûkê di heyama qiraliyeyê de ji kurdan bûn, her wekî mînak, di Reşemîya sala 1937an de Ehmed el-Kerkûkî hatiye bijartin bo ku nûneriya Kerkûkê bike di civata nûneran de, di Berfanbara sala 1937an de hîlbijartina wî tê nûkirin.

Di salên 1935-1939an de Faîq Talebanî bo nûneriya Kerkûkê tê hîlbijartin. Her wekî Şêx Ebdilwehab kurê Şêx Hemîd kurê Ezît Talebanî di salên 1946-1948an de tê hîlbijartin.

Her wisa kesayetiyeke kurd Emîn Reşîd Axa ji mezinên êla Hemewend di 1939an de tê hîlbijartin û dibe nûnerê Kerkûkê. Mihemed Seîd Qezzaz di sala 1953an de tê hîlbijartin, dibe nûnerê Kerkûkê.

Mêjûzanê bi nav û deng Ebbas el-Ezawî nîşan dide ku Emîn Reşîd Axa bo nûneriya Kerkûkê hatiye hîlbijartin di salên 1940-1947an de.<sup>50</sup>

Heger em vegerin paş, ango sala 1872-1873an û li çavkaniyên dîrokî binihêrin, em dê bibînin ku kurd rêjeyeke bêqeyd û merc û bê hemta rûniştvanên Kerkûkê pêk tînin. Muhendîsê Urisî Yûsiv Cîrnîk li ser

<sup>47</sup> *Ansîklopediya Erebi ya Alemî*, beşa 19, saziya karên Ansîklopediyê bo weşan û belavkirinê.

<sup>48</sup> 1975 Hur, Var, Nar.

<sup>49</sup> Mîr Besrî, *Navdarên Kurd*, çapa pêşîn, Dîsembere 1991.

<sup>50</sup> *Êlên Îraqê*, beşa duwem, r. 79

derfetên çûnûhata çemê di tejneya (hewzeyaya) Dicle û Firatî de lêkolîn dike, di vê gera xwe de serî li Kerkûkê jî dide. Encamên ger û lêkolîna xwe di cildê çar ê weşana beşa Qafqas ya Teşkilata Cografî ya Qiralîya Îris de, ku di sala 1897an de diweşîne. Di wê pirtûkê de dinirxîne ku jimara niştecihên Kerkûkê di wê demê de 12-15 hezar kes bûne. Ji çil malbatên ermenî pê ve, niştecihên mayî kurd bûne. Dîyar e ku leşkerên Osmanî yên li Kerkûkê ji rûniştvanan nehatine hesibandin."<sup>51</sup>

Her wekî ku gerîdeyê tirk ê bi nav û deng Şemseddîn Samî dema ser daye Kerkûkê, rave kiriye ku ji çaran sisêyê rûniştvanên bajêr kurd in, ên mayî tirk û ereb in.<sup>52</sup>

Mêjûzan Mihemed Emîn Zekî Beg dema ku wezîrê ragihandinê bû di serdema serweriya Qiraliyeta Îraqê de, ji Qiral Feyselê Yekem re du danezan-an dişîne, di her duyan de zilm û tadayên li kurdan dibin tîne ber çavan, soz û peymanên ku Hukûmeta Îraqê û Hukûmeta Brîtanî dane desteya netewan ji bo kurdan, di bîra wî tîne, van peymanan dabûn ku Kurdistana Başûr bi ser Îraqa nû ve bibe.

Ev her du danezan paşê hatin çap- kirin wek pirtûkek, bi navê *Du Teqelayên Bêşûd* (Du Hewldanên Bêfayde). Di pirtûkê de ev hebû: Di sala 1930an de rêjeya kurdan di parêzgeha Kerkûkê de %51, tirkman %21,5, ereb %20, keldan, aşûr, suryanî, cihû, ermen û yên mayî %7,5.

<sup>51</sup> Dr. Cebâr Qadîr, *Kerkûk sedsal û nîv ji tirkîkirin û erebkirinê*, Yekîtî, jimar: 10, in 3.3.2000, sal heştan.

<sup>52</sup> Şemseddîn Samî, çavkaniya borî.

Ji vê pêşkêşkirina bi lez û kurt, em dibînin ku kurd her dem pîrrianiya rûniştvanan pêk anîne, paşê emê bibînin ku jimara kurdan kêmtir dibe. Sedem siyaseta erebkirinê ya ku pêşî tê serê kurdan û pişt re serê tirkmanan, û ereb zêde dibin ji niştecihên Kerkûkê çî kurd û çî tirkman.

Hikûmetên Îraqî yên dawîn ji hukûmeta qiraliyetîya Îraqê û vir ve, têgihîştin ku bê lêdana li xelesa zexmtirîn ji niştecihên bajêr, ku ew jî kurd in, dê nikaribin bi derametan (qezenc) bilîzin, ango dê nikaribin awayê heskirina xwe û bo xwe hilberî- nê nefta Kerkûkê bikar bînin. Bo vî yekê em dibînin ku di destpêka siyaseta erebkirinê de koçberkirin û kavi- kirin li ser kurdan hatiye meşandin. Piştî ku vê siyaseta cîyê xwe girt, vî bajarê Kurdistanê veguheztin erebî, berê dîreksîyona erebkirinê dane tirk- manan jî. Bi xuyakirina nefta Kerkûkê re, dest bi erebkirina Kerkûkê ya bilfîl bû, ji hêla nijadperestên ereb û bi alîki- rina îngilîzan û hevalbendiya siyaseta tirk a ku kurdan diwartirîn neyarên xwe dibîne û hêmana bibandor a herî xeter bo ewlekariya netewî.

Wek me li jor got, erebkirina bi temamî ji bo bajarê Kerkûkê, bi xuyaki- rina nefta wê re dest pê dibe. Bêguman şîrketa nefta Îraqê nexwest karkerên kurd bixebitîne, rêjeyek pîrr hindik li gor jimara wan ne tê de. Belkî zû kir ji nava Îraq û başûrê wê hemwelatîyên ereb anî ji bo kar, her wisa aşûr, tirk- man û cihûyan terxan kir, heta karên ne hewce yê şarezayî bûn, kurdên niştecihên Kerkûkê, jê hatin mehrûmkirin. Yek ji armanca vê siyaseta ev bû ku niştecihên resen ên kurd di Kerkûkê de paş de bimînin, di

aborî û hêza xomali de pêş nekevin, ji bo hin hîsaben paşerojê, fêkîyên wê jî paşê çinîn. Çawa ku bi hêsayî kurdan ji hîmê wan ên mêjûyî rakirin, bêyî ku bandorê bike li ser xebat û geşîya kar û hilberînên sazîyên heyatî li Kerkûkê tev û şîrketa nefta Îraqê.

Di sala 1927an de gava ku şîrketê dest bi kolana bîra yekem kir di naverasta Babagurgura neftî de, bîrê bi şid havêt; bû sedemê mirina endazyarekî îngilîz û hin karkerên Îraqî bi gaza jehrî ku ji bîrê havêt. Tirsek mezin li ser niştecihên Kerkûkê çêbû, ji ber ku mimkun bû dê bayî wê gaza bijehr vegeranda nava bajêr. Bo vê yekê kirdariyên pêwîst pêk hatin bo astengiya vê metirisiyê. Bi lez û bez agahdarî dan hêlên taybet ku tevdiran bigrin, niştecihan bişînin hêla tersê bayî, zarok û jin û pîran bi gerîde û navgînên şîrketê veguhêzin ciyekî ewle bo ku ji vê karesatê dûr bikevin. Di wê demê de û li gor belgeyên peywendîdarên bûyerê -ew jî bi zarê îngilîzî ne- û jimara nifûsa Kerkûkê di wê salê de nîşan didin, ku niştecihên Kerkûkê wê gavê 35 hezar kes bûne (nava bajar bi tenê, ne parêzgeha Kerkûkê hemû). Sîh hezar ji wan kurd bûne, ên mayî ku pênc hezar in; tirkman û ereb û Mesîhî û Cihû bûne.<sup>53</sup>

Di nav salên sihî yê sedsala bîstan de wezareta Yasîn el-Hasîmî dest pê kir êla Ûbeydiyan ji Diyala anî li deşta Huweyce (nevçeyeke Kerkûkê ye) wan bicî kir, bi hinceta ku di nav wan û êla el-Cubur ya koçer anî axê li wan belav kir, piştî avakirina bernamêya avdana Huweyce. Pîsporên cotyar tayîn û terxan kir bo ku wan hîne karê kîştûkalê (çandinîyê) bikin. Armanç ew bû ku

wan bigerînin niştecihên wê herêmê, da ku hêmanên erebî di parêzgeha Kerkûkê de pîrr bibin. Bêguman vê sîyasetê, piştî çend salan ber û berhemê xwe da.

Gava em dinîhêrin li ser jimara sala 1957an, em dibînin ku unsurê erebî pêşber unsurê kurdî zêde bûne. Li gor serjimare kurd %48, bi kêmbûna %3 li gor sala nivîsîna her du danezanên Mihemmed Emîn Zekî Beg ên ku me li jor behsa wan kiriye, û zêdebûna ereb heta %27,5, rêjeya tirkmanan %21 bû lê dîsa kurd pîrrtir bûn li parêzgeha Kerkûkê. Ji serjimartinan tê zanîn ku armanca sîyaseta erebkirinê, pêşiyê kurd bûne.

Li gor serjimara sala 1965an nufûsa parêzgeha Kerkûkê digihîje 473626 merivî; kurd 170905, ereb 184595, tirkman 86959 (5471 kes bi tirkî diaxi-fin), keldanî û suryanî 1995 kes, ermenî 1403, asûrî 7278 kes.

Li vir jî em zêdebûna ereban di ser kurdan de dibînin rûberê serjimara sala 1957an. Ew jî bi qenciya siyaseta erebkirinê ya ku hatibû pîlankirin piştî şoreşa Reşemîya sala 1963an. Siyaseta erebkirina Kerkûkê ya pîlankirî di serdema rejîma serok Evdîlkerîm Qasim de em nabînin.

Gehînek û qonaxa duwemîn a erebkirina Kerkûkê, dema ku Baasî rejîmê bi dest dixin piştî şoreşa Reşemî ya 1963an dest pê dike wek ku me behs kir. Lê sîyaseta erebkirina vê carê xetertir bû ji pêşîn. Niştecihên gundên kurdan ên hawîrdora bajêr dane barkirin û koçberkirin. Li dora 33 hezarî gundên kurdan kavi kirine û dane barkirin.<sup>54</sup> Ji aliyek din ve axa

<sup>53</sup> Huseyn Xulam, ji axaftina endazyer di şîrketa nefta Îraqê ya Kerkûkê de, wergera me, *çend rûpel ji mêjûya* erebkirinê li Kerkûkê, çavkaniya borî.

<sup>54</sup> Dr. Nûrî Talebanî, çavkaniya borî.

wan ji êlên ereban re parve kirine û dane wan, wan bi sîlehkirine li ser ciyên bilind ên nêzê wê herêmê nixteyên leşkerî ava kirine bo parastina wan.

Lê sîyaseta erebkirina parêzgeha Kerkûkê bi şêwazeke gelek bi qirêj û kirêt bû, piştî Şoreşa 17ê Tîrmeha sala 1969an gava desthilatîyê dest bi guhartina rastiya bajêr kir ji gelek hêlan ve û qonax bi qonax li gor projeya ku lêkolîn kiribûn û birin serî bi rengê serkeftî.

Şoreşgerên nû dest bi tetbîqkirina siyaseta xwe ya programkirî bo erebkirina Kerkûkê kirin. A ku herêmê mînak wê li dirêjiya dîrokê nedîtibû. "Berê her tiştî dest bi vehugeztina peywirdarên bajarî kirin û hinên din anîn. Hin rêwerz û talîmatên dîyar dane wan, derbarê lîstina bi sicîl û peyirkên (kutuk) nufusê û çêkirina sexte û teqlîdên wan."<sup>55</sup> Navê taxan û herêman ên dîrokî guhartin ser Erebi, her wisa navên tirkmanî jî. Niştecihên kurd ji nava bajêr dane barkirin, welatîyên ereb ji naverast û başûrê Îraqê anîn û li taxên wan bicî kirin. Navçeyên ku pirranî kurd bûn ji parêzgehê veqetandin, bi ser parêzgehên dûr ve kirin. Bi hinceta vekirina kolanên nû, taxên kurdan xirab kirin. Ji nû ve bo yê nû dianîn taxan ava kirin di nava dilê taxên kurdan de. Mînak: wek 2000 malên kurdan li taxa Sûrceta Kurdî ya xwerû wêran kirin (bi dehan xizmên min di nava wan de bûn). Tîştêk pirr hindik pere dan wan ku bi



*Dîmenek ji kurdên aware yê Kerkûkê*

têrî stendina arasaya xaniyên wan jî nedikir. Eger yekî ji wan karibûya arasayek bikirîya jî, fermanên ku ji desthilatdarên bilind dihatin, nedihiştin tapû bikin û nedikarî destûr û ruhsatê ji şaredariya bilind bigirtana. Rûber viya jî deh hezar Dînarê Îraqê dihat dayin bo avahiyê, ji bo erebê ku sicîl û peyirka gelheya xwe veguhêze Kerkûkê, digel arasayek bicîbûnê, heman demê wî di fermangeheke dewletê de peywirdar dikirin. Pirrê wan jî, ji polîs û salixgerîyê bûn. Hemû jî ji partiya desthilatdar bûn û her wiha bi rengêkî rûtînî bi qirêdiyê arasayên bi sûdê pirr hindik çêdibûn, bo avahî û bicîbûna li Kerkûkê û digel ku gelek cihêgirtin û îmtiyazatên ku çêdibûn ji ber ku hemwelatîyên pileya yekem bûn.

Vana ji hêla rûniştvanên Kerkûkê ve bi "Koma deh hezar"<sup>56</sup> hatibûn navkirin. Gelek xanî û taxên nû di dilê taxên kurdan de hatin avakirin û tîkuzkirin. Wek: Rehîmawa, ku navê wê kirin taxa "el-Ehdulus", Îskan bû taxa "Heyelmusen-na", Sûrçe bû taxa "Quteybe".

<sup>56</sup> Dema ku Dînarê Îraqî yeksanê 3,3 Dolarê Amerîkî bû.

<sup>55</sup> Parêzer Cercîs Fehullah, *Serdana Rabirdûyê Nêz*.

Di taxên kurdî yên din de wek Îmam Qasim, Saheduteyran, Erefe, Serkarêz û gelekên din guhartin û dan ên nûhatî.

Xaniyên ku ji wan re çêkirin gihişt 51.000 xanî û perçe arasayên bicîbûnê heta destpêka salên heştêyî li herêmên kurdan hatin parvekirin û bi navên erebî wek: Taxa el-Musenna, el-Baas, el-Wasitî, el-Îstirakîyye, Xernutet, el-Huccac, el-Hurriyeh, el-Erûbeh, Dûrulemnî, taxa Quteybe, taxa Şurtet, Dûrul Emlî el-Şebî û gelekên din hatin guhartin. Vana jî ji bilî avayiyên efser û serbazan ên ku bi pirranî didan leşkerên ereb.

Di nav bîst salî de bi tenê ji serjimara 1957an û serjimara 1977an de guhartinek mezin li rastiya niştecihan çêbû. Bi serjimara sala 1977an guhartina ku çêbûye tê ber çavan. Lewre jimara ereban ji %28,5 bilind dibe %44,4, jimara kurdan jî daketibû %37,33. Cara pêşîn e di mêtûya Kerkûkê de ev guhartin çêdibe û ereb di bajêr de dibin pirranî û bo ku kurd li pey wan werin. Her wisa tirkman jî hejmara wan daketibû %16,31. Lê digel vî jî reng û dirûv û hêmayên bajêr her kurdî bûn.

Viya hemû bi barkirin û koçberkiri-na niştecihên gundên dora bajêr re pêk dihatin, bi hinceta şerê bi serhildêrê pêşmergeyan re. Lê pêngava herî kirêt ew bû ku navçeyên kurdî yên di hemû dîrokê de girêdayî bi Kerkûkê ve jê veqetandin, hinek bi parêzgehên dûr ve girêdan. Wek ku navçeya Dûzxurmatû ku ji Kerkûkê 70 kîlometre dûr bû, dan ser parêzgeha Tikritê ya ku 130 kîlometreyan jê dûr bû. Her wekî ku navçeya Çemçemal a kurdî ya xwerû ji laşê parêzgeha Kerkûkê veqetandin, dan ser parêzgeha Silêmaniyê. Û navçeya Kifrî jî dane ser wir. Navçeya Kilar dane ser



*Dîmenek ji kurdên aware yên Kerkûkê*

parêzgeha Diyala. Vana hemû bo ku rêjeya kurdan li Kerkûkê kêmkirî bibe kirin. Her sê navçeyên mayî: Navçeya Huweyce, Altunkoprî (kurd ji vê navçeyê re dibêjin Pirdê) û navenda navçeya Kerkûkê jî demek dûr ve kiribûn ereb.

Di encama vê siyaseta şovenî de "37726 malbatên kurd hatin barkirin û koçberkirin. Pirrê wan jî bûn gorîyên kiryarên enfal ên kirêt. Akama wêrankirina gundên kurdan di nav tixûbên parêzgeha Kerkûkê bi tenê de gihişt 770 gundî, 439 xwendegah, 598 mizgeft, 40 nexweşxaneyên taybet."<sup>57</sup>

Erebkirinê piştî şerê Kendavê yê duyem jî bi rengekî herî şovenî domand. Di navbera salên 1991-2000an de, jimara malbatên kurdên koçber ên herêmên di bin desthilatiya kurdan de gihişt 15.735 malbat, jimara mirovan gihiştibû 93.419 mirovî.<sup>58</sup>

Di axaftina birêz Lord Avebuy endamê parlamana Brîtanî ku bi televîzyona kurdî ya Medyayê re kiribû ev hebû: "Em dizanin ku kêşeya kurd bi şêwazek mezin fireh bû, qonaxên erebkirinê jî dest pê kirine, pêngavên fireh û gelek bilez davêjin." Sala 1999 birêz Maks Fam Dîstrwîl raportorê bêjerê tay-

<sup>57</sup> Dr. Nûrî Talebanî, çavkaniya borî.

<sup>58</sup> Rojnameya *Rojhelata Navîn*, hejmar 7745, îne 11.2. 2000

bet bo Neteweyên Yekbûyî, rapora xwe pêşkêşî lijneya mafên mirovan ya Ewropayê kir, projeya erebkirinê bi rengê ronî eşkere kir. Ew jî "Bicîkirina 300 hezar mirovên ereb ne li nava Kerkûkê bi tenê, belkî li dora bajêr bi xwe jî."<sup>59</sup> Her wisa di rapora raportorê taybet rêzdar Endrys Maformatîs derbarê mafên mirovan li Îraqê û ji rejîma Îraqê pirs kiribû da ku bersîv bidin, ev dihat: "Etiyet Şendax berpîrsê şaxa Partiya Baasê ya Kerkûkê di sisêyê Gulana 2000an de fermanek derdixê ji merivên Partiyê re dişîne ku alîkariya merivên ewlehiyê û polîsan bikin da ku perîşt û teftîşek fireh bikin û lîsteyek navê malbatên kurd û tirkmanên li herêmê dijîn amade bikin. Ji wan xwestibûn ku binyata xwe ya resen biguhêrên erebî, bi rakirinê gef li wan xwaribûn gava hawê wan nekin. Wek ku cîgirê Qonseya Serokatîya Şoreşa Îraqî, cîgirê fermandarê giştî yê hêzên çekdar Îzzet el-Dûrî di 10.9. 2000an de serî li Kerkûkê daye, paqijkirina parêzgeha Kerkûkê ji niştevanên ne ereb dupat kiriye, dema bi waliyê Kerkûkê general Sebah Nûrî Ulwan re dîtî û axaftin kiriye. Hindek kurdên mayî jî wan serbest kiriye, "We divê ku neteweya xwe bikin ereb û divê ji Kerkûkê bar bikin, lewre pêş de lîsteyên sererasatkirina netewî li wan belav kiribûn."<sup>60</sup>

Erebkirina taxên Kerkûkê yên ji bilî rûniştvanên ereb ranewestiya, heta gorrê jî ji sîyaseta şovênî ya erebî nefilitîn. Ji nivê salên heştêyî carcaran tibabek ji gorran radikirin, da ku rêç û şopên kurdî li bajêr bi tevayî rabin û nemînin. Vana

<sup>59</sup> Wergera me, Çend rûpel ji dîroka erebkirinê li Kerkûkê, çavkaniya borî.

<sup>60</sup> Rojnameya *el-Hayat* ya Londonê, jimar 13.699, 13.9.2000.

hemû jî bo bidestxistina berhemên neftê û jê bêparkirina kurdan bû. Bêguman ev sîyaseta bi fermana desthilatdarîya herî bilind a Îraqê bû. Mînak: Qonseya Serokatîya Şoreşê (ew jî dezgeha zagondanîne ya herî bilind li Îraqê bû) biryarek daxuyand di mêjûya 28. 8. 1989an de bi reqema 529 di binî de şanenava serokkomarê Îraqê tê de dihat ku: "Îraqiyên bilî niştevanên parêzgehên otonomiyê, mafê wan e ku li herêmên otonomiyê bo niştecihbûnê pereyên axê bi dest bixin digel destxistiyên xwe yên li ciyê dayikbûnê, her Îraqî mafê wî yê ku bibe nişteciyê herêmên otonomiyê û dikare perçeyên axê bo niştecihîyê li parêzgehên Îraqê bidest bixe ji bilî parêzgehên "Neynawa, el-Temîm, Dîyala".

Ji nava vê biryarê armancên dijminîya bi gelê kurd re pirr xweş têne ber çavan û sîyaseta erebkirinê ne ji bo Kerkûkê bi tenê bûye, belkî gundên navçeyên bi Kerkûkê ve jî ketine berê. Ev sîyaseta jî bi tevayî çû serî. Ji hêla navenda bajarê Kerkûkê ve rejîmê gelek hewl da û di vî warê de jî gelek pêş ket. Ji hêla hawîrdor ve xwest du kemberên ewlekariyê biafirîne: Ya pêşîn, kembera erebî bû ango êlên erebên dîlxwaz ên ku xwe li hawîrdora bajar bicî kirin. Kembera duwem, ev bû ku herêmên fireh ji niştecihan vala kir û veğerand bi ser herêmên leşkerî yên qedexê ve. Gava meriv li sîyaseta erebkirinê binihêre dikare bibêje, "Bo ku bigihîjin armancên xwe, sîstemê hawayên emperyalîzm û mêtîngehkarîyên yasayî û teqlîdî pêk anîye. Bi bajar û rûniştvanan re wek mêtinkarî û dagîrkerî tevgeriyaye. Gelek ronî û xuyaye van tiştên hatine serê kurdan û raki-rana wan a ji hîmên wan ên dîrokî, di

